# banga heq ji kelhaamed

Kovara Îslamî, Çandî û Hunerî

Sal: 3 • Jimar: 12 • Bihar / 2012 • Biha: 5 TL









Tew Dinyayê

Dewra Şêx Ubeydullahê Nehrî

Milliyeta Musbet û Ya Menfî

banga heq DERIYÊ WEŞANA KURDÎ VEDIKE
BANGA WE LI GER Û GEŞTA DEM Û DEWRANÊN ZÊRÎN DIKE
AWAZÊN DIL ZÎZ DIKIRIN
NIHA DI PELAN DE TÊN NEQIŞANDIN
PEL BI ZIMANÊ KURDÎ TÊN XEMILANDIN
KUL Û KESER Û HÊVIYÊN JI DIL HERIKÎNA ZIMAN
AXÎN Û NALÎN Û QÊRÎNÊN GIRAN
JI DENGÊ UMMETA ÎSLAM




DÎWANA MIZGÎN ÊDÎ DI DESTAN DE YE
DÎWANA MIZGÎN ÊDÎ DI REFAN DE YE

banga heq

Büyükreşit Paşa Cad. Yumni İş Mrkz. No: 22/40
Vezneciler / Fatih / İSTANBUL
Tel: +90212 526 60 68 Fax: +90212 526 67 84

بسم الله الرحمن الرحيم

## Ji Weşankar

**Bi navê Xwedayê Rehman û Rehîm…**

**Xwendevanên Hêja,**

Rebbê me yê Kerîm nesîb kir, em bi hev re gihane bihareke nû.

Jimareke nû…

Adareke nû…

Hewldaneke nû…

Her roja nû, wextê nû, sal û demsala nû bona me firset û pelekî nû ye. Em hêvîdarin ku bi vê bîr û baweriyê emê para xwe ji vê jimarê jî bistînin.

Ji bona zêde li ser xwendevanên me yên hêja giran nebe, em kovarê bes nakine kovareke 'ilmî Her wek tê zanîn di jimara borî de nivîs û lêkolînên 'ilmî pir bûn. Me ji bona Kurdên Sûriyê û Kurdistana Suriyê dosyayeke taybet vekiribû.

Lê vê jimarê me xwest em kovarê hinekî sivik bigrin. Da ku xwendevanên me 'aciz nebin. Bi vê bîr û baweriyê me cîh da pir helbest û nivîsên kin.

Sebebek ji zêde cîhdayîna helbestan jî ev e ku; **em dixwazin bi vê wesîleyê “xwendina bi Kurdî” bi pêşkeve. Lewra helbest rihettir têne xwendin û ji nesran balkêştir in.**

Di vê jimarê de me giraniya xwe da ser **biharê** û **wîladeta Resulê Ekrem**. Lewra li welatê me meha **Nîsan**ê wek **meha pîrozbahiyên wîladeta pêxember** tê lidarxistin. Bi rastî ev kêfxweşî û pîrozbahî balkêş in; lewra berya niha bi çend sed salan pîrozbahiyên mewlûdê li Hewlêr dest pê kiribûn. Milletê Kurd ev pîrozbahî û xêrhatin ji xwe re kiribûne ‘adet. Ev çend sal e ku ev ‘adet careke din geş bû, û seranser li Kurdistanê belav bû. Heta giha başûrê Kurdistanê… Îsal li Zaxo, Duhok û Hewlêr jî pîrozbahiyên mewlûdê bi coş hatin lidarxistin.

Em hêvîdarin ku ewê milletê meyî jar û bindest careke din, xwe bi **werîsê Xweda** û **şopa Resulullah** bigre û bilindî asîmanê serfiraziyê bibe.

Li aliyê din, di kovara me de mijarên balkêş hene. Her wek jinên Kurd yên meşhûr, jiyana kesayetên Kurd yên meşhûr, kevneşopiyên Kurdan, wergerên Rîsaleyên Nûr, çand û edebiyat…

Digel hemî kêmasiyan em hêvîdar in ku Kelhaamed kovareke balkêş û bi fêde ye… Xwendevanên me dikarin **nêrîn** û **helwest**a Kelhaamed ji malpera www.bangaheq.net jî bişopînin. Hûnê bibînin ku Kelhaamed **xeteke serbixwe daniye** û digel razîbûna Xwedê berjewendî, biratî û pêşveçûna gelê xwe ji xwe re kiriye ğaye.


Bi rastî hewceyiya gelê me pir pir bi vê heye ku; sînorên navbera xwe rakin, xwe ji qeyd û bendên paytextan xelas kin, hev binasin, bibine bira, dest bidin dest, da ala azadiyê bi ser xin. Yan na heger em ji dîroka xweyî hezar salî dûr bikevin, bidine pey Ewrupa, bi çavê menfe’etên şexsî û îdeolojîk li hev meyzênin, hev îttîham bikin, ji bîr bikin ku riya serbilindiyê xwe girtina bi Quranê û exlaqê pêxember e; emê her û her, bindest û mezlûm bimînin…

Bi hêviya hişyariyeke rast û dirûst; û bi hêviya azadiyê bimînin di xêr û xweşiyê de…

# naverok


Kurdno! Dest Bidin Hev! Hewl Bidin....Zînnûr Zivingî......3
Ji Rêberan.......................................................4
Mewlûda Siyer............M. Ebdurrehman Xerxûrî......6
Mehbûbê Me.................Ahmed Muhammedzade.....8
Bîstê Nîsanê.................. Mela Salih Misqenterî......11
Ez Aşiqê Demsala Buharê Me..M. Salih Misqenterî......14
Nûra Dilan............................'Emerê Wezrînî.....15
Rîsaleyên Nûr..........Bedîuzzeman Seîdê Kurdî.....16
Muhammed (S.x.l) .....................Mela Mizgîn.....17
Peyvek Li Asîman .................Fedlullah Polan......18
Libergerîn ..........................Selamiyê Bilêderî......20
Kul û Derd..........................................Hêvîdar......21
Guhertin...............................'Emerê Wezrînî......22
Şahê Qesrê...............................Navşêr Xalidî......23
Li Ser Wêjeya Gelêrî.................Tahir Başaran .....24
Çiya Anî .....................................Feqiyê Teyran......25
Xwendin ....................................Seîd Hêvîdar......26
Va Hat Buhar e........................................Heval.....27
Dema Guh Ronî Bibe..........................................29
Zilm û Zordarî...........................M. Heciezem.....30
Şêx Ubeydullahê Nehrî...............Faysal Yaman.....32
Kurdên Serbilind.......M. Ebdulletîf Neqşioğlu......35
Îbnî Teymiyye El Herranî...Muhammed Sebatî.....38
Mizgînî.................................M. Tahir Soranî.....40
Xalê Rûstem...........................Mîrzadê Zozanî.....41
Tew Dinyayê............................Cevdet Karaman......42
Cotkarî...........................................Dilevîn Botî......46
Dadê Rana...............................Selamiyê Bilêderî......47
Sor û Zer.................................Mamoste Çiyayî......50
Birrê..........................................Îbrahîmê Êlihî......52
Evîndarên Pêxember..................Musab Nisêbînî......53
Şêr û Piling.........................Mela Sadullahê Fetlê......54
Milliyeta Musbet......................................................55
Exlaq.................................Mela Faruqê Dimilî......58
Dersa Quranê......................Îbrahîmê Çebakçûrî......59
Pîr û Hem Hemoleko Boşqolek.........Yinis Pîronî......60
Daray Bambuy.........................Ye'qûb Me'denij......60
Qelbê Me...............................................................61
Bexçê Zaroka.........................................................62
Rêziman / Gramer.......................Zînnûr Zivingî......64


✍ Fexreddîn Şemrexî




12

## Bihara Muhammedî

*"Karê Xweda qedandin e" dibêjin pêşî. Ji xwe çerxa gerdûnê, dewra jiyan û hebûnê, bi fermana Xweda bi bal çêbûnê, digerin mîna teşî. Sar û seqem vemirî, sibatoka dînik û gîskok buhirî.*

✍ Melayê Cizîrî




19

## Dil Ji Min Bir

*Şox û şengê zuhre rengê*
*Dil ji min bir dil ji min*
*Awirên heybet pilingê*
*Dil ji min bir dil ji min*

✍ Muhammed Sebatî




36

## Jinên Kurdistan Yên Meşhûr II

*Xwişka tabi'iyyê mezin Muhammedê kurê Sîrîn e. Tabi'iyyeke huccet bû. Di malbateke xwedî were'(xwe parastina ji tiştê bi şubhe) û zuhd de jiyaye.*

✍ Ferhad Bagasî




48

## "Tirb" û "Qubên" Me Yên Meşhûr

*Weke ku ji sernivîsa me jî tê fêmkirin emê di vê mijarê de behsa hinek tirb (mezel), qub û ziyaretên meşhûr bikin. Bi rastî em bi temamî xwe naxine nava mijarê.*


kelhaamed banga heq ji
Kovara İslamî Çandî û Hunerî

Sal (Yıl) : 3 ❖ Jimar (Sayı) : 12 ❖ Biha (Fiyat) : 5 TL
Bihar (Adar, Nîsan, Gulan) 2012
❖
Xwedî û Berpirsîyarê Nivîsaran
(Sahibi ve Yazı işleri Müdürü): Abdulkudus YALÇIN
❖
Ciyê Îdarê (İdare Yeri) : Yavuz Selim Mah. Mehmetçik Sk. No:71 K: 3/E Esenler/İSTANBUL
❖
Têkilî (İletişim - Sipariş):
Tel : 0212 646 21 72
Gsm: 0533 300 95 45

Web: www.kelhaamed.com
Mail: kelhaamed@kelhaamed.com
❖
PTT Hesap No: Abdulhalim TÜRE - 591 87 91
❖
Yaygın Süreli
❖
Çapxane (Matbaa):
DERGAH OFSET : 0212 489 33 33
❖
Nîşe (Not): Mesulîyeta Ramanên Nivîsaran aîdê Nivîskaran e. Berhemên têne şandin nayên vegerandin.

زینئور زڤنگي

# کوردنوٚ! دەست بدن هەڤ! هەول بدن

مللەتێ کورد ب سەدان سالا یە کو ژار و پەریشان و بندەست ئە. سەدەمێ ڤێ رەوشێ ژی ئیختیلاف, دژمنانتی و بێتفاقی یە. دژمنێن هار ژی دخوازن هەر و هەر ئەڤ رەوش بدوٚمە و ئەو ژی ژ ڤێ رەوشێ ئیستیفادە بکن

لێ بەلێ ئێدی دونیا نە دونیا بەرێ یە. جیهان بوویە وەکە گوندەکی گلوٚبال و هەر تشت ب ئاوایەکی ل بەر چاڤا یە. پێچیێن دوژمنان و خێرخوازێن مللەت ژهەڤ تێن ڤەقەتاندن. مللەت ژ بوٚنا سەردەستی و سەرکەفتنێ هەول ددە. ژ بوٚنا تفاق و براتیێ هەول ددە. د دەمەکە وسا دە یێن بەرژەوەندیێن گەلێ کورد نەپارێزن, ژ بوٚنا بەرژەوەندی و مەنفەەتا هنەك شەخس و پارتیان کار بکن و خوە بێخنە جیێ مللەت, وێ ئەشکەرە بن و مللەت ئێدی وان قەبوول ناکە. دڤێ مللەت هشیار بە و دڤێ ئالی و پارتیێن ژ ناڤ کوردان ژی دەرکەتنە, ڤێ هشیاریێ بزانبن

ناخوە ئەم گوھ بدنە مەزینێن خوە

ب فکرا ملليیەتێ, د هوندرێ مللەت دە هەودەکی زانین و هەزکرنێ چێکن کو مینا هەودێ کەوسەرێ بە. وان قولکێن د بن دە کو ئاڤێ دکشینن ب زانینێ ئاسێکن. وان مەجرایێن کو ژ ژوٚر ڤە ئاڤێ دهەرکیننە هوندر ب فەزیلەتا ئیسلامی ڤەکن

گەلی کوردان

هەول بدن, بشوخلن ژ بوٚنا تەقویەکرنا ئازادیان کو سەبەبێ سەادەتا مە یە, فکرا مللیيەتێ بکنە وەك کوٚلانەکی و زانین و فەزیلەتێ بدنە دەست

ل ڤان دەران ژی بوٚرییەکە ئاڤێ بهەرکینە باڤێژن, تا کو کانیا کەمالاتان ژ مە ژی دەرکەڤە. ئان نا هوونێ دایما ببنە پارسەك, ئان ژ تێنبوونێ بمرن! هەم ژی پارسەکی پەرا ناکە

هەگەر هوون ببنە ئینسان, هکومەت و ستەنبوٚل و ترك چاوا بن بلا بن, زرارا وان ناگهێژە وە

بەدیوززەمان, مونازارات

Zînnûr Zivingî

# Kurdno! Dest Bidin Hev! Hewl Bidin…

Milletê Kurd bi sedan sala ye ku jar û perîşan û bindest e. Sedemê vê rewşê jî îxtîlaf, dijminantî û bêtifaqî ye. Dijminên har jî dixwazin her û her ev rewş bidome û ew jî ji vê rewşê îstîfade bikin.

Lê belê êdî dunya ne dunya berê ye. Cîhan bûye weke gundekî global û her tişt bi awayekî li ber çava ye. Pêçiyên dujminan û xêrxwazên millet jihev tên veqetandin. Millet ji bona serdestî û serkeftinê hewl dide. Ji bona tifaq û biratiyê hewl dide. Di demeke wisa de yên berjewendiyên gelê Kurd neparêzin, ji bona berjewendî û menfe'eta hinek şexs û partiyan kar bikin û xwe bêxine ciyê millet, wê eşkere bibin û millet êdî wan qebûl nake. Divê millet hişyar be û divê alî û partiyên ji nav Kurdan jî derketine, vê hişyariyê bizanbin.


Naxwe em guh bidine mezînên xwe:

*"Bi fikra millîyetê, di hundirê millet de hewdekî zanîn û hezkirinê çêkin ku mîna hewdê Kewserê be. Wan qulikên di bin de ku avê dikişînin bi zanînê asêkin. Wan mecrayên ku ji jor ve avê diherikînine hundir bi fezîleta Îslamî vekin."*

*"Gelî Kurdan!... Hewl bidin, bişuğulin ji bona teqwiyekirina azadiyan ku sebebê se'adeta me ye, fikra millîyetê bikne wek kolanekî û zanîn û fezîletê bidine dest. Li van deran jî borîyeke avê biherikîne bavêjin, ta ku kaniya kemalatan ji me jî derkeve. An na hûnê daîma bibine parsek, an ji tênbûnê bimirin! Hem jî parsekî pera nake… Heger hûn bibine însan, hikumet û Stenbol û Tirk çawa bin bila bin, zirara wan nagihîje we… "* (Munazarat)

## Ji Hesen el-Benna

*Serek, kevirekî binyata (temel) de'wê ye. Doza bê serek nîne. Gorî de'wa Îslamê, rêberên me ji aliyê dilsoziyê (wefa) ve, mezin û pêşkêşên me ne. Û ji siyaneta de'wê ya giştî ve ji aliyê mamostetî, mezintî û fermandarî ve, li ser me, xwedî heqq in. Ji aliyê hezkirinê ve, wekî bavekî, xwedî heqq in. Lewra ji bo me zehmetiyan dikşînin û li ser me bi rehm in. Heqê wan yê mamostetiyê li ser me heye. Lewra ew, me terbiye û îdare dikin.*



## Ji Mewlana Şêx Xalid

*Ez tewsiya we bi van tiştan dikim: Ji bo xwe riya xilasiyê dewamî di rastiyê de hêvî bikin. Gihîştina Allah Te'ala di îttîba'a serekê kaînatê serwerê me Hezretî Muhammed de bibînin, xwe ji tu kesî qenctir nebînin û hetta nefsa xwe dahî nebînin.*

## Ji Bedî'uzzeman

*Di demsala biharê de, di şêweyê huriyên cennetê tevî daran sundus-mîsal bi cil dike, bi kulîlk û fêkiyên cewher dixemilîne û dike xizmetkar û şaxên wanê wek destên letîf, texlît texlît, herî şîrîn, herî fêkiyê bi sen'et teqdimê me dike; hem bi destê mêşeke bi jehr hinguvê herî şîrîn û bi şîfa bi me dide xwarin; hem kincê herî xweşik û nerm bi destê kêzikeke bê dest li me dike; hem veşartina xezîneyên rehmetê di bizrekî biçûk de, çiqas keremek e cemîl e, çiqas eserê rehmeteke letîf e we eşkere bê fêmkirin.*



# Jî Rêberan...





## Ji Rêber

Ferdên ku ji bona cema'tebûnê hatine cem hev, divê pêşî bibine armanca xebatên rûxan-çêkirin û te'mîrê. Guhertin divê pêşî di wan de bê dest pê kirin. Bi vî awayî ferdên mewzûbehs, di nav teşkîlata cema'etekê de bi tevgerê, ji aliyekî ve xwe ava dikin, ji aliyekî din ve bi xwe re civaka cahilî jî terbiye dikin diguherînin. Û ev pêvajoya cema'etbûnê, divê digel avakirina xwe civakê jî biguherîne û bi bal hedef û armancên xwe ve bibe.

Cema'etbûyîn di heman demê de pêvajoyeke şoreşê ye. Di karekî de bi hev re ji yekî zêdetir armanc pêk tên.

Di pêvajoya guhertinê de xebatkirin, ji aliyê holî ve divê hemî tebeqeyên gel dorpêç bike. Xebatên ku li qalibên teng têne teksîfkirin, ji ber ku çerxên qisir in divê bên şikestin. Divê bê zanîn ku wek hemî îmkanên dozê, kadroyên dozê jî di nav gel de veşartî ne. Lewra Allah celle celalûhû, ji neslan qabîliyeta nabire. Ev jî, ne bi statuya civakî ve, bi piranî bi fitret ve 'eleqedar e. Xebata cema'etê ku berê xwe daye hemî civakê, wê van qabîliyetan jî bikşîne derxe sehneya têkoşînê. Ji ber vê yekê, di demên wisa de li her cî ji tebeqeya elît bêtir, berê xwe dana yên bê nav bi sihhettir e. Bi vî awayî cema'etbûyîn, dîtin û derxistina kadroyên dozê, paldana cema'etbûnê bi tecrubeya herî rast, polîtîzekirina civakê di lehê Îslamê de, bi vî awayî jî bi xwe re wezîfeya guhertin û veguherîna ku li însan hatiye tewdî kirin… pêk tîne.

…

Guhertineke bi bingeh, riya şoreşê jî vedike. Heger tevger bigihîje hêzeke ku bibe alternatîfê sîstemê û hêviya gel ji sîstema mewcûd bi dawî bibe, an jî sîstem di nav tevlîheviyekê de be, riya şoreşê vedibe. Lê belê helbet şoreşeke wisa ne ji bûyerên hêsan e…

Rûxan: Yıkım
Pêvajo: Süreç

Mewzûbehs: Sözkonusu
Tevger: Hareket

Teksîf: Yoğunlaştırma




# Mewlûda Siyer

✍ **Mela 'Ebdurrehmanê Xerxûrî**

*Pûr di Încîlê da navê 'Ahmeda*
*Hatibû Încîla heq mizgîn dida*

*Kahin û ruhban û ehbarê Yehûd*
*Tev digotin nêze ew bête wicûd*

*Qisseta Selmanê Faris xweş dida*
*Şahî û mizgîna mehbûbê Xweda*

*Jê re gotin rahiba Pûr eşkere*
*Şû'leya-stêra Muhammed da dere*

*Zû here cî û mekanê hîcretê*
*Pûr selama lêke nebyê Rehmetê*

*Pûr 'elamet û nîşanê wî hene*
*Sê 'elamet em bibêjin-j bo tene*

*Tiştê hedye jê dixwut ê sedeqe*
*Naxwo qet jê ew li ser rêça heqqe*

*Xatema nûbwet heye nava mila*
*Rehberê însan e me'şûqê dila*

*Îbnî Heyban qisseta wî pûr 'ecêb*
*Pûr dikin behsa wî tarîxê kitêb*

*Ew ji erda Şamê berya hîcretê*
*Çû Medînê pûr diye wî ezyetê*

*Pûr gelek ma hêvya fexrê kaînat*
*Hêj nehatî rojekî ket ber wefat*

*Sê qebîle ji Yehûdan lê civîn*
*Gotî wana ez ji bo we pûr evîn*

*Ha were pêxemberê axir zeman*
*Sed emanet hûn bibin tev musluman*

*Van Yehûdin Yesribê de ku diman*
*J-pûtperesta re digotin pir deman*

*Nêz e ku bê xatemê Pêxemberan*
*Tabi'ê wî bin emê pîr û ciwan*

*Pûtperesta re bikin dê herbê em*
*Wan qetilkin her wekî 'Ad û Îrem*

*Piştî nûra pêxember kirbû zihûr*
*Pir bi wan re çêbibû kibr û ğirûr*

*Pûtperesta tev de piştê hîcretê*
*Bawerî anîn û çûne cennetê*

*Man li ser kufr û ‘înadê ev Yehûd*
*Qewmekî bê soz û ‘ehd û pir hesûd*

*Tev cehalet bo zemanê cahilî*
*Dewra Îslamê bi ‘ilmê xemmilî*

*‘Abidê pûta bûn pir ‘êlên ‘Ereb*
*Qet nema bû şefqet û rehm û edeb*

*Her qebîle w ‘êlekî pûtek heband*
*Secde birne wan serî jê re tewand*

*Hem ji pûta re gelek qûrban didan*
*Pê dixapandin gelê xwe pêşîvan*

*Sağ dixistin turbê qîzê xwe gelek*
*Zulma însan çûbû ber ‘erşê felek*

*Mislê wan bû halê eqwamê dinê*
*Rûm û Faris qed nebû heqqê jinê*

*Hind û Sasanî temam xelqê cîhan*
*Ber helakê ve diçûn her hîn û an*

*Dunya mabû bende însanek were*
*Wî ji bin vê zûlma ha derxê dere*

*Wî demê derket li ser rûyê zemîn*
*‘Ahmedê ku rehmeten lîl ‘alemîn*

*Nûra wî ronîkirî erda ‘Ereb*
*Şû’le dabû tev cîhanê şerq û ğerb*

*Hem li mezlûmê cîhan ronî kirî*
*Hêstirê çava ewî paqij kirî*

*Zulmeta kufrê belav kir nûra heq*
*Nû li ser însanê jar dabû şefeq*

*Wê dema bû nêzî çil ‘umrê Resûl*
*Jê re xweştir bû ciyê tenha û çûl*

*Pir ji bajêr derdiket çol û çiya*
*Her wekî ‘adat û rêza Enbiya*

*Wî çi xewna ku didît nîvê şebê*
*Derdiket rast her wekî fecra sibê*

*Ew diçû Şkefta Hira ê pûr dema*
*Heftiyek carna jê mehkî lê dima*

*Ew difikrî pir li ser jîn û heyat*
*Ka çi şeklî çêbiye ev kaînat*

*Wî ‘îbadet kir li ser Dînê Henîf*
*Hem diçû secdê ji bo Rebbê Letîf*

*Pûr selaman lê dikir bûn dar û ber*
*Sed selam ser te Eya Xeyr-ul Beşer*

*Hem ji ğeybê deng dihatê pûr gelek*
*Raserê xwe dîtibû şeklê melek*

*Hivdehê hîva Remezana şerîf*
*Hate Cebraîl ji ba Rebbê Letîf*

*Wî guvaştî pey de pey sê car Resûl*
*Ayeta “اِقْرَءْ بِاسْمِ” kir nizûl*

*Zû şikeftê derkete ew hate mal*
*Got Xedîce min binûxmîne delal*

*Ji Xedîce re temam qisset kirî*
*Yek bi yek wan tiştê ku hate serî*

*Gotî rabe em herin ba Wereqe*
*Xwendiye Tewrat û Încîla heq e*

*Wê dema sehkir bihîst û ev xeber*
*Ya Muhammed got nexwû derd û keder*

*Ê ku te dî ew Namûsa Ekber e*
*Şibhe nîne tê bibî Pêxember e*

*Ew Melek hatiye ba te ey Helîm*
*Ê çû ba ‘Îsa û Mûsa ê Kelîm*

*Ez xwezî bûbûma xortek pir ciwan*
*Pir bi quwwet bûma mislê pehlewan*

*Da ji bona te bibûma alîkar*
*Weqtê qewmê te hemî bibne neyar*

*Wê dema ku-j Mekkehê te bikne der*
*Min feda kirba ji bo te can û ser*

*Çi kesê berya te ev de’wa he kir*
*Milletê wî deryê herbê lê vekir*

*Fexrê ‘alem nedizanbû xwendinê*
*Lê belê wek wî nehatbûn ser dinê*

*Ummî bû ew sahibê pir mu’cîzat*
*Şer’a anî tev hemî jîn û heyat*

*Kî here pey wî digêje meqsedê*
*Lê heta mirnê ewê rê bernedê*

*Kî neçû bit pey riya wî her zeman*
*Herdû dunya ew dibit ehlê ziyan*

*Fetret-ul Wehyê dibêjin wan demê*
*Piştî qet’a wehyê roja dûşemê*

*Hin dibên çil roj e hin sê sal temam*
*Hat birîn wehya Xweda jê berdewam*

*Pir ji ber mehzûn bû taca Enbiya*
*Tê hebû xwe bavêje-j lat û çiya*

*Lê belê wexta diçû bû ser zinar*
*Dîtibû Cibrîl ji ‘esman tête xwar*

*Gotî jê re tu Resûlî vê bizan*
*Pûr selam ser te be ey fexra cîhan*

*Piştî sê sal dîsa Cibrîl hate xwar*
*Ya Muhammed got ji xew rabe şiyar*

*Ey kesê pêçayî xwe-l nava cila*
*Rabe ser xwe tu bitirsîne dila*

*“قُمْ فَاَنْذِرْ” rebbê ‘alî kir emir*
*De’wa Îslama heq dest pê kir ji vir*

*Her bide daîm Xweda tu kibriya*
*Bernede ‘adat û rêza Enbiya*

*Tu qiyamke rahetî razan nema*
*De’wa dînê heq bibêje herdema*

*Ye’nî rabe bar girane pûr giran*
*Tu bitirsîne-j ‘ezabê, îns û can*

*Ger dixwazin hûn herin Darû-s selam*
*Her bidin daîm selat û hem selam*

# Mehbûbê Dilê Me:
# Muhammed ‘Eleyhîsselam

✍ **Ahmed Muhammedzade**

“لَقَدْ كَانَ لَكُمْ فِى رَسُولِ اللّٰهِ اُسْوَةٌ حَسَنَةٌ لِمَنْ كَانَ يَرْجُوا اللّٰهَ وَالْيَوْمَ الْاٰخِرَ وَذَكَرَ اللّٰهَ كَثِيرًا”

*“Sond be ku ji bo we, di (jiyan û tevgerên) Resûlê Allah Te’ala de, ji bo wî yê ku (xelata) Allah Te’ala û (çavpêketina) roja dawî (ya cîhanê) hêvî bike û Allah Te’ala di bîra xwe pir bîne nimûneyeke sipehî û kamil heye.”*

“قُلْ اِنْ كُنْتُمْ تُحِبُّونَ اللّٰهَ فَاتَّبِعُونِى يُحْبِبْكُمُ اللّٰهُ وَيَغْفِرْ لَكُمْ ذُنُوبَكُمْ وَاللّٰهُ غَفُورٌ رَحِيمٌ”

*“Bibêje: Heke hûn bi rastî ji Allah Te’ala hez dikin, nexwe bidin pey min, Allah Te’ala dê ji we hez bike û li gunehên we bibore. Allah Te’ala her Gunehbexş û Dilovan e.”*

“قُلْ اَطِيعُوا اللّٰهَ وَالرَّسُولَ فَاِنْ تَوَلَّوْا فَاِنَّ اللّٰهَ لَا يُحِبُّ الْكَافِرِينَ”

*“Bibêje: Bi gotina Allah Te’ala û Pêxemberê Wî bikin. Vêca heke ew berê xwe jê vegerînin, êdî bi rastî Allah Te’ala ji kafiran hez nake.”*

Hemd ji Xwedayê Te’ala re be, ku me gihîştande demsala bihara îsal jî. Bihar çawa ku ji bo kaînatê kêf û xweşî û zîndebûn e; ‘eynî bi wî awayî ji bo me musulmana jî kêf û xweşî û şahî ye. Lewra mehbûbê dilê me ‘Eleyhîsselam ku ji temamê kaînatê re rehmeten lîl ‘alemîn hatiye şandin di rojek ji rojê biharê de hatiye dinyê.

Bi îzna Xwedayê Te’ala roja mewlûda Wî ‘Eleyhîsselam emê çawa ku meydana Îstasyonê û temamê qad û meydanê welat bi coşeke mezin dagirin, me go ji bo ku ev hezkirina me li qad û meydana nemîne ji jîyan û exlaq û sunneta Resûlûllah ‘Eleyhîsselam çend nimûne di bîra hev bînin.

Lewra lazime ku em, ne di sersala Mewlûda Pêxemberê me ‘Eleyhîsselam de bi tenê Wî ‘Eleyhîsselam di bîra xwe bînin. Madem ku Xweda Te’ala Wî ‘Eleyhîsselam ji me re kiriye nimûneyeke sipehî û kamil (Uswet-un Hesene) dibe ku em Pêxemberê me ‘Eleyhîsselam di temamê awayê jiyana xwe de ji xwe re bikin rêber.

Xisûsen jî di vî zemanê ku însan ji Îslamê dûrbûne û hetta qirka xwe ketine nava fisq û ficûr û guneha de tabi’bûn û pêgirtina sinneta Resûlûllah ‘Eleyhîsselam zêde zêde bi qîmet e.

Resûlûllah ‘Eleyhîsselam di hedîseke xweyî şêrîn de wiha ferman dike û mizgîn dide: *“Çi zemanê ku ummeta min here/têkeve fesadê, kî bi sinneta min big-*





*re jê re xêra sed şehîdî heye.”* (El Beğewî- Huseyîn Bin Muhammed Eş Şafi’î- Mesabîh-us Sunne- Sewa’îqul Muhrîqe- Îbnî Hecer El Heytemî,)

Ku îro roj em ‘eynî ew zemanê ku di hedîsê de hatiye gotin de ne, gava di her awayê jiyana xwe de em Resûlûllah ‘Eleyhîsselam teqlîd bikin, hêvî heye ku Xwedayê Te’ala xêra sed şehîdî bide me jî. Bi kêmayî hema ku em di jiyana xwe de çi tiştê biçûk û çi jî di tiştê mezin de em sunnet-î seniyye teqlîd bikin, ewê her gavê jiyana me, di hukmê ‘îbadet de be û ji jiyana xwe te’mê bistînin.

Seydayê Ustad Bedî’uzzeman di Lem’a de dibê Îmamê Rebbanî Ahmed Farûqî (Rehma Xweda Lê Be) wiha gotiye:

*“Ez gava ku di meqamê rûhanî û me’newî de digeriyam û di derecê me’newî de bilind dibûm min dît ku di nav wan dereceyên ku ewliya gihîştinê de ya herî bi şewq, ye herî semyan û heşmetkar, ya herî bi letafet û ya herî bi ewle; ê ku girtina sunnet-î seniyye ji xwe re kirine temel û esasê terîqa (riya) xwe bûn. Hetta ‘ewamê ewliyayê vê derecê (riyê) ji xewasê derecê (riyê) dînê hê mezintirbûn.”*

Belê! De ka em çend nimûne ji jiyana Pêxemberê me ‘Eleyhîsselam di bîra xwe bînin, bê Ewî ‘Eleyhîsselam bi çi awayî hereket kiriye ku em jî îttîba’î sinneta Wî ‘Eleyhîsselam bikin.

1- Pêxemberê me ‘Eleyhîsselam; heyat û jiyana wî, ji serî hetta binî **bi nîzam û sazûman bû.** Ne tevlî hev bû.

2- Pêxemberê me ‘Eleyhîsselam; di ta’et û ‘îbadetê xwe de ji sehabiyê dora xwe re digo: *“Hûn min bi çi awî dibînin ez ‘îbadet dikim, bi wî awayî ‘îbadet bikin.”*

3- Pêxemberê me ‘Eleyhîsselam; ji şevê qismekî jê radibû ‘îbadet dikir û ji ğeyrî meha Remezanê duşem û êvarê îna rojî digirt. Rojê weke ‘Aşûrê û êvarê ‘îda Qurbanê jî rojî digirt.

4- Pêxemberê me ‘Eleyhîsselam; Gava ku Qurana Pîroz dixwend, lefzê Quranê ji devê wî yê mubarek derdiketin bi awayê ku bêne fêmkirin bû. ‘Ecele nedikir.

5- Pêxemberê me ‘Eleyhîsselam; Dilê wî li ser musulmana û ummeta wî pir dişewitî. Ji ber vê ne bi dilê wî bû ku musulman û ummeta wî zehmet û ‘ezab bikişînin.

6- Pêxemberê me ‘Eleyhîsselam; bê exlaqê wî çiqasî nerm bû ewqas jî mêr bû. Çi wextê ku wezîfa xweyî Pêxemberiyê dianî cî, çi jî di ciyê ku mêrantî lazimbû mêrantiya xwe di cî de nîşandida.

7- Pêxemberê me ‘Eleyhîsselam; tim silm û aşîtî dixwest. Lê belê gava ku herb dihate devê derî û diqewimî, berî herkesî şûrê xwe dida ser milê xwe û ji temamî sehabiyan re dibû pêşîvan.

8- Pêxemberê me ‘Eleyhîsselam; tim û daîm rûken bû. Gava ku leqayî musulmanekî dibû ‘ewil wî selam dida û bi rûyekî vekirî hal û xatirê wî dipirsî. Ku derdekî wî hebûna bi zimanekî xweş dilê wî xweş dikir.

9- Pêxemberê me ‘Eleyhîsselam; ji rastî û dirustiyê pir hezdikir. Musulmanê ku dirust

û exlaqê wan xweş bû bêtir qedr û qîmet dida wan.

10- Pêxemberê me 'Eleyhîsselam; di hizûra xwe de misa'eda xeberdanê beredayî ku bêne xeberdan nedikir.

11- Pêxemberê me 'Eleyhîsselam; gava diçû civatekê, ciyê vala li kur bûna lê rûdinişt.

12- Pêxemberê me 'Eleyhîsselam; gava ku du heb musulman bi hev re şer bikira yan jî qirên bikira, di cî de navbeyna wan çêdikir û nedihiştku ji hevdû biğeydin. Tiştê ku yekîtî û biratiya musulmana xerab bikirana di cî de dest diavêtê û nedihişt ku mezin bibe.

13- Pêxemberê me 'Eleyhîsselam; pir 'adil bû. Nedihişt li tu kesî neheqî bê kirin. Yekî ku neheqî lê bihatana kirin ji bo ku heqê wî bistîne alîkariya wî dikir.

14- Pêxemberê me 'Eleyhîsselam; rastî û dirustiya wî bela di dereca kemalê de bû, hê di xortaniya wî de temamê muşrîkê Mekkehê jê re digotin: "Muhammed-ul Emîn"

15- Pêxemberê me 'Eleyhîsselam; ne heqê kesî dixwar, ne jî dihişt ku kes heqê wî bixwe.

16- Pêxemberê me 'Eleyhîsselam; ji zaroka pir hezdikir. Bi wan re kêfxweş dibû û dileyîst. Lewra mihafeza zaroka wesîla ji xelasiya cehennemê dihesiband.

17- Pêxemberê me 'Eleyhîsselam; haya xwe ji zaroyê feqîran û şehîdan jî dianî. Wan mihafeze dikir.

18- Pêxemberê me 'Eleyhîsselam; ji zaroyê biçûk heta kalê heftê salî bi her însanî re 'eleqedar dibû û kêfa wan dianî.

19- Pêxemberê me 'Eleyhîsselam; dixwest ku mumin ji hev re bi dilovan bin. Ji dil ji hev hezbikin. Di her şert û ehwalî de bi hev re bi 'aqûbetbin.

20- Pêxemberê me 'Eleyhîsselam; digo divê musulman ji hev hesûdiyê nekin, di heqê hev de kîn û buğzê nekişînin. Xwe ji kîbr û ğirûrê muhafeze bikin.

21- Pêxemberê me 'Eleyhîsselam; ji biçûka re bi rihm û şefqet û ji mezina re bi hirmet bû.

22- Pêxemberê me 'Eleyhîsselam; wextê ku yekî feqîr bûna jî wî de'wet bikirana diçû mêvadariya wî serdanê dida nexweşa û diçû kêfxweşî û serxweşiyê musulmana.

23- Pêxemberê me 'Eleyhîsselam; ji mêvanê xwe re xizmet dikir û îkram dikir. Ji vê jî pir kêfxweş dibû.

24- Pêxemberê me 'Eleyhîsselam; gava ku tiştek jê bihatana xwestin, ku ji destê wî bihatana dida.

25- Pêxemberê me 'Eleyhîsselam; di heya û edeba Xweda li pêşiya temamê însana bû.

26- Pêxemberê me 'Eleyhîsselam; ji bo Xweda Te'ala 'aciz dibû, lê belê ji bo nefsa xwe 'aciz nedibû.

27- Pêxemberê me 'Eleyhîsselam; Naskirî û merivê xwe tim serdanî dida wan, silaê rehmê ji wan qut nedikir.

28- Pêxemberê me 'Eleyhîsselam; çi wextî rabûna û rûniştina mutleqe Xweda Te'ala zikir dikir wî di bîra xwe dianî.

29- Pêxemberê me 'Eleyhîsselam; pir merd bû. Nexasim jî di meha rojiyê de tu tiştî li ba xwe ne dicivand.

30- Pêxemberê me 'Eleyhîsselam; ji ehlê mala xwe re qenctirînê însana bû.

31- Pêxemberê me 'Eleyhîsselam; digo: *"Pîreka pir bi xêr, ew pîreka ku; zilamê wê gava ku lê dirêne kêfxweş dibe û 'îta'eta mêrê xwe dike û ji nefs û malê wî tiştê ku kêfa zilamê wê jê re nayê nake. Haydar Bin! Ha ew pîreka herî xêr e."*

32- Pêxemberê me 'Eleyhîsselam digo: *"Roja qiyametê ji însana ê pir nêzî min, ewê ku di nav însanan de pir selewat li ser min aniye ye."*

33- Pêxemberê me 'Eleyhîsselam; pir qîmet dida dayika. Ji ber vê jî gotiye: *"Cennet di bin lingê dayika de ye."* û digo: *"Ew kesê ku dê û bavê wî yan jî yek ji wan li balê ixtiyar dibe û ew kes bela ku xizmeta wan nekiriye nakeve cennetê bi pozê wî bişewite."...*

Belê Gelî xwendevanên 'ezîz! Em hê jî dikarin dirêj bikin, lê belê ciyê me ne musa'id e. Bi evqasî qîma xwe bînin. Emanetê Xweda bin. Xweda îttîba'a sunneta seniyyeyê nesîbê me teva bike. Amîn.

# Bîstê Nîsanê

✍ Mela Salih Mîsqenterî



Bîstê Nîsanê
Tarîxa mîlad
Nûr hat cîhanê
Însan bû azad

Nûra Muhammed
Li gund û beled
Heta bi ebed
Mizgîn û mirad

De wer binêre
Berya ew were
Girî w keder e
Her derê welat

Cîhana tarî
Guneh bê 'arî
Zulm û neyarî
Pêça bû 'îbad

Kufr û tuğyanî
Qetl û talanî
Bibû 'eyanî
Li nava bîlad

Rehma meriva
Qedrê dê w bava
Nema bû-l nava
Bajar û civat

Li gund û bajar
'Eraq û qumar
Faîz û mirar
Dixwarin qat qat

Vî qewmê beğî
Keçik bi sağî
Dixistin axê
Qêrîn û feryad

Ya Rebbê Rehman
Te-j 'erda Faran
Ronî kir cîhan
Em pê bûn azad

Muhammed hatî
Zûlim hilatî
Dinya bû rastî
Tev bûne dilşad


Selatullahî
Selamullahî
Li te be-b şahî
Hetanî me'ad

Qurana mubîn
Resûlê Emîn
Dermanê birîn
Îman û cîhad

Dinya bû bihar
Îslam hat diyar
Kêfxweş bûn ğemxwar
Îslam bû mîlad

Kulîlk û reyhan
Di meha Nîsan
Xemilîn ey can
Zivistan hilat

Salih sitûxwar
Çav li rê hercar
Kengî bê bihar
Bighîjê mirad





# Bihara Muhammedî

✍ Fexreddîn Şemrexî

*"Karê Xweda qedandin e"* dibêjin pêşî. Ji xwe çerxa gerdûnê, dewra jiyan û hebûnê, bi fermana Xweda bi bal çêbûnê, digerin mîna teşî. Sar û seqem vemirî, sibatoka dînik û gîskok buhirî. 'Întera şeva heft caran sayî û heft caran şilî qewirî. Cemre û rewa, xwe berda hewa. Dûre jî germ kir av û axê. De haydê va hat nîrê kesaxê, birrîn û pêçana beğçe û bağê. Hey derbas bûye pûka leglegê, bila di rê de neqefile, xeberê bidin hecheckê. Kulîlk û xonçe, xemilandin darên li nav baxçe. Alan kir dengê bulbulan ji zinar, mizgîn dan va dîsa hat fesla bihar.

Bihar va hat hemdê Xweda, diyar welat nûrê veda, coş e heyat gir û geda. Bila zarok têr bixwin firo, herin ber kar û berxa bi ro. Kanî û serab bi der bin, çem û robar bi ger bin. Pûng û tûzik, siping û xîlok, pirpar û tolik, qîvark û xerzik, şên bikin sifre û xîlik. Xweda dar û teba, vejandiye bi heb heba. Jiyan bi meqsede, meqsed bal Samed (Celle Celaluhû) e. Samed dixwaz bexş û bide, heyata cenneta ebed e, ji lew bijart Muhammed e (Selat û Silavên Xweda Lê Be). Ne nêrgîz û ne nesrîn, ne binefş û ne berfîn, mîna gula Muhammedê şêrîn, nabin teze û xweş bibîn. Bihar xweş e, bi Muhammed geş e, wek **Mela Mizgîn** gotiye:

*Dîsa dem û qala Wî ye*

*Mewlûd û sersala Wî ye*

*Her cî gulîzara Wî ye*

*Xuşk û birayên musluman.*

Her çiqas birîna Roboskî, qetlîama Qerqelî anîbe bîra me jî, kul û birîna Helepçe nû kiribe jî, feryad û qêrîna Amed û Pîran, Dêrsim û Zîlan bi bîr anî be jî, bihara me bi evîn û nûra Muhammedî welat seranser, bi bal tav û tîrêjên roja Îslamê ve, li ser hêviyên Se'îdan, xemilandiye. Bi îman vejandiye. Zulm û zordarî hejandiye. Ger qencên mexlûqên erd û asîmanan, aşiqên nûr û cemala bavê Fatima bin, wê mezlûm û azadîxwazên welat, ronî û felata jiyana du cîhanê hey bixwazin. Padîşahê Allahê ku Muhammed (Selat û Silavên Xweda Lê Be) ji Medînê re şand û kir yar, xelqê Medînê ji Muhammed (Selat û

Silavên Xweda Lê Be) re kire bendewar û evîndar, helbet dîsa Muhammed (Selat û Silavên Xweda Lê Be), ji mezlûm û mêrxasa re dike hêvî û serdar her weka **Melayê Cizîrî** gotiye:

*Erwahê muqeddes şebê qedran te dixwazin*

*Nûra te ye mîsbahê di qindîlê herem da*

*Da weqtê lîqayê bi te hey bin di beqayê*

*Min neqdê dil û can di fenayê bi selem da*

Madem ehlê Medîne, Muhammed (Selat û Silavên Xweda Lê Be) ji wan re evîn e, çavê Cihûdê bi kîn li revîn e, heta ku xwe ji qehra bixeniqîne. Digel anîbûn ser ziman ku Muhammed (Selat û Silavên Xweda Lê Be) e pêxemberê axirzeman, lê ji hesûdiyê, xwe xistin xusraniyê. Medîne dilşad û serfîraz e bi Muhammed (Selat û Silavên Xweda Lê Be), ma kîjan Selûl û Cihû dikare wan ji vê nûrê biqetîne? Heger Kurdistan bêğem, bi coş û mîna lehî û çem, weka eşqa Huseyn û Mem, xwe avêtibin behr û bihara Muhammedê Ekrem (Selat û Silavên Xweda Lê Be), ma kîjan Begê bi gem û zem, kare têkeve pêş vê 'işqa mu'ezzem. Ger yek Mem û Zîn, li ser hub û evîn, qelbên xwe bikin birîn jî, bi mîlyona mumin û canfîdanên doza Muhammedê Emîn (Selat û Silavên Xweda Lê Be), bi îman û eşqa dîn, vejiyane yeqîn. Lewra tu 'eşq û sewda, naghêje hub û muhebbeta Rehmeten lîl 'alemîn weke Şêx Ahmedê Xanî di beşa çaremîna Mem û Zîn de dibêje:

*Ey wasîteyê wucûdê kewneyn / Şayesteyê qurbê qabê qewseyn*

*Şahînşehê textîgehê Medîne / Mu'cîz ji te ew qeder me dîne*

*Seyra felekan li nik te gavek / Fexra melekan ji te silavek*

*Şeqqel qemera te yek îşaret / Zağel besera te yek 'îbaret*

*Ey padîşahê serîrê lewlak / Rabe here asîmanê çalak*

*Hazir ji te ra Buraq û Refref / Şatir ji te ra firîşte ref ref*

*Da refi' bibin ji ber te perde / Bê perde digel Xwedê xeber de*

*Bêje tu Qedîr û Zulcelalî / Bêje tu Qedîm û layezalî*

Qencî û xweşî, ne bi xwestinê tenê ye. Liyaq û babetî jî pê ve ye. Tiştên rahîb Bahîra didît, Yehûdiya jî zanibûn. Bes ne layiqî wê şerefa bûn. Selmanê Faris, nûra wî Pêxemberê li ser ummeta xwe haris, ji Nisêbîn didît û ji bo gihîştina wî jî, xortbûniya xwe li ser dida. Lê ap û amojina Pêxember, nûra li ber derê xwe, ne didîtin û ne dixwestin bibînin. Tew rabin neyartiya Wî bikin, agir û 'ezab li xwe dibarînin. Îro dinya heger ji rastî û qenciyê, ji exlaqxweşî û 'edaletiyê, ji merhemet û emîntiyê pê vetir tu tişteki xerab di şexs û heyata Hezretî Muhammed de (Selat û Silavên Allah Te'ala Lê Bin) nabîne, Kurdên ku guhdar û hevalên Hz. Nûh, Hz. Îbrahîm, Hz. Yûnûs, Hz. Zulkifil (Selamên Xweda li ser wan bin) bûne, hewariyên Îsa ('Eleyhîsselam) hewandine û mizgîna hatina Hz. Resûlûllah ji wan girtine, çima dîn û doza Hebîbê Xweda qebûl nekin, li ser ser û çavên xwe nekin! Weka **Melayê Bateyî** di ne'ata xwe de gotiye:

*Ey serwerê dîn mehbetê ayetê mukerrem*

*Îsmê te di hindî suhûfan bûye mufexxem*

*Lutfa te şeyatîn ji sema kirne mureccem*

*Ger dê tu nebuya nedibû çerxê mu'ezzem*

*Tûba lî men eşfe'te lehû kunte mucîra*

*Ursîlte îlel xelqî beşîran we nezîra*

Eşq û doz û nûra Muhammed (Selat û Silavên Allah Te'la Lê Bin), wekî firo paqij û li gor fitret e. Havîna wê, ji îman e. Bi Cibrîlê emîn, hezkirina Muhammed (Selat û Silavên Allah Te'la Lê Bin), rihetiya rih û can e. Zelal û parzûnandiya hiş û fikr e. Şîfa û derman e ji bo kul û derda, wek avsara zozan e li ser çeltûk û medreba. Însan û civak, digrin ders û mînak, ji siyera Pêxemberê mûxatabê lewlak. Hikm û ferzên Quranê, se'adeta însaniyet e. Bav û kala re, rê û rûmet e. Nîşan Şêx Se'îdê bi 'izzet e. Kî ji Muhammed (Selat û Silavên Allah Te'la Lê Bin) hezkirye û ne gihaştiye qezencê? Ji lew eshaba kirne hîcret û gîhane derencê. Madem wilo, xas û xulasa peyvê bi hindikî, gotina Seyyîd 'Eliyê Findikî:

*Temam em bibin tabi'ê Mustefa*

*Biçin cennetê da bi sidq û sefa*

*Hezaran selat û hezaran selam*

*Bibarin wela yenqetî' bî-d dewam*

*Li ser Wî Resûlê Kerîmê Emîn*

*We hem al û Eshabê Wî ecmeî'n*

# Ez 'Aşiqê Demsala Biharê Me

✍ **Mela Salih Mîsqenterî**

**Ez ji demsala biharê hez dikim**! Lewra bihar nîşanê 'eşq û hezkirinê ye, nîşanê xêr û bereketê ye. Bi rastî di biharê de 'ezman bi meşa 'ewra, bi şewqa birûskê, bi girre girrê dengê 'ewra û bi barana pir, bi îzna Xweda camêriya xwe eşkere dike û deryê bereketê li me vedike. Bi sedem wê baranê bi fermana Xweda 'erda mirî sağ dibe, mêrg û zozan giya û pincar şîn dibin, dar jî pel didin, gul digrin û fêkiyê xwe ji me re diyar dikin. Kulîlkê rengo reng ji gelek celeba vedibin, cîhanê dixemilînin. Kewê gozel, bulbul û şêrûn bi 'eşq û evîn û dilxweşî dixwînin û li ser dara, li deşt û zozana bi deng û hunerên xwe cîhanê mest dikin. Pinpinik bi kêf û coşek mezin li rast û çep difirin reqs û dîlanê dikin.

**Ez ji demsala biharê hezdikim!** Lewra di demsala biharê de tu dibînî ku bayê nerm, gul û kulîlkê rengo reng bi rast û çep di xwar dike. Ji Xweda re diçin rikû' û sicûdê her wekî bi zimanê hal dibêjin: *"Lebbeyk Allahumme Lebbeyk"* wek wî heciyê îhram li xwe kiriye li hawîr dor **Ke'bê** digere. Di navbeyna **Sefa** û **Merwe**yê de diçe û tê û wek wî heciyê berê xwe daye **Çiyayê 'Erefê** çi dema ku bi girikekî de hildikşe, an jî dadikeve newalê, bi dengê bilind dibêje: **"Lebbeyk Allahumme Lebbeyk"**… Di jiyana însan, heywan, çem, dar û pincara de tu demsal ji biharê xweşiktir tune ne.

**Ez ji demsala biharê hez dikim!** Lewra di biharê de kemala qudreta Xweda ji herkesî ve eşkere xuya dike; çi 'alim, çi cahil, çi xwendevan, çi nexwendevan, çi xas, çi 'am, çi mumîn û çi kafir. Hem jî bihar delîlek xurt e li ser sağkirina miriya û be'sê (rabûna ji mezel)

فَانْظُرْ اِلٰى اٰثَارِ رَحْمَتِ اللّٰهِ كَيْفَ يُحْيِي الْاَرْضَ بَعْدَ مَوْتِهَا اِنَّ ذٰلِكَ لَمُحْيِي الْمَوْتٰى وَهُوَ عَلٰى كُلِّ شَيْءٍ قَدِيرٌ


Xweda Te'ala wiha dibêje: *"De li şop û eserê Rehma Xweda binêre, bê piştî mirinê 'erdê çawa sağ dike. Bi rastî ew (Xwedayê ku erdê sağ dike) wê miriya jî sağ bike û qudreta wî li ser her tiştî heye."* (Sûretî Rûm-50)

Sûretê Fussîlet ayeta 39an jî vê heqîqetê teqwiye dike. Belê çawa ku Xweda Te'ala bi avê 'erda mirî sağ dike, wiha renge qelbê mirî jî bi nûra wehyê, 'ilm û hîkmetê sağ dike.

**Ez ji demsala biharê hez dikim!** Lewra di biharê de teyr û çivik bi xwendina xwe, çem bi xuşxuş û herikandina xwe, gul û nêrgîz û sosin bi reng û xemla xwe, bi bêhna xweşî wek miskê, eşkere û bi coş û cezbe zikrê Xweda dikin. Mêşa hinguv bi nîzam û qanûna ku Xweda îlhamî wê kiriye, di gerr û firra li ser kulîlka, li gorî emrê Xweda di çêkirina hunguvê bi şîfa zikrê Xweda dike.

Ji xwe temamê kaînatê her demê zîkr û tesbîhê Xweda dikin. Lê belê di demsala biharê de bêtir zikir dikin. Û zikrê xwe eşkere dikin. Çawa ku heccacî di demsala heccê de bêtir 'îbadetê dikin û bi tekbîr û telbiya dengê xwe bilind dikin.

**Ez jî demsala biharê hez dikim!** Bi rastî bihara dila bi îman, tewhîd, 'eqîda selîm, hezkirina Xweda, Resûlê wî û kîtaba wî çêdibe û dixemile. Lewra dil wek 'erda ne,



wehya îlahî jî wek ava baranê ye. Çawa ku bi qutbûna baranê 'erd hişk dibe, diterike, wiha renge qelbê ji îmanê vala hişk dibe, kor dibe û dimre. Xweda Te'ala ferman kiriye:

فَإِنَّهَا لَا تَعْمَى الْأَبْصَارُ وَلَٰكِنْ تَعْمَى الْقُلُوبُ الَّتِي فِي الصُّدُورِ

*"Bi rastî (rewş ev e): Çav kor nabin, lê belê ew qelbên di singa de kor dibin."*(Sûretê Hec-46)

Bihara dewlet û bajara gund û civakê însanî jî bi meşandina hukmê şerî'eta Xweda ne. Lewra bi tetbîqa şer'a Xweda civak dikevin biharek bê qisûr. Jiyana wan dibe hizûr û dilxweşî. Alîkarî, hezkirin û biratiya bi rastî di nav wan de bi cih dibe. Lê belê çi dema hukmê şer'ê ji jiyana civaka rabe wê demê jiyana wan dibe berdî berdan. Tirs û çavnebarî û enaniyet derdikeve pêş. Xweda Te'ala wiha dibêje:

أَفَحُكْمَ الْجَاهِلِيَّةِ يَبْغُونَ وَمَنْ أَحْسَنُ مِنَ اللَّهِ حُكْمًا لِقَوْمٍ يُوقِنُونَ

*"Qey ew hukmê cahilî dixwazin? Û hal ev e ji bo qewmekî ku yeqîn dikin hukmê kî ji ê Xweda xweşiktir e?"* (Sûretê Maîde-50)

**Ez ji demsala biharê hez dikim!** Lewra bihara cîhanê bi wîladeta mezinê me Muhammed Mustefa (Selat û Silavên Xweda Lê Bin) çêbû û xemilî. Wîladeta wî; ji bindest û kola re, ji yetîm û jinebiya re, ji dilê bi birîn û çavê bi hêsîr re bû mizgîna biharek nû. Ewanê ku beden û rûhê wan di demsala zivistanê de ketibû bin ezyet û te'dên zalima bi sala digriyan û dinaliyan… Xweda Te'ala wiha ferman kiriye:

وَمَا أَرْسَلْنَاكَ إِلَّا رَحْمَةً لِلْعَالَمِينَ *"Bes ji bo ku tu ji 'aleman re bibî rehmet me tu şandiye."* (Sûretê Enbiya- 107)

**Ya Rebbî!** Tu qelbê me 'eql û mêjiyê me, şi'ûr û tesewwira me, bi nûra bihara îmanê, teqwa û îxlasê ronî bike.

**Ya Rebbî!** Tu jiyana me yî şexsî, civakî, exlaq û tevgera me bi bihara zikr û şukr û 'îbadeta xwe yî xweşik bixemilîne.

**Ya Rebbî!** Tu berya mirinê, bi dîtina şerî'eta xwe çavê me ronî bike, dilê me jî xwe bike. (Amîn)

**Ya Muhammed (Selat û Silavên Xweda Li Te Bin)!** Tu di biharê de hat te ji me re bihar û xweşî anî. Bê jimar selat û silav li ser te bin Ya Hebîbûllah! Bê jimar selat û silav li ser te bin Ya Emîne Wehyîllah!

Salvegera Wîladeta roniya çava tixtorê dila Muhammed 'Eleyhî-s Selat û We-s Selam ji cîhanê re, ji ummeta Îslamê re pîroz be, mubarek be… Bimînin di xêr xweşiyê de.

# Nûra Dila Muhammed

✍ **'Emerê Wezrînî**

*Jiyan bê te bê pare-j edeb, exlaq û 'ar e*
*Helbet bi te ye çare nûra dila Muhammed*

*Tuyî Qurana-l serpî xweş exlaq û edebî*
*Hîva şeva reş tarî nûra dila Muhammed*

*Gaziya Heq te'ala li te kir-l 'erşê 'ala*
*Gerdûn bê te ye vala nûra dila Muhammed*

*Heyrana çavê meyî hesreta dilê jarî*
*Tuyî-j eşqê re kanî nûra dila Muhammed*

*Ev dilê minî beyar şîn bû bi evîna yar*
*Bê te nabe qet hişyar nûra dila Muhammed*

*Parêzgeha bê kesa heviyî ji bo qelsa*
*Azadiya bindesta nûra dila Muhammed*

*Xelasî bi te ye tim jîn bê te nabe daîm*
*Bi nûra te dilgeş im nûra dila Muhammed*

*Bingeha serxwebûnê 'edalet û hebûnê*
*Rizgariya-j harbûne nûra dila Muhammed*

*Ê te nasneke bes e bibe-j neqencê nas e*
*Her tim rezîl û pîs e nûra dila Muhammed*

*Heye şeref û 'izzet di ketina riya Te qet*
*Tevî namus û ğîret nûra dila Muhammed*

*Bi evîna te bihar şîn dibe her dem û car*
*Him kulîlk dan hemî dar nûra dila Muhammed*

*Ji hesreta te zistan cemidî bû goristan*
*Hişk bûn tev bağ û bostan nûra dila Muhammed*


*Ji bo mezlum û jara derxe-j destê zordara*
*Şîn bike car din wara nûra dila Muhammed*

*Ev Qurana nûrweşîn fermanê Rebbê dilvîn*
*Jîn da-b zimanê şêrîn nûra dila Muhammed*

*Xwezî hebûna rêyek J-bo dîtina te carek*
*Bidma destê te maçek nûra dila Muhammed*

*Tuyî ser werê 'alem taca serê me herdem*
*Li Feqîr bike kerem nûra dila Muhammed*






# Ji Rîsaleya Ayet-ul Kubra Merteba 16an

✍ Bedî'uzzeman Se'îdê Kurdî

Werger: 'Umer Farûq Sipkanî)

Ustad Bedî'uzzeman (Rehma Xweda Lê Be) bi kurtayî çiqas xweşik Resûlûllah 'Eleyhîsselam bi me daye naskirin û wisa dibêje:

**Ew zat 'Eleyhîsselam**, bi şerî'et û Îslamiyet û 'ibûdiyet û du'a û de'wet û îmaneke wisa derketiye holê ku, ne mislê wan hene û ne jî wê mislê wan di kesî de bibin. Bi wî awayî yên xweşiktir ne hatine dîtin, ne jî wê bêne dîtin. Lewra di zatekî ummî de, ew şerî'eta ku peyda bûye û bi vê şerî'etê ku ev serê 14 'esra ye ji pênca yek însan; bi 'edalet û li ser heqqaniyetê û bi qanûnê mudeqqîqane ye ku bê hed û hîsab pê hatine îdarekirin, ha eviya tu emsalî qebûl nake.

**Ew zatê ku Ummî 'Eleyhîsselam**, ji fi'il, xeberdan û ehwalê wî Îslamiyeta ku derketiye û di her 'esrê de bûye rêber û mercî'a 300 milyon însanî û ji cîhet ku bûye mamoste û murşîdê 'eqilan, dilan ronayî û safîkiriye, nefsan terbiye û paqijkiriye û bûye sebeb ji bo bilindbûna rihan re ku Ew 'Eleyhîsselam e; **mislê wî ne dibe, ne jî wê bibe.**


Hem di dînê ku aniye de, bi temamê hawê 'îbadeta de di pêşiya însana de ye û ji temamê însana bêtir ji Xweda Te'ala tirsiya ye û bi teqwatir bûye û di wê hengama teblîğê de ku hewqas îşkence û te'dên lê dihate kirin, wî di 'ibûdiyeta xwe de bi mîsqalê zerre sistayî nekiriye û di 'îbadet û ta'etê xwe de kesî teqlît nekiribû jî, lê belê dîsa bi awakî mukemmel 'îbadet û ta'etê xwe dikir. Bi vî awayî xwe jî mislê wî nayên dîtin û nehatiye dîtin.

Hem bi hezara ku du'ayê Wî yên mubarek hene, ji vana yek jê jî ku **Cewşen-ul Kebîr** e. Di vê du'a Cewşenê de bi awayekî wiha Xweda Te'ala naskiriye û bi me jî daye naskirin ku ji wî zemanî ve ehlê me'rîfet û ehlê welayet ewqas du'ayên xweş kirine, bi hawê ku Wî 'Eleyhîsselam du'a kiriye negihîştine dereca me'rîfetê û bi wî awayî tewsîfa Xweda Te'ala nekirine. Eviya jî bi me dide zanîn ku, di du'a kirinê de jî mislê wî kes tune ye.

Hem di teblîğa rîsaletê de û di de'weta şerî'etê de bi awayê ku metanet, sebat û mêranî daye nîşandan, ku ewqas dewletê mezin û olê mezin, qewm û 'eşîr û apê wî bi xwe neyartiyeke ewqas mezin pê re kirine jî wî dîsa bi mîsqalê zerre tereddut û tirsayî nîşan nedaye û dest û piyê wî li hev negeriya ye û bi tena serê xwe ji temamê cîhanê re meydan xwendiye û Îslamiyetê bi temamê cîhanê daye fêmkirin. Ev jî dide nîşandan ku; **di teblîğ û de'weta Îslamê de de'wetvanekî mislê wî nebûye û wê jî bibe.**

Hem ku di îmanê de, ku bi qeweteke zêdeyî taqeta însan û bi yeqîneke mezin û bi bawerî û îtîqadeke temamê cîhanê ronayî kiriye. Bi tevî ku di wî wextî de di nava însana de fikr û bawerî û felsefên ku hakimbûn bi temamî mixalifê wî bûn jî evana temam bi mîsqalê zerre di yeqînî û baweriya wî de tu şubhe, tu tereddut, tu weswese peyda nekirine. Di me'newiyatê de û di dereca îmanê de ku pêşîvanê sehabî û temamê ehlê welayetê ku tim û daîm wî ji xwe re kirine rêber û ji îmana wî feyz sitendine û bi wî awayî di me'newiyat û dereca îmanê de bilindbûne, eviya jî weke rojê li ber çavaye ku **Pêxemberê me 'Eleyhîsselam di îmanê de jî bê emsal e.**

Belê! Ji xwediyê şerî'eteke bê emsal, Îslamiyeteke bê misil, 'ibûdiyeteke pir xweşik, du'ayeke fewqel'adet, di de'weteke ku li temamê cîhanê meydan dixweyne, îmaneke bi mu'cîze; helbet bi tu hawî vir û derew jê peyda nabin û tu kesî naxapîne 'eqil jî vêya bi vî awayî tesdîq dike. **(Mektûbat- Mektûba 19- Ji Ayet-ul Kubra- Merteba 16.**




# Muhammed e

✍ Mela Mizgîn

Muhammed e serwer ê heq nebî û qasida
Muhammed e efdalê temamê xelqê Xweda
Muhammed e uswe û nimûna şah û geda
Muhammed e ê ku em xwe jê re dikin feda

Ji heq selat û selam li ser bi barin timî
Feda be jê re me dê û bav û zar û hemî

Muhammed e nebiyê axirzeman û umî
Muhammed e heq resûl û nebiyê xatemî
Muhammed e her tenê pêxemberê ‘alemî
Muhammed e qaidê hîzba Xweda her demî

Ji heq selat û selam li ser bibarin timî
Feda be jê re me dê û bav û zar û hemî

Muhammed e ê ku her rehmete ser ‘alema
Muhammed e ê riya rast a wî ye her dema
Muhammed e ê devê zalima xiste gema
Muhammed e serfîraziya Ben-î Adema

Ji heq selat û selam li ser bibarin timî
Feda be jê re me dê û bav û zar û hemî

Muhammed e rewşena temamê qelb û dila
Muhammed e sorgul û dilevîna bulbula
Muhammed e şahî û ğemrevîna dil kula
Muhammed e rehber û mu’ellimê aqila

Ji heq selat û selam li ser bibarin timî
Feda be jê re me dê û bav û zar û hemî

Muhammed e bêguman ew e du’a Îbrahîm
Muhammed e Mizgîna ‘Îsa û Mûsa Kelîm
Muhammed e sahibê mehdera roja ‘ezîm
Muhammed e bêguman hebîbê Rebbê Kerîm

Ji heq selat û selam li ser bibarin timî
Feda be jê re me dê û bav û zar û hemî



# Peyvek Li Asîman

✍ Fedlullah Polan

**Dinya,** bi tevî zilm û kufrê, kuştin û herbê, bi tevî zêde kirina dijwarkirina xwe, bi tevî bar girankirina xwe; belê li ser sebrê di riya Rebbê 'alî jê re te'yîn kiriye de diçe.

**Roj** li fezayê, bê ğema kûrbûna tarîtiyê, di seyra xwe de digere. Li ser asîmanê me; ne bi lezbûn, ne bi hêdîbûn… Şewqa xwe dide ser zemînê, ronî dike, germ dike…

**Heyv** şewqek sipî ye. Carna girover carna nîvî ye, carna xuyayî carna hundayî ye. Belê tim li hember reşayî ye. Di nav behra tarîtiyê tekoşîna ronahî ye. Her çiqas 'ewrê reş wê bipêçin jî; ew derdikeve, xwe nişan dide, nûra qelban rêya qenca geş dike.

**Ez û Te, û heval…** Li civata dinya û roj û heyvê ne. Keremkin! Rûnin… Civata me ne ğerîb e. Ji wexta ez bîrewer bû me, ez bi wan re hevalim. Ha! Em sitêrkên berqane jî jibîr nekin. Vêga pir kêm bûne lê di zaroktiya min de li ser bana textê razanê hebûn. Heta ku ez di xew ve diçûm min li asimana di'eyîşand. Ji boy dûrbûna sitêrkan ez hinekî ğemgîn dibûm; lê pirranî heyvê bala min dikişand. Min dikişandin nav xeyalan û nav xewnan... Aha hevaltiya min bi wan re wisa dest pê kir. Her çiqas zehf û hindik be jî muheqqeq we jî hevaltî bi wan re kiriye.

Hasilî, em ji bîrewernameyan vegerin rewşa îro, ji xeyala vegerin heqîqetê. Ka di heqîqetê de civata me çi ji me re dipeyive?

**"Zinhar sist nebin, mehzûn nebin! Heke we bawerî anî be, aliyê ku serdestbin hûn in."**

Rast e, zilm û zordestî didome, kufr û xerabî zêde dibe… Belê mehzun nebin, ğemgîn nebin. We îman anîye! Hûn mûmin in! Hûn bi Rebbê dinya û roj û heyvê bawer in! Barê we weke barê dinyayê giran be, dûjminê we wek e, harên ser zemînê dijwar be bi herb û kuştinê; disa hûn weke dinyayê li ser rêya Rebbê 'alî, belê bi sebr bimeşin... Vê dinyayê pir qulibandina Nemrûd û Fir'ewna dîtiye. Hûnê jî qulibandîna şeytanê 'Emerîqa û çêlîkê wî bibînin. 'Emrê ew kesên Qurana Pîroz dişewitînin hindik e. **Xweda Allah mizgîn da ye, hûn bawermendbin, ehlê sebr û 'izzet bin, yê ku serdest bin hûn in…**

Bi rastî ev de'we û doz weke rojê zahir e û heqîqet e. Disa pirê însana çavê xwe miç dikin, li pey şeytan, li dûv zalima diçin. Belê hûn qimetê de'wê, qîmetê heqîqetê bizanbin… Weke rojê bi sebr û 'esalet bin, weke rojê şewq bidin, weke rojê şewqa ji dûrrê heqîqetê bigerînin, weke rojê dilê însanan germ bikin… **Xweda Allah mizgîn da ye, hûn bawermend bin, ehlê sebr û 'izzet bin, yê ku serdest bin hûn in…**

Rast e, weke heyvê tarîtî û 'ewrê reş we dorpêç kirine, rêçê pûç û beredayî bi zordarî ber însana xistine, bi vir û xap û dolaba reşayî bela kirine… Hûn bizanbin leşkerê şev û tarîtîyê bi meqseda êrîşî qelba dixebite. Hûn weke heyvê geş bin, letîf bin, bi Nûr bin… Hûnê di qelbên talibê heqîqetê de xuya bibin. **Xweda Allah mizgîn da ye, hûn bawermend bin, ehlê sebr û 'izzet bin, yê ku serdest bin hûn in…**

# Dil Ji Min Bir

✍ Melayê Cizîrî

Şox û şengê zuhre rengê
Dil ji min bir dil ji min
Awirên heybet pilingê
Dil ji min bir dil ji min

Wê şepalê miskê xalê
Dêmdurê gerden şemalê
Cebheta biskan sema lê
Dil ji min bir dil ji min

Zulf û xalan nûn û dalan
Wan ji min dil bir bi talan
Goşeyê qewsê hilalan
Dil ji min bir dil ji min

Dên nedîrê bo ʿebîrê
Xemrî û Gîs û Herîrê
Sîne kir amancê tîrê
Dil ji min bir dil ji min

Surşirînê nazenînê
Kuştim û nakit yeqînê
Wê bi çengala evînê
Dil ji min bir dil ji min

Qetlû taban da ğuraban
Ebleq û cohtê şebaban
Dame ber pence û kulaban
Dil ji min bir dil ji min

Xweşxeramê ez ğulamê
Nazikê şîrîn kelamê
Tûtiya eywan meqamê
Dil ji min bir dil ji min

Mahirûyê miskiboyê
Surpilîngê şêrixûyê
Wê bi zulfa şubhê goyê
Dil ji min bir dil ji min

Herdu weşman naz û xeşman
Kê ji ber wan ʿeql û hiş man
Saʿeta min dî bi çeşman
Dil ji min bir dil ji min

Mahitabê afitabê
Dêm ji roj û şeb niqabê
Xweş bi çengal û kulabê
Dil ji min bir dil ji min

Serwînazê serferazê
Şubhê zêr remza mecazê
Dame ber çakuç û gazê
Dil ji min bir dil ji min

Bejn û bala tûx û ʿala
Min kirin vêk ra mutala
Çîçeka terhîn-i wala
Dil ji min bir dil ji min

Mîrê ğazî şîrê tazî
Vêk-i ran mindî bi bazî
Kir li me-j ğeflet ve gazî
Dil ji min bir dil ji min

Şîr û xişt în zulf û qişt în
Hîn veşarîn hîn vehiştîn
Pehlewanan dest vemiştîn
Dil ji min bir dil ji min

Rohniya çehvên Melayî
Ew tecellaya te dayî
Ya ji Ahmed dil revayî
Dil ji min bir dil ji min





# Libergerîn

✍ Selamiyê Bilêderî

Ey Rebbê me yê Helîm û Letîf! / Em 'ebdê Te yên 'aciz hatin dergahê Te! / Em miskînê Te hatin dergahê Te! / Em feqîrê Te hatin dergahê Te! / Em xwestekê Te hatin dergahê Te!

**Ey Rebbê me yî Muqeddîm û Cebbar!**

Tu bidî xatirê rehmeta xwe! / Tu bidî xatirê 'Izzet û 'Ezemeta xwe!

Tu bidî xatirê qewet û ceberûta xwe! / Tu bidî xatirê celala wechê xwe! / Tu bidî xatirê navê xwe yê şêrîn! / Tu bidî xatirê 'ilmê xwe! / Tu bidî xatirê nûra Cemala xwe!

Tu gunehên me yên bûne sebebê bela û musîbeta, 'efû bike! Gunehên me ku bûne sebebê du'ayê me qebûl nebin… Wan gunehên me û temamê gunehên me yên eşkere û yên veşartî… Yê bi nezanî û yê bi zanebûn me kirine… Tu bi rehm û kerema xwe 'efû bike.

**Ya Muqeddîm! Ya Îlahî!** Te bê hed qebehet û gunehên me bi lutf û kerema xwe veşartine; bê hed lehiyê bela û musîbeta ji ser me rakirine… Te di nav xelqê de pesnê me û nav û dengê me bela kiriye… Tu bidî xatirê 'ızzeta xwe û Hebîbê xwe… Tu bidî xatirê 'Elî û Fatîme û Hesen û Huseyîn û Eshabê Bedrê! Tu bidî xatirê 'eşqa xwe! Tu du'ayê me û yê ku vê du'ayê re dibêjin "Amîn"… Nevegerîne!

**Ya Hey! Ya Qeyyûm!** Qey ji te pê ve kî yê me heye ku van belayê uxrewî û dunyewî ji ser me rake? Tu bidî xatirê wechê xwe yê ku temamê tarîtiya ronî dike! Tu biratiya heqîqî têxe nav me… Rehm û muhebbetê têxe nav me! Me bigerîne ji wan kesên ku Tu di Qurana xweyî Hekîm de dibêjî:

"أَشِدَّاءُ عَلَى الْكُفَّارِ وَ رُحَمَاءُ بَيْنَهُمْ"

Me bigerîne sehabiyên vê dewrê!

**Ya Mûcîb! Ya Wekîl! Ya Kerîm! Ya Wehhab!** Em rûyê xwe dizîvirînin Te… Dilê xwe û destê xwe ji te re vedikin… Tu me 'efû bikî, ji xwe ev ji şenê Te ye… Heger Tu me 'efû nekî, ji Te pêve Îlah tunin ku em herin dergahê wî. Dayikek ku li sebiyê xwe bixe jî, piştî girîna sebiyê xwe dibîne; wî li pêsîra xwe hemêz dike…Ev fitret û şefqeta ku te daye dayika… Tev ji wan navê Te yên xweşik leme'an bûne… Îşaret û delîlin ji wî şefqet û rehm û dilovaniya Te yî bê mîsal re…

**Ya Selam! Ya Wedûd!** Tu me bi bayê helîm û selîm hîdayet û islah bike û li ser hîdayetê sabit bigre! Bi 'ilm û teqwa… Bi heya û sebrê… Bi me'rîfet û muhebbeta xwe me bixemilîne! Di 'eşqa xwe de me ğerq bike!

Êş û elem… Kul û derd û birîn… Ğerîbî û bêkesiya nexweş û pirê me… Mehpûs û muhacirê me û yên temamê ummetê… Yên ku bela û musîbetên giran hatine serê wan… Tu bi rehm û kerema xwe birîn û elemê wan derman bike! Sebr û ferecê bide! Ji temamê tengahiya xilas bike û 'afiyetê bide! Tengahiyê ku hatine serê me bike sebebê qurbiyet û evîna xwe! Amîn…

Welhemdulîllahî Rebbîl 'Alemîn… Esselatû wesselamû 'ela Muhammedîn we alîhî we sehbihî ecme'în.



# Kul û Derdê Ummetê

✍ Hêvîdar



*Dîsa hatin bîra min kul û derdê ummetê*
*'Alem çiqa dûr bûye ji Quran û sunnetê*
*Ev dil daîm bi şîn e dikşîne tim hesretê*
*Ya Rab ji me-r bişîne her û daîm rehmetê*

*Çiqa zemanek zor e her tişt bûye xerabî*
*Însan di ğefletê de hundabû bê hîsabî*
*Dikşîne-j malê dinya ev nefsa pir ğedarî*
*Nayne bîra xwe tu car dayîna vî hîsabî*

*Şeytan li me tarî kir heqîqetê bi carek*
*Heta roja we'da wî jê re tune hîsabek*
*Ji însan re qê heye ji wî dujwar neyarek*
*Hê tu çima-l pey wî yî ey însanê mubarek*

*Xweda-l me hate rehmê li ser vî halê me ra*
*Şand ji me-r ewliya û esfiya û rehbera*
*Di vê rê de dîtin wan gelek derd û kedera*
*Ji boy zulm û tarîtî derke-v îdî-j her dera*

*Layiq ji me-r ew e ku em xadimê Îslam bin*
*Daîm li pey enbiya, rêzan û rehbera bin*
*Se'adeta her demî ne bi wan be çênabin*
*Riya ku-j me-r vekirne her û daîm têda bin*

# Guhertin Lê Guhertineke Çawa?

✍ ‘Emerê Wezrînî

Ez bawerim ku îro çav û hiş û ‘eqlê civaknasan (sosyolog) li ser guhertina civakê ye. Ne bi tene civaknas, dîsa ez bawerim ku kesen dixwazin ji bo civakê tiştekî bikin jî li vê guhertinê dinêr in. Bele îro gelê me di guhertinekê de ye. Tu gel û civak nînin ku dem bi dem diguhertinekê de derbas nebin. Ji destpêka jiyana însan heta îro hemî civak û gel guhertin e. Ev guhertin carna bal bi başiyê ve çêbûye, carna jî bal bi xerabiyê ve... Tu gel û medeniyet nînin ku rewşa wan ji destpêkê heta dawiyê wek hev derbas bûbe.

Tu guhertin jî bi carekê çenebû ye. Hêdî hêdî çêbûye. Kesên jîr û bi ’aqil, yanî ewên hay ji vê rewşê hene, berê vê guhertinê li gorî xwe rast kirine. Bi vî awayî berê civakê ketiye riya wan ‘aqilmendan. Îro civaka ku em tê de dijîn ketiye guhertinekê. Bes ev guhertin di rêke çawa de çêdibe. Bal bi xerabiyê ve an başiyê ve diçe? Bersiva vê pirsê em dikarin çawa bidin? Me heta îro di vê mijarê de çi tespît kiriye, li gorî tespîtên xwe me amedekarî kirine an na? Di vê pevajoyê de çi projeyên me hene? Heke hebin em van projeyên xwe dixin jiyanê an na?

Çimkî em jî divê civakê de dijîn. Heke em di ve guhertinê de nebine ji kesen aqilmend emê jî di nav de biherikin. Dema civak ber bi guhertinê ve diçe ji têkilahiyê re kêrhatî dibe. Di vî wextî de kî têkildar be, kî bi vê armancê tevbigere ji kesên bêhay bibexttir e. Civakê bi fikr û ramanên xwe dajo, jiyana civakê li gor nêrîna xweyî jiyanê ava dike. Dîrok bi van mînakan tije ye. Bi taybetî Pêxember tim û daîm di wextê guhertina civakan de hatina şandin. Gelek ji wan gelên pêxember ji wan re hatine şandin di kêlîka guhertina wan de Xweda pêxember ji wan re şandine da ku guhertina wan bibal qenciyê ve bajon. Di mijara guhertinê de Xweda di Qurana pîroz de wiha dibeje:

ذٰلِكَ بِاَنَّ اللّٰهَ لَمْ يَكُ مُغَيِّرًا نِعْمَةً اَنْعَمَهَا عَلٰى قَوْمٍ
حَتّٰى يُغَيِّرُوا مَا بِاَنْفُسِهِمْ وَاَنَّ اللّٰهَ سَمِيعٌ عَلِيمٌ

*“Evna (ev ‘ezab) bi sebeb gunehên wan bû, lewra heta qewmek xwe neguherîne Xweda nî’metê ku lê kiriye naguherîne… Û bêguman Xweda dibihîz e û bi her tiştî zana ye.”* (Enfal: 53)

Ev ayet, ji civaka ku guhertina wê bi bal xerabiyê ve diçe ye. Wexta civak bi bal xerabiyê ve çû û bi vî awayî guhert, Xweda nî’metê lê kiriye jê distîne. Dema nî’metên xwe jê sitend, civak ji rê derdikeve. Civaka ku ji riya rast derket, ‘ezabê Xweda heq dike. Qewmên helak buyî tev bi vî awayî ne. Ji riya rast derketine, ji qenciyê dûrketine û bi bal xerabiyê ve çûne. Qencî û riya rast bi xerabiyê guhertine. Dema guhertina wan qediya, ‘ezab jî li ser wan heq bû.

Dîsa di ayeteke din de Xweda wiha ferman dike:

اِنَّ اللّٰهَ لَا يُغَيِّرُ مَا بِقَوْمٍ حَتّٰى يُغَيِّرُوا مَا بِاَنْفُسِهِمْ



*"Bi rastî h̲eta civakek tiştê di xwe de neguherîne û xira neke, Xweda tiştê di wan de xiranake û naguherîne."* (Re'd: 11)

Têkiliya Xweda bi guhertina civakê ve giredayî ye. Eviya ji van ayetan tê fêm kirin. Ev ayet viya jî şanî me didin; dema em di wextê wê de têkiliyê bikin, em dikarin guhertina civakê bi bal qenciyê ve bibin. An jî wan bi bal riya rast ve bajon.

Ev çend heyvên bihûrî, di vê mijarê de ji me re bi mînakên xweşik tije ne. Jêr **"Bihara 'Ereban"** tê gotin. Gelê welatên Tûnis, Misir, Lîbya û Sûrî ketine nav guhertinekê. Civakên van dewletan jiyana h̲eta îro tê de bûn, êdî qebûl nekirin û xwestin vê biguherîn in. Wexta civakê xwest biguhere Xweda jî alîkarî bi wan re kir. Mudaxeleya Xweda ji van civakan re bû bi bal qenciyê ve. Çimkî van civaka guhertineke bi bal qenciyê ve dixwestin.

**Em werne ser civaka xwe. Li gor dîtina min civaka me jî îro di guhertinekê de ye.** Bîlxasse ev deh sal vir de ev guhertin tê xuya. Ji xwe nev guhertin hinekî mecburî ye jî. Çimkî îro dinya pir biçûk bûye. Tekiliyên gelan û civakan bi hev re pir zêde û hêsan bûye. Ev tekilî jî bi awayekî bandorê dike. Jiyana gelan û civakan bandorê li hev dikin. Him ji alî çandê, him ji alî aborî û him jî ji alî siyasî ve... Jiyana gela tê guhertin. Ev guhertin di her alî de tê xuya. Ji jiyana nav mala bigrin h̲eta jiyana civakê. Tiştê te dîtiye, xilasî ji vê guhertinê nîne. Îca madem xilasî ji vê guhertinê nîn e, divê em çi bikin? Em dikarin bi çi awayî ev guhertina ku pêk tê karin bikine riya rast. Nehêlin bi bal xerabiyê ve here? Lewra tiştê tê dîtin, guhertina ku pêk tê bi tevayî ne bi bal qenciyê ve ye. Bi bal xerabiyê ve jî diçe. Dema meriv li tebeqê civakê dimeyzêne, bîlxasse nesla nû, di jiyanê de roj bi roj bi ser jiyaneke Ewrûpayî ve diçe. 'Edet û kevneşopî û çanda di nav gelê me de têne jibîr kirin, ji berdêla wê de yên Ewrûpa têne girtin. Evêna jî xetereke mezin e.

Çendekî din bi tevayî heye ku jiyana Filleh û Cihûyan yanî çand û 'edet û kevneşopê wan bikevine jiyanê de. Jiyanê h̲emî bi dest bixin. Helbet menzere bi temamî ne xerab e. Ev guhertin bi aliyê qenciyê ve jî pêk tê. Ew alî jî diherike. Îca tiştê li me dikeve ew e ku em astengiyan deynîne ber guhertina bi bal xerabiyê ve û piştgiriyê bidine guhertina bi bal qenciyê ve. Divê em ji herdû aliya ve jî bixebitin. Ku em giraniyê bidine aliyekî û aliyê din jibîr bikin ewê karê me nîvco bimîne, ji ber vê divê em ji herdû aliya ve jî wek hev bixebitin. Em dikarin çi bikin, rêke çawa bişopînin, divê em bernameya wê çekin û berî dereng bikeve têxine jiyanê de… Bimînin di xêr û xweşiyê de.

# Şahê Qesra Dilê Min

✍ **Navşêr Xalidî**

*Rohniya çava ye rohniya çava ye*
*Nûr-ul Huda ye nûr-ul Huda ye*
*Av û hewa ye av û hewa ye*
*Hîv simaê wî tavê jê daye*

*Şerîfê eşrefa Ah̲medê sema ye*
*Bijaryê bijarya muxtarê rih̲a ye*
*Serdarê Qasida Yasîn û Taha ye*
*Şahê qesra dilê min e Mustefa ye*

*Çile barî bi ser can û bedena*
*Aşît rabû wan bir avêt bedena*
*Asê kir û hişt li dirî û kelema*
*Şahê qesra dilê min buhara sala ye*

*Cemed h̲emêz kirye mêjî û dila*
*Bû kevir ûjdan qeşaê lê da*
*Şembelîlka girt sivêrnekê aqila*
*Şahê qesra dilê min Xurşîdê şemsa ye*

*Bê ronayî ma ezmanê beşeran*
*Li viyalî-l wiyalî-l dor xwe-d din doran*
*Herkes hunda bûye di rê û toran*
*Şahê qesra dilê min mehtaba şeva ye*


*Du daye ser qelba tev kirye tenî*
*Şevên gunehan lê kirye tarî*
*Cejna şevşevokay çav çava nabînî*
*Şahê qesra dilê min çira û lemba ye*

*Bizrê însan avêt hişk bû di axê da*
*Ne baran barî û ne rewa lê da*
*Hineka zil da lê çilmisîn di cî da*
*Şahê qesra dilê min nîşana dila ye*

*Tav filitye-j ciyê xwe ketye sersera*
*Tazîye gêjbûye can di xweydanê da*
*Dirana-d qirçîne doj weke ejderha*
*Şahê qesra dilê min şefî'ê h̲eşra ye*

*Ava kewserê ye şîrşerbeta wî*
*Herçî evîndarin mêhvanin li wî*
*Ê qurtekê vexwe hew divê têni*
*Şahê qesra dilê min mifta beheşta ye*

*Xalidî rûreş e û dest vala ye*
*Zeviyak para wî bû hişk û hela ye*
*Ji eşqa te pêva tune serma ye*
*Şahê qesra dilê min yarê aşiqa ye*





# Çend Gotin Li Ser Wêjeya Gelêrî (Anonîm)

✍ Tahir Başaran

Wêjeya (Edebiyat) gelêrî ango **destan, çîrok, pêkenok, lorîk, tiştonek (mamik), metelok, biwêj, gotinên pêşiyan** û hwd. Bi baweriya min, di wêjeyê de cihe wêjeya gelêrî taybet û girîng e. Li ser vê girîngiye mirov dikare gelek sedeman bi rêz bike, lê ez dibêm qey ezê dikaribim bi kurtasî vê mijarê bidim fêm kirin.

Weke ku tê zanîn, dîroka xebatên li ser çanda Kurdî, ne kevnar e. Hetanî çend sal berê jî, ji ğeynî(bilî) xebatên çend ciwamêran tiştekî zêde di destê me de tunebû. Heke ez bibêjim, gelek tişt ji çanda me ji ber ku wext de nehate nivîsîn winda bûn, tu kes nabêje derew e. Lê tiştê ku ez pê dêşim ev e ku **mixabin pêvajoya winda buyinê dewam dike**, ango roj bi roj hinek tişt winda dibin. Di encama windabûyinê de xisara herî mezin ziman dibîne (Piştî Xweda ali karbe, ezê vê mijarê di nivîseke din de bi dûr û dirêjî vebêjim, loma kûr û dirêj e).

Li hember vê mijara dijwar divê mirov tiştnan bike. Ne ku win (hûn) bibêjin: **"Ma ez feqîrê Xweda dikarim çi bikim?"** yan jî **"Qey pirsgirêkên me ji vê pê ve nemane?"** û hwd. Erê pirsgirêkên me gelek in lê ev jî ne pirsgirêkeke biçûk e. Divê hemû kes ji bo nivîsandina çanda devkî bixebite. Ji xwe ji bo vê yekê karekî serbixwe ne hewce ye. Di jiyana xwe ya rojane de win dikarin vê peywira xwe bi cih bînin. Mesela li civatekê heke qala pêkenokekê, çîrokekê, metelokekê bibe yan jî di axaftinekê (şitexalî, peyivîn, xeberdan) de gotineke pêşiyan, biwêjek derbas bibe win dikarin wan binivîsînin. Ev ne tiştekî zehmet e, ne guneh e, ne kaçax e.

Yek fikra ğelet a din jî ev e ku win bibêjin: **"Hey hinekan ev tişt nivîsandine, ezê çi beradayî pê ve mijûl bibim"**. Ev fikreke ğelet e lewra hinek tişt deverî ne, ango tenê li cihnan hene. Dibe ku gotineke pêşiyan tenê li gundê we, li dora bajarê we hebe. Heke ew ji hêla we ve neyên nivîsîn û bikaranîn wê (dê) winda bibe. Li vir divê ez vê jî bipirsim, gelo çîrokek tenê çîrok e? Na, **çîrok di heman demê de dîrok e.** Carnan mirov dikare ji çîrokekê gelek tiştan hîn bibe: **ziman, bawerî, têkoşîn, debar, nerîna li xwezayê, têkilî** û hwd. Ji gelek aliyan ve rewşa gel dide zanîn. Ev yek ji bo fêmkirina dema borî pêwist e û gelekî hêja ye.

Belkî win bibêjin: **"Çima ne wêjeya klasîk yan jî wêjeya hemdem çima wêjeya gelêrî?"** Wêjeya klasîk (ji ğeynî berhemen windayî) û ya hemdem derbasî nivîsê bûye û hemû kes dikare bigihîje wan. Mesela piştî sed salî din jî win dikarin ***Mem û Zîn***a Ahmedê Xanî, ***Dîwan***a Melayê Cizîrî binirxînin, lê wêjeya nenivîsî ne wisa ye. Binêrin di ***Dîroka Wêjeya Kurdî*** de **Feqî Huseyn Sağniç**, ji bo helbestên Elî Herîrî yen windayî çi dibêje: *"Ji aliye gelek kes û ansîklopediyan ve dabaşa diwana 'Elî Herîrî têkirin. Lê mixabin heta îro bi dest me neketiye. Berî panzdeh salî ya temena min ku nû diçûm medreseyê, li wir dengbêjek hebû; gelek helbestên Herîrî jiber dizanibû û di civatan de bi wî dengê xwe ye xweş, bi sitranî ji me ra dixwend. Wê gavê min hêj bi nivîsandinê nizanîbû ku wan helbestên hêja binvîsim û êdî careke din kesekî wiha bi destê min neket. Em hêvî û tika dikin ku her kes li herêma xwe li helbestên wî camêrî bigere."*

Heke wê demê ew helbest ji devê wî dengbêjî bihata nivîsîn, wê îro çend helbestên Elî Herîrî yên din jî bi dest ketibûna. Lê mixabin çiqas vebêjim jî, divê bi mirov re **hişmendiya parastina çandê** hebe; heke qîmeta van gotinan li bal we tune be, weke ku helbestvan jî gotiye: *"Çiqas pesnên giran bêjim, nikarim bi te bidim zanîn."*



# Gul û Reyhan Li Min Peyda

Feqiyê Teyran

*Ji rengê dîlbera horî*
*Gul û reyhan li min peyda*
*Zerîfa şeng niha borî*
*Şeveq dabû di rewzê da*

*Şeveq da erd û esmanî*
*Li min dîlber tu astan î*
*Dixwim sondê tu Subhanî*
*Zuleyxa bû di Misrê da*

*Tu çêtirî-j Zuleyxayê*
*Neh in wek te di dinyayê*
*Dixwim sondê bi Taha yê*
*Munewwer bû di nûrê da*

*Munewwer bû di nav nûrê*
*Kemer dabû li ser sûrê*
*Ji rengê dîlbera horê*
*Dilê min tîrekê lê da*

*Li min da tîrekî dijwar*
*Serê tîrê di dil çû xwar*
*Dema ku ez dikim hewar*
*Wekî Mecnûn di deştê da*

*Wekî mecnûn dimînim ez*
*Fena bilbil dixwînim ez*
*Heta kengê bimînim ez*
*Di hebs û hem zîndanê da*

*Di hebs û hem di zîndanê*
*Wekî Yûsif li Ken'anê*
*Gelo ya Reb dîlber kanê?*
*Neçar mame di vê rê da*

*Dikim hawar dewa lê kî*
*Ku bê carek derman lê kî*
*Welê bejnê tu zahîr kî*
*Bibînim ez di cîlwê da*

*Bibînim bejn û balayê*
*Zerîfa şeng û lalayê*
*Nehin wek te di dinyayê*
*Di Tebrîz û di Şamê de*

*Şukur j-bo te ewî çêkir*
*Çiya anî li deştê kir*
*Dema ku min nezer lê kir*
*Meşî ew çû di xelwê da*



# Xwendina Bi Navê Xweda

✍ Hêvîdar Se’îd

اِقْرَأْ بِاسْمِ رَبِّكَ الَّذِى خَلَقَ * خَلَقَ الْاِنْسَانَ مِنْ عَلَقٍ* اِقْرَأْ وَرَبُّكَ الْاَكْرَمُ * اَلَّذِى عَلَّمَ بِالْقَلَمِ

*“Bixweyne! Bi navê Rebbê ku te xuliqandîye. Ew Rebbê te yê ku însan ji kesekê xwînê çêkirîye. Bi xweyne, Rebbê te xwedî keremeka bêdawî ye. Ewî nivîsandina bi qelemê hînkirîye însana…”* (‘Eleq:1-4)

Bê jimar hemd û şikur ji Rebbê ‘Aleman re be. Silavên bê jimar li ser pêşîvanê me Hz. Muhammed ‘Eleyhî-s Selatu We-s Selam be. Û silav li ser eshabê wî û li ser wan kesên ku di rêya wan de dimeşin be.

**Gelî xwendevanên E’zîz!** Di nivîsa me ya çuyî da me behsa xwendina kîtaba kaînatê kiribû. Di vê nivîsa xwe de jî emê hinek behsa emrê Xweda, emrê Wî yê ‘ewwîl ku “Xwendîn” bû bikin. Ji we ve jî ‘eyan e; Xweda ‘ezze we celle wexta ku Hz. Muhammed ‘Eleyhî-s Selatu We-s Selam bi nebîtî şand, li şikefta Hîrayê wiha jê re fermankir: *“Bi xweyne! Bi navê Rebbê ku tu xuliqandîye…”*

Emrê Xweda, emrê ‘ewil ji Hz. Muhammed ‘Eleyhî-s Selatu We-s Selam re ev bû. Lê belê em tev dizanin ku Hz. Muhammed ‘Eleyhî-s Selatu We-s Selam însanek ummî (nexwenda) bû. Xweda jî vî halê Hz. Muhammed ‘Eleyhî-s Selatu We-s Selam dizanibû û di ser vî awayî de jî emrê wî bi xwendinê dikir.

**“Gelo ev xwendin çi xwendin bû?”** Emê jî behsa hîkmeta vê xwendinê bikin: Di her tişt û bûyerên kaînatê de ji bo dilek şareza gelek hîkmet û ders hene. Di ‘ebdîtiyê de jî mijara ‘esil li gor vê ayeta: *“Bi navê Rebbê ku tu xuluqandîye bixweyne!”* qabîliyeta xwendinê bidest dixe. Esas hîndekarî ev e. Û di her tiştî de hêjahî û mezîyeta xwendina hîkmetên Xweda ğayeke xulqiyetê ye…

Wekî kîtaba pîroz Qurana Kerîm kaînat jî bi çavê dil ji bo ku were xwendin, mu’cîzeke daxuyaniya Xweda ye û pêşkêşî kiriye ji beşeriyetê re. Her zerrekî wê ji bo hîkmet û heqîqetê wek zerfekî ye. Wezîfa muminekî kamil û şareza vê zerfê veke û sirr û hîkmet û hinariyên di nav de bixweyne û pê serwext bibe.

Qurana Pîroz di gelek ayetên xwe de me de'wetî xwendina van hîkmetê ku di hundirê van zerfa de ne dike.

إِنَّ فِي السَّمٰوَاتِ وَالْأَرْضِ لَاٰيَاتٍ لِلْمُؤْمِنِينَ* وَفِي خَلْقِكُمْ وَمَا يَبُثُّ مِنْ دَابَّةٍ اٰيَاتٌ لِقَوْمٍ يُوقِنُونَ* وَاخْتِلَافِ الَّيْلِ وَالنَّهَارِ وَمَا اَنْزَلَ اللّٰهُ مِنَ السَّمَاءِ مِنْ رِزْقٍ فَاَحْيَا بِهِ الْاَرْضَ بَعْدَ مَوْتِهَا وَتَصْرِيفِ الرِّيَاحِ اٰيَاتٌ لِقَوْمٍ يَعْقِلُونَ

*"Bê guman ji bo însanên mumîn re di 'erd û asîmanan de gelek ayet hene. Ji bo kesên qet'î îman anîne di xulqiyeta we de û di belavkirina heywana li ser ruyê 'erdê de gelek 'îbret hene. Di veguherîna şev û rojê de û ew rizqê (baran) ku Xweda ji asîman dişîne ji me ra di wî rizqî de û piştî mirina 'erdê ku 'erd pê tê vejandin di wî de û di wan bayê cudayî aliyan de ku tê wezandin di van teva de ji bo civaka ku 'eqlê xwe dişuğulîne gelek ders û 'îbret hene…"* (Casîye:3-5)"

Wekî vê ayeta Qurana Pîroz di gelek ayetan de Rebbê 'Ezîz baldariya me dikişîne ser mexlûqata; *"Ma wana qet li deveyê mêze nakin?"*

Di ciyekî din de bal dikişîne ser bûyerên coğrafî: *"Wana li 'ewra, li baranê, li çîyaya û li wan nebatê ku zivistanê dimirin di biharê de jî têne vejandin nameyzînin?"*

Di ciyek din de jî baldikşîne ser dîrokê; *"Li 'aqîbeta wan qewmê çûyî nameyzînin?"*

**Gelî xwendevanên 'Ezîz!** Muxatabê van ayetan û tevekî ayetan, însanê xwendekar û ne xwendekar tev in. Yanî Xweda (c.c) însan muxatab qebul kiriye. Him vê kaînatê û tevî zêrzewatê wê, him jî tevekî kitêb û sehîfê muqeddes ji bo însan şandiye. Însan him ji bo xwe nasbike him jî ê ku van nî'met û qenciya lê kiriye nasbike…

Naskirina Wî (c.c) ji hineka re bi xwendina 'îlmê ye, ji hineka re jî bi xwendina sen'atê Wî (c.c) a kaînatê ye. Ji xwe xwendin ew e ku bi çavê qelb, bi fêm û îdraq bê xwendin…

Bi sedem vî awayî di nivîsa me yê çûyî de me behsa du însana kiribû. Yek jê, qaşo xwendekar bû, lê xwendina wî, ji feydê bêtir zerar dabûyê. Bi te'bîra Quranê wek kerê bar kitêb bû… Ewqas bê fêm û bê îdraq bû ne di kitêbê ku xwendibu, ne jî di kitêba kaînatê de Rebbê xwe nasnekiribu, berevajî wî Rebbê xwe înkar dikir…

Ew kesê din kitêb nexwendibû, lê belê kitêba kaînatê xwendibû… Çiqas li sen'etê vê kaînatê mêze dikir ewsafê Rebbê xwe didît û îmana wî zêde dibû…

Piştî vê daxuyaniyê emê bersiva vê suala: *"Gelo ev xwendin çi xwendin bû?"* bidin:

Hz. Muhammed 'Eleyhî-s Selatu We-s Selam çiqas jî nexwendabû lê belê çavê qelbê Wî 'Eleyhî-s Selatu We-s Selam vekirîbû, îdraq û fêma Wî 'Eleyhî-s Selatu We-s Selam tam bû… Li ku dera kaînatê mêze dikir, li kîjan sen'etê wê dimêzand, tecellîyatê Rebbê xwe didîtin û di pey de hemd û şukrê Rebbê xwe dikir. Wî 'Eleyhî-s Selatu We-s Selam dizanibû ev tiştê hûr û girê di vê kaînatê de tev ayet û nîşanê meznatiya Rebbê 'alemê ye. Ji zerre bigre hetanî kurre tev sen'etê hostayekî ye û di wan de gelek sirr û hinarî hene. Ew ne xwendevan bu lê belê Hz. Muhammed 'Eleyhî-s Selatu We-s Selam wan sirr û hinariyên di wan zerre û wan kurreya de dixwend û mutale'e dikir…

Jixwe ayeta Quranê ayeta 'ewîl bala me dikişîne bi ser xwendina bi navê Xweda û xulqiyeta însana. Van ayeta bi nepenî divê ê ku serpêhatiya xulqiyetê bixweyne û nasbike ew Rebbê 'alemê nasdike… Ji ber vê gelek 'alimê Îslamê di vê mijarê de wiha gotine; *" Ê ku xwe nas bike Rebbê xwe nas dike."* Yek ji van 'alima Ustad Bedî'uzzaman wiha dibê; *"… Heger ev kaînat biçuk bibe dê bibe wek însanekî, yan jî heger însan mezin bibe dê bibe wek kaînatê."*

Yanî çawa meriv kare ji bo dendika hêjîrê bêje di hundirê vê dendikê de dara hêjîre heye; 'eynen wisa ji bo însan jî meriv kare bêje kaînata mezin e. Di vê mijarê de zehf gotin hene. Teferru'ata wê emê bihêlin nivîseke din. Di dawiya nivîsa xwe de em bi kurtî wiha dibên: "Heger şewl û tav tune be çawa çav tu tiştekî wê nebîne, 'eynî wisa nûra îmanê û ruhaniyeta Quran û Sunnetê di qelbekî de tune be, ew çavê qelb wê tu heqîqetekî nebîne. Nûra îmanê a di qelb de bi tefekkurê dibiriqe û şu'le dide… Ew kesê ku li dunyayê mêze bike û 'îbret nestîne, bi wê nîsbetê di çavê qelbê wî kesî da korbûn çêdibe…

Xweda qelbek hişyar û 'emel kî bi îxlas nesîbê me bike (Amîn). Bimînin di xêr û xweşiyê de…

# Ji Bo Şexsiyetek Îslamî Ruknên Bingehîn

✍ Yasîn Demîr

*"Ger ku mirin muminan - Xweda biparêze - bê amade û di halekî xirab de bigre, wê ji wan re bibe musîbeteke herî dawî"* **(Eba 'Ebdullah)**

Kesayeteke Îslamî, ji bo heyata dunyayê û xelasiya axretê şertê herî pêşî ye. Bi gotineke gelemperî, em dikarin bêjin ku şeş ruknê kesayeteke (şexsiyeta) Îslamî hene.

1- Îmana Kamil (Îmana heqîqî, bê teqlîd û bê bizarî)
2- 'Ilmê bi kêr û bi xêr ( 'ilmê bê feyde, bi kêr nayê)
3- Niyeta Xalis ( 'Emel, bi niyeta xalis dighîjine mebesta xwe)
4- Teqwa (Tirsa ji Xweda, serê hemî xêra ne.)
5- Exlaqê Baş (Exlaqê Îslamî) (Ev rêz girîng e)

Lê belê nîvek 'Alimê Îslamê (Xweda ji wan razî be) wek Îmamê Şafi'î (Rehmeta Xweda Lê Be) "Sûretê 'Esr" ji xwe re bingeh digrin. Ji bo kesayetek Îslamî û xelasiya axretê çar merca (şerta) dijmêrin. Weke di sûreta de derbasdibe "îman", "'Emelê Salih", "Şîretkirina Heqî" û "Sebrê"

وَالْعَصْرِ* اِنَّ الْاِنْسَانَ لَفِى خُسْرٍ* اِلَّا الَّذِينَ اٰمَنُوا
وَعَمِلُوا الصَّالِحَاتِ وَتَوَاصَوْا بِالْحَقِّ وَتَوَاصَوْا بِالصَّبْرِ

*"Bi 'Esrê sond be! Bi rastî însan di ziyanê de ne. Ji bil kesên ku îman anîne, 'emelê salih kirine, heqî û sebrê şîret kirine. (evana ji ziyanê xelas in)"*

Dîsa nîvek 'alimê din jî Sûreta Maîde, ayeta 35an ji xwe re bingeh girtine. Lewra di wir de 'îbara: *"Da ku hûn karibin bighîjine xelasiyê"* 'esil digrin û ji bo xelasiya axretê, ew jî çar merca dijmêrin. Aeyt wiha ye:

يَا اَيُّهَا الَّذِينَ اٰمَنُوا اتَّقُوا اللّٰهَ وَابْتَغُوا اِلَيْهِ الْوَسِيلَةَ
وَجَاهِدُوا فِى سَبِيلِهِ لَعَلَّكُمْ تُفْلِحُونَ

*"Geli wan kesên ku* ***îman*** *anîne! Ji Xweda bitirsin* ***(Teqwa)****, ji bo ragihaştina bal Xweda ve* ***wesîle*** *(rê û sedema) bigerin û di riya wî de* ***Cihad****ê bikin. Da ku hûn bikaribin bighîjine xelasiyê."*

Her çar mercên van 'aliman jî, "Îman", "Teqwa", "Ji bo rûsipî bighîjine Xweda Te'ala lêgerandina wesîla" (Ev wesîle jî Sunneta Resûlûllah e (Selat û Silavên Allah Lê Bin) û "Cîhad" e.

Di vê mijarê de tespîta herî balkêş û girîng ya Ustad Bedî'uzzeman e. Ew jî çar rukna dijmêre. "Îman", "Îslam", "'Emelê Salih" û "Teqwa"…Ustad, bikaranin û pêkanîna van mercayê heqîqî **"… Çûyina cennetê yê bê ceza"** qebûl dike… (!) Bi rastî jî musulmanek li gorî qeweta xwe heqe van çar rukna bide ev tespît rast e…





Kelhaamed

Li gorî ramanek din jî, “Sidq” û “’Edalet” esasê kesayeta Îslamî û şexsiyeta musulmana ye. Sidq, yanî durustbûn.

Wexta ku ji bo şexsiyetek Îslamî, me şeş rukn tespîtkirin ev nêrin û raman temam me li pêş çava girtin û bikaranîn.

Di vê tespîtê de xisûseke girîngtir û pêşdar heye. Lê bûn û çêbûna kesayetek Îslamî, bê wan hikm û prensîbê ku Resûlûllah ‘Eleyhîsselam ji bo însaniyetê aniye û sîstema Îslamê pê saz û avakiriye nebe, nabe… Ne mumkun e… ‘Alimê Îslamê, ev hukmê ku Resûlûllah ‘Eleyhîsselam anîne, ew jî kirine çar beşa. Mesela di vê mijarê de tesnîfa ‘Umer Nasûhî Bîlmen wiha ye. “(Evana qismê dînê Îslamê ne jî)

1- Hukmên di derbarê baweriyê de. (Hukmên Îtîqadî)
2- Hukmên di derbarê ‘emel, ta’et û sipartinê de (Hukmên ‘Îbadatê)
3- Hukmên di derbarê helal, heram, mubah û mekrûha de
4- Hukmên di derbarê exlaq û edeban de.

Evan her çar beşan, di kifşkirina ruknê kesayeta Îslamî de me esas girtin. Lewra bi baldarî lê we re nihêrtin, van hukman û ruknên ku hatine jimartin, wek sedem û encamên hev in. Ya rastî, van hukman ku pêk werin, werin bikaranîn, xwe di kesayetê de didine nîşandan.

Wehya Îlahî, bi vî awayî dizîvire kirna beşerî û dibe kesayeta (şexsiyeta) kesê musulman. Û dibe xelasî û rizgariya ji ‘ezabê axretê, xelat û mizgîniya cennetê.


Bi kurtasî û xasî, ev hukm û destûrên Îslamê, di çêbûn û gihîştina nêrîn, dîtin, raman, tevger û halê kesê musulman de cî girtibe, ji şexsiyeta wî re bûbe bingeh, ji bo wî kesî em dikarin behsa kesayeta Îslamî bikin.

Ev mercê ku hatine jimartin, di têkiliya kesekî de, derheqê ‘alema wî ya der û hundir de zêdetir muhîm û diyarkerin.

Berêxwedan û xwe sipartina bi bal Rebbê xwe ve, di mi’amela bi însanan re, di nirxandina bûyer û bûyînan de, di nêrîna hemû eşyayan de û tekûzbûna kesayeta Îslamî de bingehin.

Ji bo razîbûna Xweda ‘Ezze We Celle, ji bo rizgarî û bextewariya axretê, ji bo serfirazî û serkeftina dinyayê, van mercan pêşane ne. Cihê mirovekî, him li dinyayê, him jî li axretê bi van ruknan kifş dibe…

Bi du’a kesayetek Îslamî… Bimînin hêvya Xweda…



# Dema Guh Ronî Bibe

**Dema perdeya guh, bi nûra îmanê ronî bibe**, gaziyên me’newî yên ji kaînatê tên seh dike. Zikr û tesbîhatên ku bi zimanê hal tên kirin, fêm dike. Heta bi xêra wê nûra îmanê, nihurîna baya, giregirên ‘ewra, newa û melodiyên pêlên behra û her wiha kelamên Rebbanî û tesbîhatên bilind yên ji her cûreyê baran û çûk û hwd dibihîze.

**Tu dibê qey kaînat, daîreyek mûsîkiya îlahî ye.** Bi cûrbicûr dengan, bi çeşîd çeşîd nihurînan, qelban bi huzn û eşqên Rebbanî pê dihesîne û qelb û rûha dibe ‘alemên nûranî. Bi nîşandana menzerên pir ğerîb, wan qelb û rûhan noqî nav lezzet û zewqa dike.

**Lê dema perda wî guhî bi kufrê bixetime**, ji wan sewtên lezîz, me’newî û bilind mehrûm dimîne û wan dengên lezzetê didin diqulibe dengên matemê. Di qelb de ji dêlava wan huznên bilind, bi çûna dostan sêwîtiyên ebedî, ji bêxwedîtiyê tenêbûniyên bêdawî û ğurbetên daîmî çêdibin.

**(Ji Îşaraul Î’caz)**

# Zilm û Zordarî Dom Dike

✍ **Muhammedê Hecî'ezem**



Bê dem ji cimhûriyetê û vir ve zilm li bawermenda dibe û ev zilm dom dike. Xasseten herêma Kurdistanê qat bi qar ji vê zilmê nesîbê xwe distîne. Kuştin, girtin, koçberî, mehkûmiyet, qedexekirina şerpê, girtina komela hwd… Dibe ku hinek bawermend 'ecêbmayî bimînin jî lê ev tev rast in. Hem jî di hikûmeta niha de jî dom dikin. Û siyaseta hikumeta niha jî ji rojhilat û rojava re cuda ye. Ji rojava re xweşbînî, ji rojhilat re zordestî ye. Demeke ku rojhilat bê wî wextî potansiyel terorîst e. Mînaka herî eşkere, li rojhilat girtina komelan û komkujiyên li hember Kurda ye, wek **tevkujiya Roboskî**, heger komkujiya Roboskî li rojava pêkbihêta wê bertekê hikûmetê wisa bûna? Qet'iyyen wê ne wisa bûna. 34 însan qetilkirin lêborîna xwe nexwestin. Ji aliyê din, li 'Entabê ji bo şerpê zilma tê kirin, li cihne din bûna wê bertekê hikûmetê qet'iyyen ne wisa bûna. Çima ji ber ku ji me Kurdan kes deng nake? Cudatiya zimanê me, çanda me, hunera me, ku ne li gor we bê ev ne nijadperestî ye, ev ne terorîstî ye, em ne mecbûrin ku çanda we, hunera we, di heyata xwe bijîn. Digel va teva jî em

wek hineka çav girtî li meselê nameyzînin. Tiştê baş ku têne kirin, em pîroz dikin. Lê belê mesela şerpê nayê texîrkirin. Salê derbasdibin, ji bo xwişkê me bi paş ve navegerin.

Em dinêrin qet deng ji kesî nayê bê dengiyekî ku qet ne mimkune ku mirov jê re îzahetek bibîne derdikeve holê. Ne hikûmet, ne jî çapemenî qet kes deng nake. Ji xwe em zanin çapemenî neyar e, ji xwe qenciya musulmana naxwezin. Lewra ew ji dîroka Îslamê ve heta neha neyartiya Îslamê dikin. Pir balkêş e di dewra se'adetê de jî, ê di hukmê çapemeniyê de bûn di derheqê Resûlê Xweda de pir ziman dirêj dikirin û Resûlê Xweda pir diêşandin. Heta wîqasî Resûlê Xweda êşandibûn, di fetha Mekkehê de digel ku Resûlê Xweda herkes 'efû kir jî, ev kes 'efû nekirin û wiha di heqqê wan de biryar da. "Ku ew bikevine bin astarê Ke'bê de jî wan bikujin." Ji bo vê yekê em bê dengiya çapemeniyê fêm dikin. Lê îdarevanên niha! Hûn çiman bê dengin. Ev çend sal in ji bo ku xwişkê me nixumandîne her roj rastî astengiyan tên. Ji vê dibistanê sirgunî dibistaneke dî dibin. Xwişkê me bi meha li ber ba û sermayê, li ber baranê li devê deriyê dibistana dimînin, dayikê wan rastî gef û te'cîzên polîsa tên, ji bo ku astengê li pêşiya zarokê wan rabin, bi te'bîra we dema ku heqê xwe yê demokratîk pêktînin waliyetê emir didin, polîs tê wan binçav dikin. Bi sa'eta wan davêjin nezaretê û dawiyê wan dibine dadgehê. Ev e mafê mirovatiyê? Ev e însaniyetî? Ka qaşo hûn xizmetkarê millet bûn.

**Ey îdarevanên îddî'aya 'edaletê dikin!** Banga me li we ye, heger hûn dengê va xwişkê me nekin jî em baş bawerin ku wa dengê xwe, weke Huweyle Bintî Se'lebê li ser her heft 'erşa gihandine Xweda. Hûn dengê wan nekin jî Rebbê 'Alemê dengê wan dike, hûn heqê wan nedin wan jî Rebbê 'Alemê wê heqê wan bi wan de. Lê belê wê hesabê wê bê dengiyê ji we bê pirskirin.

Ev çend sal in roj tune ye ku ji bo şerpê çalakî lidar neyên xistin. Ji nêzîk de jimara wan sed hezarî bêhtir însan li hev civiyan û ji bo şerpê mitîng kirin. Herkesî deng kir lê we dengê wan nekir. Lê belê em gelek car a bû ne şahid ku însanê xwîna wan pênc pere nakin bi gotinekê hûn dengê wan dikin. Ji bo ku hûn dengê xwişkê me bikin gerek etekê qût li wan bin, gerek navê wan rojîn bin.

**Ey îdarevan!** Tu dîroka Îslamê baş dizanî. "Ummu Mektûm tê hizûra Resûlê Xweda, di wê demê de serek û pêşîvanê muşrîka jî li hizûra Resûlê Xweda ne. Resûlê Xweda ji bo ku qelbê muşrîka bal bi Îslamê ve qezenc bike di nav hewldanê de bû. Difikirî ku qelbê wan qezenc bike wê astengê li hember doza wî rabin û bi vê niyetê Ummu Mektûm îhmalkir. Di dawiya wê meselê de ji teref Xweda ve bi tund hate îqazkirin.

Em zanin ku Resûlê Xweda ji bo ku astengê li hember de'wa xwe ji holê rake hewl dide û Ummû Mektûm îhmalkir. Hebe nebe tu jî ji bo ku dilê laîka qezenc bikî tu xwişkê me îhmal dikîö Lê jibîr nekin hûnê jî dê bi tundîtî bêne îqaz kirin. Ama kengî ez nizanim.

**Ey Xwişkê minî biçûkî rindik û bi qîmet!** Ez tekoşîna we ji dil û can pîroz dikim. Qet xemgîn nebin, bê hêvî nebin, Xweda bi we re ye têkoşîna we ne têkoşîneke biçûk e; hûn destana dinivîsînin.


Çawa ku Hazretî Meryem ji wextê biçûk bû ji bo emrê Rebbê xwe bi cih bîne temamê tengasî û meşaqeta dan ber çavê xwe û çû me'bedê, hûn jî ji bo ku emrê Rebbê xwe bicihbînin tengasî û zordestî didine ber çavê xwe.

Ha ğeyret xwişkê minên delal. Ez bawerim ku hûn ji baweriya xwe te'wîzê nadin. Ji bo ku me ji baweriya xwe te'wîz nedaye, îro em girtîn, em şehîd bû û em bûn muhacir. Divê baş were zanîn ku çawa heta îro ev xelq li baweriya xwe xwedî derketiye ji niha û pê ve jî wê li baweriya xwe xwedî derkeve. Heta nefesa dawî jî wê tucar li hember zalim û zordesta serî netewîne.

Di dîroka Îslamê de mînakê bi wî rengî pirin ev cara yekem e ku em rastî zilm û zordariyê tên. Ev ne zilma we yî yekemîn e û ne jî dê ya dawî be. Di dîroka Îslamê de însanê bawermend tu carî li hember zordesta paş ve gav neavêtiye û wê navêjin jî.

**Ey xwişkê me yên bi qîmet!** Eman ha hûn bêhêvî nebin. Xweda bi were ye. Kesê Xweda bi wan re be her tim wê serfîrazbin. Ez we pîroz dikim û serkeftinê ji we re dixwazim.

Salvegera wîladeta roniya çavê me Muhammed (Selat û Silavên Allah Lê Bin) pîroz û mubarek be. Emanetê Xweda bin, bimînin di xêr û xweşiyê de.



# Dewra Şêx Ubeydullahê Nehrî

Faysal YAMAN

Di dîrokê de di pay tesfîyekirina **Mîrên Botan** Mîr Bedîrxan, **Mîrê Soran**, **Mîrê Baban** û **Mîrê Hekkarîyan** jî ji holê hat rakirin. Pey wan re kesê li Kurdan mezintî û rehbertî bikê nemabûn. Di vê dewrê de sîyaset û polîtîka Kurdan û meznatî û seroktîya wan ketibu sitwê ‘alim û Şêxên Kurdîstanê.

**Şêx Seyyîd Taha yê Hekarî** ko bavê Şêx Ubeydullehê Nehrî ye, peşîyê van ‘alim û şêxan e. Şêx Seyyîd Taha, ‘alimekî navdar û rehberê terîqê ye. Lî gor rîwayetan, neseba wî ji Şêx Ebdulqadîrê Geylanî tê. Weke ko bi nav jî tê nasîn, nêvîyê Pêxember e. Salat û selam li ser be. Bav û kalê wî di nav Kurdan de xwedî gotin û şohreteke efsanewî ne. Li ser milletê Kurd xwedî fikr û nêrînin.

Şêx Seyyîd Taha, bi Mîr Bedîrxan re hevaltî kir û di nav Kurdan de gelek xebat pêk anîn. Pey surguna Mîr Bedîrxan, Seyyîd Taha berê xwe da herema Nehrê û kete bin hîmaya **Mîrê Şemdînan Mîr Musa Beg.** Mîr Musa Beg hêja neketibu bin hakimtiya Osmanîyan.

Di nav ‘îsyanên qernê 19an de yek ji wan kesê bi nav û deng û bi qedr Şêx ‘Ubeydullah ê Nehrî ye. Li hêla Hekarîyê hatiye dinyayê. Tarîxa wî yî hatina dinyayê, di derdora salên 1820î de ye. **Seyyîd**

**Tahayê Şemdînî** ko xelîfê **Mewlana Xalidê Kurdî yê Şehrezorî** ye.

Jî ber ko malbata Şêx 'Ubeydullahê Nehrî, ji berê ve ehlê 'ilm û terîqetê bûne, zarokatîya wî jî, di nav 'alîm û murşîdan de derbas bûye. Bi orf û edebên ehlê 'ilmê û di nav medresên Kurdan de mezin bûye. Şexsîyeta wî di nav 'alîm û zanayên malmezinan de kemilîye.

Şêx 'Ubeydullah, pêşî lî cem bavê xwe, peyre li cem Apê xwe Seyyîd Ebdullah xwendîye. Seyyîd 'Ebdulah di 'ilmê dînî û hêla tesewwufê de bi nav û deng e. 'Ubeydullahê Nehrî, piştî ders, ked û sohbetên dûvdirêj, gihîştiye kemalê. Bi zanîn û şehrezayiya xwe ji bav û kalê xwe li paş nemaye û hêz û rêza wan hê zahftir bi pêş xistiye. Nêrîn û gotinê wî di nav Kurdên Îranî, Iraqî û Osmanîyan de gelek cî girtine. Dema Seyyîd Ebdullahê apê wî di sala 1864an de wefat dike, 'Ubeydullahê Nehrî, dikeve şuna wî. Rîya Terîqê dimeşîne û rêberîya millet dike.

Heyama Şêx 'Ubeydullah, dema gur û geşbûna terîqeta ye. Di nav civaka Kurdan de, qedr û qîmeta ehlê 'ilm û terîqetê, gelek mezîn bûye. Ne tenê li welatê Kurdan, her wisan li hemû welatên Rojhilata Navîn, li Îran û Iraqê û heta li nav axa Dewleta Osmanîyan dînê Îslamê pir bi qedr e. Di demeke weha de, 'Ubeydullahê Nehrî, bûye şêxê terîqetê. Nifûz û tesîra wî li ser timamê Kurda çêbûye.

Pey nefikirina Mîr û Begên Kurdistanê milletê Kurd gelek ketiye bin te'de û ezîyetan. Bê serî û bê kes mane. Kurdê misilman ketine bin zulm û zordarî û bindestiyê. Ji her alî ve te'de û zordarî li misilmanan hatiye kirin.

Sebeb "**Fermana Îslehetê**" dewletên ecnebî mîna Ingîlîz û Emerîkan û Rûsan destê xwe yê bi qirêj dirêjî nav milletê Kurd dikin û bi navê mafên Filleh, Êzîdî, Cihû û Ermenîyan fîtne û fesadî dixine nav Kurdan. Baxusus, mîsyonerê Ingîlîz, Emerîka û Ûris tekoşîneke bê hempa li dijî Kurdên misilman pêk anîne. Kurd û Osmanîyan xwestine berdin hevdî. Bi vî awayî Dewletê ecnebîyan dixwazin di nav Kurdên misilman de dewleteke Nesturî bi destê Ermenîyan ava bikin.

Ji aliyê din Rûs ji gelek bajarê misilmanan mîna Qers, Ardahan û Tiflîsê xistiye bin destê xwe. Dor li Kurdan hatiye girtin. Milletê Kurd ji çar aliyan hatine dorpêç kirin. Aliyê rojhilatê bi yekîtî û têkilîya Rûs û Îranîyan, aliyê Başûr bi Ingîlîz, Fransiz û Emerîkan, aliyê rojava ji aliyê Dewleta Osmanî hatiye bandor kirin.

Ha di van rojên giran de, Şêx 'Ubeydullah, şivantiya Kurdên misilman kiriye. Dewleta Ingîlîz, dewleta Fransiz û dewleta Rûsan, bi çar çavan li benda dewleta Osmanî ne ko wê hilweşînin. Û her yek ji alîkî ve, weke guran pê bigrin û di nav xwe de perçe bikin.

Hisabê van dewletê xwînxwar li ser milletê Kurd û welatê Kurdistan e. Ji bo vê jî bîlxasse bi destê mîsyoneran û Nesturîyan gelek te'de û zordariyên mezin li milletê Kurd tên kirin. Dixwazin ji alîkî ve Kurdên belengaz li hember Osmanîyan telef bikin û li hember gelên din bidin kuştin. 'Eynî wilo jî, Dewleta Osmanî jî dixwazê Kurdên misilman û bi rûmet, li hember Ûris û Îranîyan û neyarên xwe yên din bidin kuştin.

'Ubeydullahê Nehrî, bi Seyyîd Fehîm Arwasî re, diçe hecê. Li hecê, gelek tişt tesîrî ser şexsîyeta wî dikin. Ji ber ku murşîdekî pir mezin e û emir e, bala wî diçe ser kirin û bûyerên dewletên Osmanî û Îranê. Zilm û zordariya wanî bi Kurdan li ber ronî dibin. Şêx Ubeydulah êdî ğîreta wî qebûl nakê ko Îranî, li belengazê Kurdên reben û bin maîyeta wî, zilm û zordestî bikin.

Mutefekkirê mezin Şêx 'Ubeydullah di sala 1880yan dema ji hecê divegere dest bi xebat û hereketeke gelek mezin dike. Bi hezaran kes, diçine pêşîyê û hatina wî pîroz dikin. Ji Wanê hetta Diyarbekrê, Ji Mêrdînê hetanî Urmîyê bi sedan Axa, Beg, Mîr, Şêx, 'alim, Seyda, mela, mezin û ronakbîrê Kurdan tên zîyareta wî û bixêr hatinê didin. Heca wî pîroz û bimbarek dikin.

**Fermana Tanzîmatê** heqê Ermenî û Suryanîyan yanî Fillihê Nasturî qebûl kiribûn; lê qed qala mafê Kurdan nekiribun. Û Kurda bi **"Wehşîtî"** û **"bi bêserîbûn"** nav dabûn. Bi vî awayî Kurd bi tu tiştî nehesibandibûn.

Ya duyemîn; ji ya pêşî jî girîngtirbû. Lewra Kurdên Îranê ketibûne bin ğezeba Şahê Îranê û gelek serok û mezinê Kurdan bi destê şah hatibûn kuştin. Ev bubu sebebê tevgera Şêx 'Ubeydullah. Wî xwest zordarîya Şahê Îranê yê xunmij ji ser serê Kurdên Misilmanî mazlum rake.

Ji bo vê yekê Şêx 'Ubeydullahê nemir, di wextekî kin de qeweteke mezin ji Kurdan gihand hevdî û berê xwe da ser Şahê Îranê. Ğayeke wî jî bi vê seferê Suryanî, Ermenî û Nasturiyê ko bi pişta Ingîlîz û Rusan te'de li misilmanan dikin xewfa misilmanan bixe qelbê wan bû. Şêx ordîke ji pêncî hezar neferî ava kir. Û herdu kurê xwe **Şêx Siddîq** û **Seyyîd Ebdulqadir** bi qumandarî danî ser ordîyê. Ji ğeyrî Kurdên Osmanîyan 12 'eşîrê Kurdan bi 'eşîrên xwe re tebayî ordîya wî bûn. Û bi wî re erîşî ser Şahê Îranê kirin. Di wextekî kin de Urmîyê sitendin û berê xwe dane paytexta Şah ko Tebrîz bu. Quwwet û yekîtîya Kurdan çavê dewelê ecnebîyan tirsand. Serhildana Kurdayî Îslamî, tirs xiste nav dewletên Xaçperestan.

Kurdên Îranêyî der û dora gola Urmîyeyê û deverên din ên Kurdistanê jî di sala 1880an de serî hildidin. Di nav Kurdan de tevgereke gelek mezin çêdibe. Şêx 'Ubeydullah, dixwazê çar hêlên welatê Kurdistanê, bi temamî bigihîne hev û yekîtîya Kurdan ava bike. Tevî hemû lawên xwe yên şêx û seresker, xwe di rêka azadîya welat de feda dike. Dixwaze ko li Kurdistanê, hukûmetekê ava bike. Ji bo vê armancê gelek şêx, 'alim, murşîd û serok eşîrên Kurd li dor vî digihêne hev. Heta ji 'eşîra Barzanîyan, Tur Ebîdîn û Ğerzîyan gelek mêrxas gihîştine wî.

Armanc û meqseda Şêx 'Ubeydullah xelaskirina milletê Kurd ji bindestîyê bu. Piştî ko li Kurdistana Îranê û li hêla welatê Ezerbêycanê bi qewet dibe, dixwazê ko serxwebûn û azadîya xwe î'lan bike. Ev dilxwaz ji dewelê ecnebîyan re xetereke gelek mezin e. Lewra timamê plan û projeyên wan ji bo ava kirina dewleteke Ermenî ye. Ji vê yekê naxwazin Şêx 'Ubeydullah muweffeq bibe. Ji bo serhildana Şêx 'Ubeydullah têk bibin, dewleta Îran û dewleta Osmanî, 1879an de di nav hev de levhatinek çêdikin. Timamê qewweta dewletan weke Ingîlîz, Rus, Şahê Îranî û Dewleta Osmanîyan di nav hev de yekîtî dikin û dikevine pêşya Şêx 'Ubeydullah. Bi hîle û fenan nahêlin Şêx bi serkeve.

Belê ne tenê Rus û Îranî, bi bal wan ve Emerîka, Ingîlîz, Fransiz û mîna Awusturya bi leşkerê xwe alîkarî ordîya Îranîyan kirin. Dewleta Ûrus jî, heta jê tê, neyartî lî hember Şêx 'Ubeydullah dîke. Lewra di sala 1877an de di herba Ûris û Osmanîyan de 'eşîra Nehrîyan alîkariyeke gelek mezin bi Osmanîyan re kirine.

Wekî din dewleta Ingîlîz, Rûsya û Ewusturya, rasterast emrî Osmanîyan dikin ji bo sekna Şêx û ji dewrê derxistina wî. Emerîka jî, alîkarîya Ingîlîzan dîke. Bî vî awayî, tevî dewleta Îranî şeş dewletên Bi qewet, hemû bi hev re lî hember doza azadî ya 'Ubeydullah dibin yek. Û rasterast pê re neyartiyê dikin.

Bi xêra alîkarîya dewletên emperyalîst, 'eskerên Şêx 'Ubeydullah, lî Îranê têk diçin. Xayînên Kurd jî li dijî Şêx yekitiya Kurdan xera dikin. Tevger belav dibe. Piştî ko lawê Şêx 'Ubeydullah, Seyyîd Ebdulqadîr, li Îranê bêçare dimîne divekişe. Êdî hemû dewlet li hember tevgera Şêx, eşkere û zelal dibin. Ji ğeynî Îranê, cî bi cî 'eskerên Osmanî jî, derbên mezin li eskerên Şêx 'Ubeydullah dixin. Dewleta Osmanîyan serê pêşî hevaltîya Şêx û gelê wî dikin pey ko bi Îranê re peymanek çêdikin êdî îhtîyaca wan bi Şêx 'Ubeydullah û tevgera wî namîne dixwazin wan ji dewrê derxin.

Heyret û ecêba giran eve ko Dewleta Osmanî, heta jê tê, zorê dide 'eşîrên Kurd ji bo bi Şêx re



nekevin yekîtiyê. Bi hemû hêzên xwe, bi dewletên gawîr re, li hember Şêxên misilman, dijminahiyeke kesî nedîtî nebînayî dike.

Dinya timam li ser Şêx 'Ubeydullah û 'eskerê wî belengazê Kurdan dibin yek û bi ser wan de diçin. Kurd bêçare dimînin ji hev terd û bela dibin. Kesek nabe xwedî û pişt ji Kurdên misilman re. Kurd dîsa weke her tim bê xwedî û bê kes dimînin û dîsa dibine mezlûmê vê ummetê.

Şêx dema tenê dimîne û bê qewet dikeve navcîtiya Osmaniyan qebûl dike. Dewleta Osmanî jî Şêx sirgûnî Stenbolê dike. Li Stenbolê bi şeklekî bi rumet û bi qedir ji teref Siltan tê pêşwazîkirin. Dewletê Ewrupî ji ber ko ji Şêx û malbeta wî gelek bi tirsin hew dihêlin Şêx vegere warê xweyî Cizîra Botan.

Şêx 'Ubeydullahê Nehrî, dike nake nikare li Stenbolê debar bibe û bi lez û bez û bi dizî disa divegere welatê xwe. Dewleta Osmanî bi çûna Şêxî welatê xwe razî nabe. Şêxê delal û bi rûmet careke din zor didinê û wî tînine Stenbolê. Li mana wî a wir jî qîma wan nayê û wî dişînin 'Erebîstanê.. Şêx bi sirgûnî li Medîna Munewwer bi cî dibe. Qîma wan bi vir jî naye berê wi didine Taîfê.

Piştî çendakî, Şêxê bi rûmet ji bo tewafa Ke'bê diçe Mekkê. Li wê derê diçe tewafa Beytê. Ke'beyê tawaf dike, radibe nimêjê. Du rek'at nimêj dike, li ser nimêjê, li ber Ke'beyê, di secdê de wefat dike. Dema wefata wî tarix 1883an nîşan dide.

Şêx 'Ubeydullahê Nehrî, li bajarê Mekkê, li goristana Muella tê definkirin. Şêx 'Ubeydullahê efdel, li surgunê li welatê kalê xwe Hz. Muhammed (S.x.l) ruhê xwe teslîmî rebbê xwe kir.



# Em Kurdên Serbilind in

# اَمْ كُرْدِى سَرْ بِلِنْدِنْ

Mela ‘Ebdulletîf Nakşîoğlû

*Em Kurdên serbilind in, jîr û zana û rind in*
*Kurrê İbrahîm û Nûh, li rêka Muhammed in*

اَمْ كُرْدِى سَرْ بِلِنْدِنْ ژِيْرُ و زَانَا ؤُ رِنْدِنِ
كُرِّى اِبْرَاهِمُ و نُوحْ لِرِيْكَا مُحَمَّدِنْ

*Me’budê me Xweda ye rehberê me Quran e*
*Birayiya gelan e, rastî ji me-r nîşan e*

مَعْبُدِى مَه خُودَانَه رَهْبَرِى مَه قُرْءَانَه
بِرَاتِيَا گَلاَنَه رَاسْتِى ژِ مَرْ نِيْشَانَه

*Em Kurdê serbilind in, jîr û zana û rind in*
*Kurrê Îbrahîm û Nûh, li rêka Muhammed in*

اَمْ كُرْدِى سَرْ بِلِنْدِنْ ژِيْرُ و زَانَا ؤُ رِنْدِنِ
كُرِّى اِبْرَاهِمُ و نُوحْ لِرِيْكَا مُحَمَّدِنْ

*Bi keskî em naxapin dînê xwe bernad in*
*Leşkerê Nebî Yûnûs, em pê îftîxar dikin*

بِكَسْكِي اَمْ نَاخَاپِنْ دِيْنِى خُوه اَمْ بَرْنَادِنْ
لَشْكَرِى نَبِي يُنُوسْ اَمْ پِى اِفْتِخَارْ دِكِنْ

*Em Kurdê serbilind in, jîr û zana û rind in*
*Kurrê Îbrahîm û Nûh, li rêka Muhammed in*

اَمْ كُرْدِى سَرْ بِلِنْدِنْ ژِيْرُ و زَانَا ؤُ رِنْدِنِ
كُرِّى اِبْرَاهِمُ و نُوحْ لِرِيْكَا مُحَمَّدِنْ

*Em tev li hev vegerin, em karê xelkê nekin*
*Warê me yê pir şêrîn, kêfa kufrê-m pê nekin*

اَمْ تَڤْ لِهَڤْ ڤَگَرِنْ اَمْ كَارِى خَلْقِى نَه كِنْ
وَارِى مَه نِى پِرْ شِيْرِيْنْ كِيْفَا كُفْرِى مْ پِى نَه كِنْ

*Em Kurdê serbilind in, jîr û zana û rind in*
*Kurrê Îbrahîm û Nûh, li rêka Muhammed in*

اَمْ كُرْدِى سَرْ بِلِنْدِنْ ژِيْرُ و زَانَا ؤُ رِنْدِنِ
كُرِّى اِبْرَاهِمُ و نُوحْ لِرِيْكَا مُحَمَّدِنْ

# Jinên Kurdistan Yên Meşhûr II

✍ Samî El Hisneyanî / Werger: Muhammed Sebatî

**Tabi'iyya Mezin:**

## Hefse a Keça Sîrînê Cerceraî (11)

Xwişka tabi'iyyê mezin **Muhammedê kurê Sîrîn** e. Tabi'iyyeke huccet bû. Di malbateke xwedî were'(xwe parastina ji tiştê bi şubhe) û zuhd de jiyaye. Ji medresa sehabiya derket, û ji fedla wê re ehlê me'rîfet û 'ilmê şahidî kirin. Bi senayên xweş senaya wê kirin. Di nav jinên dema xwe de xwedî mekanek muhim bû. Tabi'iyyê mezin **Eyasê kurê Mu'awiyye** di derheqê wê de wisa dibêje: "*Di nav pîrekê wê demê de yeke jê efdeltir min nedî.*" Hê 12 salî Quranê xwend. Gelek şeva radibû bi 'îbadetê îhya dikir. Hetta bi awayê ku; tabi'iyekî dema wê, di derheqê wê de wisa dibêje: "*Keça Sîrîn 30 salê sağ, ji bil qeylûle, muqabele û qedaya hacetên xwe, ji camiyê derneket.*"

Bi vî awayî hê di 'umrên ciwantiyê de, teşwîqê bi bal ta'eta Xweda ve dikir. Xisûsen jî li ciwanên keç û law nesîhet dikir. Ev yek ji gotinên wê ne: "*Gelî ciwanan! Ji nefsa xwe (ji bo ta'etê) hê hûn ciwanin, nesîbê xwe bistînin. Bêguman min 'emelê salih ji bil ciwantiyê nedîtiye.*"

Ji tirsa Xweda û ji bo haziriya mirinê beriya wefata xwe kefenê xwe hazir kiribû. Dema hec û 'umrê de ew kefen li xwe dikir. Dîsa dema dibû deh rojê dawî ji meha Remezanê bi şeva radibû û ew kefen li xwe dikir û di nabeyna ta'et û 'îbadetê ji Xweda re bi xişû', tederru', û reca disekinî. Ji Xweda re bi tirs û zarî du'a dikir ku van 'emel û ta'etên dike ji bo riza a xwe qebûl bike.

Hefse (Razîbûna Xweda Lê) ji Enesê kurê Malik, Rebî'ê kurê Ziyad, Ummu 'Etiyya Ensarî, Ebû 'Aliyye, kekê wî Yehyayê kurê Sîrîn û Diya Hesenê Besrî hedîs rîwayet kiriye.

Ji bil kesên ji wan hedîs rîwayet kiriye cema'etekî ji tabi'înê Kîram wek: Eyasê kurê Mu'awiyye, Eyyûbê Sextiyanî, Xalîd El Hîza, 'Asim, 'Ehwel, Qetade, û kekê wî Muhammedê kurê Sîrîn jî jê hedîs rîwayet kirine.

## Helîma Keça 'Îmaduddîn (12)

Di qernê heftê hîcrî de jiyaye. Navê wê Helîma keça 'Îmaduddîn 'Ebdullahê kurê Melîk 'Adil Eyyûbî ye. Jinikeke 'alîm e, fadile ye, muheddîse ye û salîhe ye. Di 'ilmê Hedîsê de 'alîmeyeke meşhûr bû.

## Xatûn-ul Eyyûbiye (13)

Xatûna keça Melîk Eşref Mûsayê kurê Melîk 'Adil. Di qernê şeşê hîcrî de jiyaye. Bi Melîk Mensûr, Muhammedê kurê Salihê Eyyûbî re zewicî. Pîrekeke xwedî serwet bû û gelek milkên wê hebûn. Bi mal û mulkê xwe li Şamê, **Medresa Xatûniyye** û **Darus Se'adê** bîna kir.

## Xedîca Şahîncaniye (14)

Xedîca keça Muhammed kurê 'Elî yê Şahîncanî ye. Di sala 376ê hîcrî (M-986) de hate dinê. Jinikeke 'alîme, wa'îze û muheddîse bû. Di 'ilmê hedîsê de gelek xwedî 'ilim bû. Xetîbê Beğdadî derheqê wê de dibêje: "*Jinikeke salîhe û sadîqe bû, me jê hedîs nivîsand.*"

## Xedîca Keça Melîk Mu'ezzem (15)

Xedîca Keça Melîk Mu'ezzemê kurê Melîk 'Adilê Eyyûbî ye. Zi girikên xêr û îhsanê bû. Ji xizmetên wê yê herî mezin, yek jê Medresa Murşîdiyye ye. Vê Medresê li ser Çemê Yezîd û li dora Dar-ul Hedîsa Eşrefiyye bîna kiriye. Gelek 'alimên mezin û Feqîhên mezhebê Îmam Ebû Henîfe tê de ders dane.

## Rebî'a Xatûn (16)

Rebî'a keça Eyyûb, xwişka Sultan Selaheddîn Eyyûbî. Di sala 56ê hîcrî (M-1166) de hate dinê. Ji girikên xêr û îhsanê bû. Bi Se'deddîn, Mu'înuddîn Ez Zengî re zewicî. Piştî wefata Mu'înuddîn, bi Sultan Muzeffer Kewkeberiyê xwedyê Erbîlê re zewicî. Zêdeyê 40 salî li balê ma. Piştî wefata wî zîvirî Dimeşqê.

Ji pîrekên salîhe bû. Pir radibû limêjê şevê. Şevekî ji wirdê xwe, di xew de çûbû dema bû sibe gelek 'aciz bû. Nûreddîn Zengî jê pirsî xêre tu qehiriyî? Wê jê tiştê hatiye serê wê hîkayet kir. Li ser vê yekê emrê dahulwana kir ku; wextê seherê li dahûla xin û ê radizên şiyarkin.

Ji xizmetên wê yê herî mezin yek jê ev e ku; Medresa Sahîbe bîna kiriye. Ev medrese li qûntara çiyayê Qasyon li rojava mehella Kurda ava kiri ye û weqfê hînkirina fiqha Mezhebê Henbelî kiriye. Alimên weke: Nasih El Henbelî, Îbn-ul Wasitî, Şîhab El Meqdîsî û Îbn-ul Muflîh li vê medresê xwendine û ders dane. Dîsa Medreseke bi navê Xatûniyya Ciwaniyye ava kiriye. Ji bil medresa, ji bo ehlê tesewwifê jî, mekanekî 'îbadetê xwe tê de bikin ava kiriye.

## Zemereda Eyyûbiye (17)

Zemred Xatûna keça Necmeddîn Eyyûb xwişka Nasir Seleheddîn Eyyûbî. Di qernê şeşê hîcrî (M-Qernê12) de jiyaye. Ev jinika mubarek girikek ji girikê xêr û îhsanê bû. Di dana sedeqa û bînakirina medrese û tiştên din de pêşiya herkesî bû. Mizgefta Zemred Xatûn wî ava kir û Îmam û muezzînek jê re texsîs kir.

## Zuhre Xatûn (18)

Zuhre Xatûn keça Melîk 'Adil kurê Eyyûb. Di qernê heftê hîcrî (M-Qernê12) de jiyî ye. Girikek ji girikên xêr û îhsanê bû. Xizmeta wê ya herî mezin bîna kirina Medresa 'Adiliya Biçûke. Ji bo vê medresê mudîr, muderris, îmam, muezzîn, dergevan, muhafizek û 20 feqî texsîs kir.

Di vê medresê de 'alimên pir mezin weke Îbn-î Xalîqan Erbîlî, Şerefuddîn El Meqdîsî û Îbnî Melekanî xwendine.

Muhammed Xeyr Remezan dibê: " *Ev medresa hanê sala 1910 şewitiye. Vêga mekanê wê biye cihên tîcaretê û li Dimeşqê "Suka 'Esrûniye" ye.*

## Zeyneba Is'irdiye (19)

Zeyneba keça Suleymanê Is'irdiye. Di sala 705ê hîcrî (M.1306) de wefat kiriye. Ji Zebîdî û Şemsê Buxarî hedîsên Pêxember hînkir. Hinek rîwayeta de ew bi serê xwe ye. Di 'ilmê Hedîsê Nebewî de 'alimekê gelek mezin bû. Îmamê Zehebiyê bi kitabên xwe meşhûr jê dersên hedîsê sehkiriye.

## Zeyneba Keça Hafizê 'Iraqî (20)

Diya Muhammed Zeyneba keça 'Ebdurrehîm Hafizê 'Iraqî El Kurdî. 'ilim ji bavê xwe û Nûreddîn Heysemî û ji Merağî sitandiye. Gelek 'alima îcaze dayê. Ji wan 'aliman hinek ev in: El 'Elaî û Hafizê Mizzî. 'Ellame Sexawî û gelek 'alima jê 'ilmê hedîsê guhdarî kiriye.



# Mezinê Qewmê Xizmetkarê Wî Ye
# Îbn-î Teymiyye El Herranî

**Muhammed Sebatî**

Ew; 'Alimê 'amil, feqîhê muctehîd, muheddîs û hafiz, di her new'ên 'ilman de pêşîvan, mucahîdê meydanên cîhadê, siyasetmedarê qadên siyasetê, murşîd û huccet, muwehhîd û rebbanî Îmam Îbn-î Teymiyye El Herranî ye.

## Navê Wî, Neseba Wî û Kunya Wî

Neseba wî ev e; Ahmed, Teqiyuddîn Ebul 'Ebbasê kurê Şêx Şihabûddîn, bavê Mehasîn 'Ebdulhelîm kurê Şêx Mecîduddîn bavê Berekat 'Ebdusselamê kurê Bavê Muhammed 'Ebdullah kurê Bavê Qasim Xidir kurê 'Elî kurê 'Ebdullah e. Malbata wan bi kunya Îbn-î Teymiyye tê zanîn.

## Wîladeta Wî

Li gor dîrokvana Îbnî Teymiyye li bajarê Herrana Kurdistana Bakur di sala 661ên hicrî, dehê meha Rebî'ulewwelê ji dayîka xwe re bûye. Di derheqê milliyeta wî de hinek nîqaş hebin jî li gor dirokvanê muheqqiq Muhemmed Ebû Zuhre bi eslê xwe Kurd e. Muhammed Ebû Zuhre di kitêba xwe de vê yekê bi vî awayî tîne ser ziman: "*Dîrokvana nesla wî zikir nekirine û bi bal bajarê Herranê ve întîsaba wî kirine, bi bal tixmê 'Ereb ve nekirine. Eviya jî îşaret dike ku ew ne 'Ereb e. Îhtîmal ew Kurd e. Lewra Kurd qewmekî xwedî ğîret, cesaret û bi hêz in. Di nav exlaqê wan de quwweta yekbûnê heye. Van sifetên me zikir kirin jî bi awayê herî kamil di wî de xwe nîşandidin, di nav 'aliman de jî wisa tê zanîn. Ji bil van sifeta, pê re tetmîna mufekkira û hidûa muheqqîqa heye. Bê guman di qernê 6 û 7ên hicrî de gelek xizmetên Kurdan di mudafe'a Îslam û muslumana de çêbûye.*" (1)

Bi her awayî Îbnî Teymiyye Kurd be jî û ne Kurd be jî; di erda Kurdistanê de welidiye, li wir zaroktiya xwe derbas kiriye, li ber destê 'alimên Kurdistanê gelek xwendiye. Û heta îstîlaya Moğola jî malbat, bav û kalên wî di nav gellê Kurdistanê de jiyana xwe domandine. Ji ber vê yekê em bi dilekî rihetî karin wî ji dahî û 'alimên Kurdan yên di 'alema Îslamê de herî meşhûr bihesibînin.

## Teleba Wi Ya 'Ilmê

Ji ber di malbateka wisa de welidî Îbnî Teymiyye jî li ser rêça bav û kalê xwe rabû. Di 'imrê xwe yê biçûk de Quran hifiz kir, heta wefat jî kir li ser vê hifza xwe ma. Li gor tê neqil kirin Îbnî Teymiyye di hepsê de Quranê dixwend heta xetim dikir û heştê

carî carna vêya tekrar dikir. Pey hifza Quranê berê xwe da Hedîsê Şerîf, Fiqih û Luğetê de gelek tişt hifiz kir. Bi xebat, cehd û xwendina xwe di zaroktiya xwe de giha dereceke pir mezin ku; ji bo zarokekî ne tiştekî sivik bû. Ji bil vana Îbnî Teymiyye bi 'eqlê xweyê şiyar, fikra xweyê musteqîm û quwweta hifza xwe jî derdiket pêş. Jixwe ewî fitret û terbiye ji bavê xwe mîras girtibû.

Îbnî Teymiyye di 'ilmê Hedîsê de jî gelek bi pêşve çûbû. Pirê kitêbên Hedîsê weke **"Sehîha Bûxarî", "Muslum", "Sunen" û "Mesanîda"** ji mezinên 'alimên vê 'ilmê sehkir, gelek cara xwend û hifiz kir. Li gor tê neqil kirin zêdeyê 200 Şêx û Seydayên wî hebûn. Ji bil van 'ilman, 'ilmê Matematîk, Luğetê 'Erebî jî di dereceya îxtîsasê de hînkir.

'Ilmê Fiqhê de li ser mezhebê Henbelî rêça bav û kalê xwe domand. Mezheb ji bavê xwe xwend û xwe bi pêş ve bir û bû kaniyeke 'ilmê.

Dewra li Dimeşqê bû, Dimeşq merkeza 'ilmê bû. Ji her erdên 'alema Îslamê 'alimên herî meşhûr ji ber êrîşên Tatara hîcretê bal Dimeşqê dikirin. Li Dimeşqê dîsa Medresên Hedîsê yên gelek meşhûr hebûn. Di van medresaeyan de 'alimên fihûl (Beran) weke "**Newewî**", "**Mizzî**", "**Îbnî Deqîqê 'Îd**", "**Zemlekanî**" û 'alimên wek "**Zehebî**" û "**Sibkî**" hebûn. Ji bil van medresa, medreseyên mezhebên Henbelî, Malikî, Henîfî û xisûsen ji ber ku Seleheddînê Eyyûbî û Eyyûbî jî Şafi'î bûn, medreseyên mezhebê Şafi'î pir bûn.

Di pey xwendina 'ilmê Fiqhê, 'ilmê 'Eqîdê jî xwend. Di 'eqîdê de Eyyûbiya 'Eqîda Îmamê Eş'erî belav dikirin û 'alima bi giştî li ser vê mezhebê bûn, hindik mabû ku kes muxalif jê re tune be. Lê belê li kêleka Mezhebê Îmam Eş'erî, di 'Eqîdê de Mezhebê Henbeliya jî bi hêz bû û xwedî medreseyan bû. Bi vê re nîqaş û îxtîlafên nabeyna herdû mezheba jî didomî. Îbnî Teymiyye jî, 'ilmê 'eqîdê li ser ûsûla Henbeliya bi tewsiye û rî'ayeta bavê xwe, di medreseyên Henbeliya yên weke "**Medreseya Cewziyye, Sukeriyye û 'Umeriyye**" de xwend.

Di vê dema bi bereket de 'alimê hêja Îbnî Teymiyye, ji bo mudafe'a heq tiştê ku destê wî digihîştiyê jiber dikir. Hetta wisa ku 'alimekî dewra wî di derheqê wî de wisa digo: "*Xweda çawa ji Dawûd re (Silavên Xweda Lê Be) hasin nerm kiribû, ji wî re jî 'ilim nerm kiribû…*"

## Mihnet, Hepis û Wefata Wî

Pey mucadela wî ya siyasî û 'eskerî li hember Tatara, Îmam Îbnî Teymiyye di çavên xelqê û îdarevanan de gelek bûbû xwedî meqamek mezin. Ev meqam gelek hesûdiya muxalifên wî dikişand. Lewra Îmam Îbnî Teymiyye li hember 'eqîdeyên wan yên batil mucadeleyek mezin dida û bilind bûna meqamê wî li ba xelqê û îdarevanan çavê wan ditirsand. Piştî nihêrtin ji Îmam bi awayê cîdalê xilas nabin û ji Şama ku bi destê wî xilas bûye ji neyarên Xweda nikarin derxin; dest bi hîle û mekr û dolabên şeytanî kirin.

Di sala 712an de Sultan bi 'eskerên xwe ji bo mudafe'eya wê qesda Şamê kir. Di vê sefera wî de Îbnî Teymiyye jî hevaltiya wî kir. Tatar beriya Sultan bighîje wan zîvirîn û çûn. Îbnî Teymîyye îdî di Dimeşqê de îstîqrar girt û dest bi fetwa kir.

Fetwa da ku; kesê bi telaq sond xwaribe û qesda wî ne telaq be telaqê wî nakeve. Li ser vê fetwa wî mute'essibên mezheban men'a wî ji vê fetwayê kirin. Lewra ev di nêrîna wan de muxalifê çar mezheban bû. Pişt re bi emrê Sultan men'a wî kirin, demek ji bo fitne çênebe Îmam fetwa xwe sitend, lê piştî demekî tiştê heq zanibû dîsa anî ser ziman û ji ya xwe daneket. Li ser vê yekê 'îtab lê hatin kirin û bi fermaneke mora sultan lê men'a wî ji vê fetwayê hat kirin. Lê Îmam dîsa ji fetwa xwe nezîvirî. Li ser vê yekê 15-16 meh di hepsê de hate girtin. Pişt re ji hepsê derket û dîsa zîvirî ders û fetwa. Bi vî awayî xizmetên xweyê 'ilmî heta sala 726ên hicrî domand.

Di sala 726an de, dîsa ehlê hesed û fitnê bela xwe jê venekirin. Belavbûna şohreta wî ew xistin nav tengasiyek mezin. Ji bo Şêxûlîslam li ba Sultan sucdar bikin û bizîvirînin hepsê di nav fetwayên wî de lêkolîn kirin. Fetwayeka wî ya beriya 17 salî di derheqê, ziyareta qebra û limêja ba tirba Resûlê Xweda de daye ji xwe re kirin huccet û ji Sultan re mektûb şandin Misirê. Sûltan di meclîseke ku ew tunebû 'aliman kom kir û nîqaşa fetwayên wî kirin, di dawiya nîqaşê de Sultan emrê hepiskirina wî da. Şêxûlîslam xistin hepsa "Kelha Dimeşqê". Şêxulîslam li wir jî sekin pê neket qelem di dest de telîfatên gelek girîng kirin. Li derva çawa jê re ji her cihî sûal dihatin li hundir jî bi wî awayî jê re dihatin û xelqê ji fetwa û 'ilmê wî îstîfade dikirin. Şêxulîslam zîndan ji xwe re kiribû Medreseya Yûsifî.

Ehlê fitne û hesedê di zîndanê de jî bela xwe jê venekirin bi temamî xebatên wî xwestin bidin sekinandin. Îmam êdî sihheten jî nexweş ketibû. Dawiya 'umrê xwe de xwe da ser tîlaweta Quranê di hepsê de êdî dewamî Quranê dixwend û pê qelbê xwe şa dikir. Heta di sala 728ên hicrî 20 meha Şewwalê giha rehmeta Allahê 'Ezîm.

Pey wefata wî limêja wî serê ewwil li kelha Dimeşqê hate kirin. Dema xelqê wefata wî sehkir pêl bi pêl ji bo naşê wî rakin êrîşê kelhê kirin. 'Eskera ji bo naşê wî di nava xelqê de ji îzdîhamê ne'eciqe diparastin dor lê pêça bûn. Hema hema Dimeşqê belkî beriya wî îştîraqeke wisa di tu cenazeyî de nedîbû. Çawa tê neqil kirin ji bil zilama zêdeyê 15 hezar pîrek hebûye. Piştî limêja nîvro li Camiya Emewîyan limêja wî hat kirin. Pişt re li Meqbera Sofiya li ba birayê wî Şerefuddîn 'Ebdurrehman hate defin kirin. Dîsa li serê Limêja Ğaîb ji Yemenê bigre heta Çînê li her welatên Îslamê hate kirin. Xwedayê Te'ala me ji bereketâ 'ilmê wî mehrûm neke.

Hinek Feqiyên Îbnî Teymiyye yên meşhûr jî ev in: El Hafiz Îbnî Qeyyîm El Cewzî, El Hafiz Eb-ul Feda Îbnî Kesîr, El Hafiz Îbnî Recebê Henbelî.

Îbnî Teymiyye gelek kitêb û telîfat nivîsandine. Kitêbên ku nivîsandine 300 kitêbî derbas dikin. Lê belê emê bi tenê çend kitêbê wî yên girîng bijmêr in: "Mecmû'et-ul Fetawa Îbnî Teymiyye", "Es Siyaset-uş Şer'iyye" û "Mînhac-us Sunne".

**Îbnî Qeyyîm El Cewzî:** *"Şêxê Îslam û muslumana, de'wetvanê riya Xweda û Resûlê wî, Mucahidê riya Xweda, ewê ku; Xweda pê ruyê bi awir kenand, ji sunnetê tiştên hatine jibîr kirin derand. Ew nûrek bû Xweda wî di tarîtiya şevê guman û şubuhatan de derand, Xweda pê tarîtiya zulmê rakir û pê qelbê bi qefl vekir… Xweda pê mizgîniya Resûlê xwe rast derxist ku Resûl (Selat û Silavên Xweda Lê Bin) dibê: " Xweda serê her sed salî kesên dînê wî nû bikin dişîne."…*

## Çavkanî:


1- Muhammed Ebû Zuhre, Îbn-î Teymiyye; Jiyan, Esr, Raman û Fiqha Wî 18/19

2- El Kewakîbû Durriye, Îbnî 'Ebdulhadî.

3- El Bîdaye We Nîhaye-13/335,336.

4- Kewakibû-d Durriye-181

5- Bîdaye We Nîhaye-Cildê 14 û Muhammed Ebû Zuhre, Îbn-î Teymiyye; Jiyan, Esr, Raman û Fiqha Wî

6- İslam Önderleri Tarihi, Kayahan Yayınları- Eb-ul Hasan En Nedewî

7- El Durerul Kamîne, 3/322


# Mizgînî


M. Tahir Soranî


*Mizgîn ji me re be, bi sed mizgînî*
*Ruh û canê xwe didim bi şêrînî*
*Lew rizgar bun şêr û piling ji qeyda*
*Dengê me hildane li Çîn û Maçînî*

*L-textê milukan guh guh diderin*
*Serdar û merdan can dane bi tehsînî*
*Ğalib bû li ser mal û can eşqa Xweda*
*Îhya bû diyarê me bi de'wa Huseynî*

*Sed carî şikur kin em bikin hemd*
*Ku da me Xweda darika evînî*
*Dermanê her derda heta bi ebed*
*Quran û sunneta du'a bi amînî*

*Me vexwar ava heyat ji kaniya heq*
*Me mat kir neyarê xwe bi miskînî*
*Xwedayê bi bext da me we`da beşt*
*Yusuf in em Yusuf in nabin mehzunî*

*Hey hey tu çi dixwazê ji me felek*
*Em te nasnakin tu li ba me nînî*
*Em ne koledar û maldar in welleh*
*Şehadet tu ji me re heyat û jîn î*

*Dayikê rehmel te be her tu hebe*
*Gava-z şehîd bûm neke huzn û şînî*
*Yasirê te me ez qurbana te me*
*Te mezin kirim firotî me vî dînî*



# Erê Law Erê!

✍ **Mîrzadê Zozanî**



**Xalê Rûstem** cotkarekî hêja ye. Bi limêja sibêhê radibe û misasê xwe dixe destê xwe, hespê qer dide pêşiya xwe û haletê cot li hespê qer dike û riya nav 'êrd digire… Navê hespê Xalê Rûstem jî **Cello** ye…

Ku berê Cello dikeve çolê, teriya xwe tavê ser pişta xwe û serî li xwe bilind dike. Lewra pûş û palax û gîha li benda Cello ne ku here bixwe û li nav mêrgê biçêre…

Xalê Rûstem ku digihêje nava 'erd Cello li nava mêrgê girêdide û kevirê nava 'erd berhev dike ji bo gîsin li wan kevira 'asê nebe…

**Ferzan** neviyê Xalê Rûstem e, 'emrê wî biçûk e. Bi sedem ku ji Ferzan pêve neviyê Xalê Rûstem tûne ne, Xalê Rûstem ji Ferzan zahf hez dike. Wî ji himêza xwe û ji ser kolanîka xwe danayne.

Ferzan nû bi ziman ketiye û bangî Xalê Rûstem dike dibêje: **"Kalo! Min bibe ba Cello"** Xalê Rûstem nevîyê xwe ji xwe naqetîne. Diçe ku, Ferzan jî bi xwe re dibe…

Rojekî ji roja Xalê Rûstem berya limêja sibehe ji xew radibe, destmêj digire û berê xwe dide mizgeftê. Li hewşa mizgeftê azanê guhdar dike, hêtta ku azan diqede… Piştî ku azan diqede Xalê Rûstem dibêje: **"'Ezîz Allah! Şefe'et ya Resullalah"** û bi gavê giran dimeşe mizgeftê…

Hêdî hêdî civîna mizgeftê bela dibe. Xalê Rûstem jî ji mizgeftê derdikeve û diçe malê xwe amadê dike ji bo ku here nav 'erd cot bike…

Xalê Rûstem haletê xwe li Cello dike û misasê xwe dixe destê xwe û Ferzan jî li kolana xwe dike, berî dide nava 'erd; ku digihê nav 'êrd Ferzan datîne bin siya dara guhîjê û Cello amade dike dest bi cot dike…

Tava nîvro jî, ku zahf germ e Xalê Rustem jî û Cello jî nerehet dike wan di xwêdanê de dihêle… Xalê Rûstem li bêr vê germahiya tavê hew diqedîne û diçe ba nevîyê xwe bin siya dara guhîjê… Lê dinêre ku neviyê wî Ferzan, li cihekî dinêre, tew nabîne ku kalê wî hatiye…

Xalê Rûstem di şipar re destê xwe tavêjê bin çengê Ferzan û wî datîne ser çokê xwe Ferzan maçî dike…

Ku Xalê Rûstem neviyê xwe dibîne betilandina xwe û germiya nîvroyê tûj jibîra dike… Ferzan jî çavê xwe ji teyrê ku li rexê 'erd daketiye û di nava pûş û palaxê diçêre naqetîne…

Dibêje: **"Kalo eviyê ku li vir e çi ye?"** Xalê Rûstem dibêje: **"Evîya Legleg e kalo heyrano"** Dîsa Ferzan dibêje: **"Bavo sutiye vî dirêj e, evîya çi ye?"** Xalê Rûstem dibêje**: "Evîya Legleg e bavo qûrbanoo"** Dîsa Ferzan dibêje: **"Nikilê vî dirêj e, ev çi ye bavo?"** Xalê Rûstem dibêje: **"Evîya Legleg e kalo hêyrano"** Dîsa Ferzan dibêje: **"Linge vî dirêj e, evîya çi ye?"** Xalê Rûstem dîsa bi ken û kêf û bê 'acizî dibêje: **"Evîya Legleg e ez qurbano ez hêyrano"** Welhasil gelek carî Ferzan dipirse û Xalê Rûstem her carî jî bi kêf û ken û bi hezkirin dibêje: **"Ev Legleg e"**

Sal û demsal derbas dibin Ferzan dibe xortekî 20 salî û Xalê Rûstem jî ji dest û piya dikeve… Îdanê Ferzan diçe cot û karê malê dike…

Xalê Rûstem di hûndir malê de zahf 'aciz dibe dixwaze derkeve çolê… Bangî Ferzan dike dibêje: **"Kurê min! Ez li nava vê malê zahf 'aciz bumê. 'Îro min jî bi xwe re bibe çolê. Tê cot bike ezê jî li te mêzekim, li bin siya dara gûhîjê"**

Û xwe amade dikin ku dighêjin nava 'erd Ferzan cot dike û Xalê Rûstem jî li bin siya darê rûdinê… Ferzan ku dibetile ew jî tê ba kalê xwe bin siya dara gûhîjê…

Xalê Rûstem bi dilxweşî li neviye xwe temaşe dike. Ferzan jî ji vê germahiya nîvroj zêde 'aciz bûye li bin siyê rûdine… Xalê Rûstem jî li teyrekî ku li nava 'erd diçêre dinêre…

Û ji Ferzan dipirse dibêje: **"Kurê min ev çi teyr e?"** Ferzan dibê: **"Evîya Legleg e kalo"** Disa dipirse: **"Lingê wî dirêj e, ev çi ye?"** Ferzan dibêje: **"Bavo Legleg e"** Xalê Rûstem disa dipirse dibêje: **"Evîya dimeşe, ev çi ye?"** Bêhna Ferzan teng dibe û dibêje: **"Ma koranî bi çavê te de hatiye? Legleg e! Legleg! Te carekî pirs kir, diduya pirs kir, ma tû dîn e, kor e, yan jî kerr e?"**

Xalê Rûstem kelogirî dibe û dibêje: **"Erê law! Tû biçûk bû. Te hezar carî pirs kir, her carî bi kêf û henek û bê 'acizî min go Legleg e. Lê belê min zanibû Legleg e, min ji qeska ji te re pirs kir. Lê te pirsa min a diduya di devê min de hişt. Xweya te li ser çokê te ye…"**



Rêzenivîsek Li Ser Hinek Stranên Nêzdîroka Me 8

# Tew Dinyayê

## Li Ser Şerrê Ûris û Rizgarkirina Kopê û Kilama Seî'dêNado

✍ Cevdet Karaman

**Gelî xwendevanên hêja!**

Em bi silavên germ dest bi rêzenivîsa xwe a li ser kilaman benda heşta jî dikin. Hemd û sena medh û minnnetên bê hejmar layiq û babetê Allah Te'ala ne. Ku em gihandin jimarekî kovara kelhaamed a din jî. Selat û selam li ser Pêxemberê me Hezretî Muhammed 'Eleyhîsselam û ehlê beyta wî ya pak û paqij û temamê eshab û ummeta wî be. Çawa ku me di jimarên din de jî got ku: **Kurd sitranin, sitran jî Kurd.** Lewra çi dîrok û çi çîrok, çi şîn û çi şadî, hemû reng û dengê jiyana Kurdan di sitranan de baş xwiya ye.

Em dê niha di vê rêzenivîsê de bala we bikşînin ser şerê cîhanê ê yekem. Û êrîşa Ûris a bi ser Kurdistanê ve bînin ziman. Û bêhnek li ser dijraberî û berxwedana Kurdan bi sekinin. Û werin ser kilama **Se'îdê Nado** bavê **Dilşa**yê. Şêrê extiyar **Dewleta Alî Osman** bi saya ramanên Jontirkê ğerbperest ji hêz û qeweta xwe dikeve. Hêz û qeweta xwe winda dike. Ji xwe li gor beyana Muhammed Akîf Ersoy cinawirên ğerbê ê birçî û yek diran jî li benda rewşekî wiharengin. Piştî ku dewleta Alî Osman bi teşwîqa Jontirkên nijadperest li rex Almanan daxilî **"Herba Cîhanê a Yekemîn"** dibe. Hêzên ğerbî ê koledar jî dilxweş û dilgeş dibin. Lewra ji zû de ji heft 'eyda li 'îdekî wilo digeriyan. Ji lew di dawiya şer de piştî têk çûnê dev ji Almanan berdidin û bi giranî li ser dewleta **Alî Osman** û parvekirina axa wê di sekinin.

Piştî **"Peymana Sewrê"**, hêzên koledar dest bi îşğalê dikin. Çi Bakur û çi Başûr, çi Rojhilat û çi Rojava ji çar aliyan ve Kurdistan û Anadolê îşğal dikin. Di warê parvekirinê de Kurdistana Bakûr jî para Ûris û Ermeniyan dikeve. Ermen û Ûris bi alîkariya hêzên koledar ji Qersê dest pê dikin û li çar aliyê Kurdistanê qetlî'am û komkujiyan pêktînin. Ji lew li dij vê îşğal û qetlî'amê wek temamê gelê muslumanên Anadolê li Kurdistanê jî Kurd ji bo dijraberî û berxwedanê saziyan pêktînin. Serek 'eşîr û şêx û ağa û begên Kurdistan ji bo çareserî û azadiya gelê musluman dixebitin. Civînan pêk tînin. Di nîhayetê de ew jî bi saya milîsan bi awayek wek gêrîla biryara berxwedanek bi şer didin. Lewra dewleta Alî Osman naçare. Nikare her derê welat bi parêze.

Dema ku Ûris ji hêla qersê ve dest bi îşğala welat dike. Miletê Kurd jî bi saya hêzên milîs dikeve berxwedanê. Di vê berxwedanê de bi Ûris re şerên yeman pêk tên. Lê belê ji ber ku artêşa Ûris artêşek muntezem û bi rêk û pêk e. Hem di nav wê artêşê de milîs û çetêyên Ermenan jî niştecîh in. Û ji rewşa Kurdistanê baş agahdar in. Muslumanên Kurdistan jî ji artêşek muntezem mehrûm in. Kurd di destpêka şer de bi ser nakevin.

Di destpêka şer de hêzên Ûris û Ermen li ser Kurdan gelek komkujiyên û qetlî'aman pêktînin. Tirs û

xofa hêzên serdest û îşğalker dikeve dilê gelê musulman. Û gelê musulman ji ber hêzên koledar koçber dibe. Ji xwe daxwaza Ûris û hêzên koledar jî ev e. Da ku dewlata Ermenan damezrînin. Û bi saya wê dewletê koledariya xwe bidomînin.

Di gel vê mehrûmîyet û naçarîyê musulmanên Kurdistan li dij Ûris û Ermenan berxwedanekî bê hemta pêk tînin. Wek **‘Ebdulmecîd Begê Sîpikî** cî bi cî carna du sê kes zora alayî kî artêşa Ûris dibin û wan meğlûb dikin.

Di şerê Ûris û Ermenan de bi milyonan kesê musluman di bin muhacir û hicret dikin. Di riya muhaceretê de bi hezaran kes ji ber sar û serma û birçîbûnê qir dibin. Ji milîsên Kurdan çend kesên ku di berxwedana şerê li dij artêşa Ûris û Ermenan de nav û deng dane evin: **Bedî’uzzeman Se’îd Nûrsî, Seyyîd ‘Ebdulqadirê Nehrî, Şêxên Norşînê, Şêxên Taxê, Şêxên Xinûsê** ku malbata Şêx Seî’d e, **Xalid Begê Cîbrî, Xalit Begê Hesenî, Rizayê Xalid, ‘Ebdulmecîd Begê Sîpikî, Bişarê Çeto, Cemîlê Çeto, Hecî Mûsa Begê Xoytî, Serekê ‘eşîra Heyderan Kor Huseyin Paşa, Qasim Begê Xweytî, Seyidxanê Ûsivê Seydo, Derwêşê Ûsivê Seydo**, çend kesên ji malbata Cemîlpaşazadeyan û gelek kesên din. Ji ber ku di vê nivîsê de cihê me kêm e, em nikarin cih bidin temamê serek û pêşîvanên lehengên Kurdistan ê di şerê cîhana yekemîn de. Lê em baş dizanin ku di vî şerî de ‘alim û şêx û zana, serek ‘eşîr û beg û ağayên Kurdistan ji can û dil ketine nav gelê xwe û bi wan re di şer de şuğulîne. Hinek ji wan şehîd ketine hinek jî sağ mane.

Dîsa em baş dizanin ku nexasim li **Qers** û **‘Erdaxan û Wan û Bedlîs û Hesenqele û Erzan û Kop û Dêrika Muşê** û gelek û deverên din bi destê leşkerên Ermen û Ûris û Qazaxan qetlî’amên pir giran çêbûne. Bi hezara kes hatine kuştin. Bi hezaran jî di mihaciriyê de mirine.

Zanayên Kurd ê ku îro behsa komkujiyên Ermeniyan dikin lazime vê heqîqetê jî jibîr nekin. Heger ji me bawer nakin jî bila li pirtûka seydayê xwe Cîgerxwîn a bi navê **“Heyat Hîkayem”** rupelê 53êyan mêzekin. Ev pirtuk di nav weşanên evrensel de hatiye weşandin. Bi rastî ev bûyer pirtûkek ser bixwe dipê. Ji lew em meselê li vir kurt dibirin û vedigerin ser şerê Kopê.

Leşkerê Ûris û Ermeniyan ji Qersê dest pê dikin bi qetlî’am û komkujiyan tên. Jin û zarok û extiyar ji ber wan direvin. Milîsê Kurdan jî dikevin berxwedanê. Nîhayet Ûrîs tê Kop (Bilanix) a Mûşê jî îşğal dike. Di hengama îşğalê de qetlî’am pêk tê. Gelê Kopê jî li dij Ûris û Ermeniyan berxwedanek bê hemta nîşan dide. **Se’îdê Nado** û leşkerên xwe ji aliyê **Qandilîsê** ve **Derwêşê Ûsivê Seydo** jî ji aliyê Başûrê Kopê ve êrîşî Ûris dikin. Paşê alaya Hecî Mûsa Begê Xoytî jî di hewara wan de tê. Piştî şerekî yaman û bê eman. Ûris mecbûr dibe bi meğlûbî ji Kopê derdikeve. Serleşker û leşkerên Ûris ji vê bûyerê heyirî û matmayî dimînin. Milîsên ku ji artêşek muntezem û çek û sîlehên modern mehrûm in artêşa Ûris meğlûb dikin. Ev heqîqet li zora serleşkerên Ûris diçe. Ji lew ji nû ve arteşek gumrah amade dikin. Û bi dijwarî êrîşî Kopê dikin. Da ku ser û binê Kopê bikin yek û tarûmar bikin. Di vê êrîşa Ûris de di navbera Kop û Dêrikê de di nav hêzên Ûris û milîsan de şerekî yeman pêktê. Di vî şerî de **Se’îdê Nado** bi lehengî şer dike. Nav û dengê Se’îd li temamê Kurdistanê di nav gel de belav dibe. Li gorî ku lawê Apê Ğiyaseddînê mihacirê rehmetî Apê ‘Ebdullah ji me re beyan kir. Di vî şerî de birek ji êla Hesanan penaber dibin. Ji ber Ûris direvin. Tên Kopê. Li berî berî ava muradê dikşên. Lê artêşa Ûris pêşî li wan digre. Heta hinek qîz û bûkên Hesena ji ber ku xwe ji bênamûsiya leşkerên Ûris biparêzin xwe diavêjîn **“Ava Mûradê”**. Di avê de dixeniqin. Şehîd dibin. Dibe zarîn û zûrîna jin û zarokê **Hesenan**. Di wê hengamê de dibînin ku wayê. Lehengek li ser pişta hespekî boz bi çar gav tê. Ji bin piyê hespê wî toz û duxan radibe. Êla Hesenan bi hev re dibên. **Hat!** Wa melaîketê asîmanan di hewara me de hat. Ew lehengê ku ji wan tirê melaîketê asîmana ye bi tena serê xwe li ser pişta hespê wekî ba tê. Êrîşî leşkerê Ûrîs dike. Gelek kesan ji wan dikuje û dişîne dojeha dîrokê. Artêşa Ûrîs tarûmar dibe. Û bi rev terka wî diyarî dike. Êla Hesenan jî ji komkujiyên û tecawizên Ûris xelas dibe. Piştî ku leşkerê Ûris têk diçe. Êla Hesenan meraq dikin bê ka ew lehengê li ser pişta hespê boz kî yê. Lê belê dibînin ku ew lehengê nijdevan Se’îdê Nado bi xwe ye. Bi kêfxweşî gelek du’a li Se’îd dikin.

Nîhayet piştî şerekî yeman ê di navbera Kop û Dêrikê de Se’îdê Nado û Derwêşê Ûsivê Seydo û birayê wî şehîd dikevin. Piştî Se’îd, êla Cibriyan nexasim lehengên mala ‘Elî Ağa, alaya Hecî Musa Begê Xoytî, milîsê Seyidan, alaya ‘Ebdulmecîd Begê Sîpikî berxwedanêkî wek efsane didomînin. Nîhayet di şerê Qiliçgêdûkê de leşkerê Ûris dişkê û paş ve dikşê. Di van şeran de keça Se’îd, Dilşa jî cilê zabita li xwe dike wek neferek bê xewf û tirs bi lehengî şer dike. Di nav zariyê Se’îd de bi mêrxasî û cesareta xwe kesek wekî Dilşayê tunebûye. Hem bi Se’îd re hem jî piştî Se’îd Dilşayê şopa bavê xwe meşandiye. Ji lew gel jî Se’îd bi Dilşayê daye naskirin. Ango **Dilşa bûye wek**

**nasnavê Se'îd**. Zaryê Se'îd ê din di bin siya Dilşayê de mane. Piştî ku Se'îd şehîd dikeve. Keça wî dilşayê dibê: **"Ji bo xatirê Xweda hûn bavê min di nav mezelê şivan û gavan û newêrek û revonekan de veneşêrin. Bavê min şêrvanek yekta bû. Di şer de bi tena serê xwe berdêla artêşek bû. An jî ew bi tena serê xwe artêşek bû. Ji lew hûn wî li cîkî tenê veşêrin. Li ser daxwaza Dilşayê bavê wê şêrê yekta li cîkî tenê tê veşartin. Rehma xwedê lê bibare. Ciranê pêxemberan be."**

Dîsa hêjayî bîranînê ye ku em bêjîn ğulamê Sê'îdê Nado Cindiye Dirbo, 'Ebdil'ezîzê bav File jî di şerê Ûris de bi qehremanî şer kirine. Piştî Se'îd hespa wî a bi navê gêjo (an jî lalo) jî wek gelê me li ser Se'îd ğemgîn bûye. Nexwarî ye nevexwarî ye. Ji xwarin û vexwarinê hatiye vekişandin.

Xweda Te'ala şehadeta wî qehremanî li rex xwe qebûl ke. Rehma Xweda Te'ala lê bibare. Piştî Se'îdê Nado sitranbêjên me gelek sitran li ser Se'îd hunandine. Ev herdû kilam jî ji wan sitrana ne. Ku ji hêla dengbêjan ve li ser Se'îdê Nado berxê mala 'Elî Ağa hatine hûnandin. De keremkin em guh bi din dengbêjên xwe.

*Şerê Kopê*
*Lê ağawo çûme Kopa şewtî di ber da av e*
*Lê maqûlo çûme şewtiya Kopê di ber da av e*
*Min dî Bavê Qereman siwarê têcir*
*Fena cara siwar bû hûy hû hû bi xwe da nave*
*'Evdal im 'evdal im 'evdal im siwaro*
*Ez 'evdal im 'evdal im 'evdal im siwaro*
*Birîndara siwarê mala bavê xwe bi tenê me*
*Wayê wayê waaa...... Ax wax û waa...x*
*Gidî dema li Bavê Qereman siwarê têcir*
*Dibû pêsîr tengî ya di mêra*
*Bira di hewariya Bavê Qereman de bihata*
*Mêrê mêrxas peyekî bi nav zirav e*
*'Evdal im 'evdal im 'evdal im siwaro*
*Ez 'evdal im 'evdal im hûy hû evdal im siwaro*
*Birîndara siwarê mala bavê xwe bi tenê me*
*Wayê wayê waaa......ax û wax ay ay.........*
*Ağawo şerekî li me çêbû*
*Li orta Kopê li dêrikê hê ê hê ê....... . êw*
*Ê hû hê hê ê hê ê.......... . hê ê bi qewax e*
*Şade şûdê bavê dilşayê li dinyayê pir gelek in*
*Firqekî 'eskerê kafirê Salîm Osko*
*Îro ji êvar de rakirye ji Kopê hê, ji topraxê*
*Min dî ji gavê din de kokê ji wê de dihat*
*Li çokê xwe dixist gelo digriya*
*Heywax li min ê hê û hê û hê, bi waxe waxê*
*Digo cindî: Korayî bi herdû çavê min û te de hatî*
*Derbekî gawir li bedena Bavê Dilşayê ketiye*
*Tu sêr bike cinyazê bavê dilşo li ser gêjo tê ax û ax*
*Bê Seî'd herê ê hê û hê û hê.. hê ku riya dîn e*
*Bi gotinê 'alim û kitêba*
*Dibên herçî kesê gula wî ji pê re lêkeve*
*Hewî gidî xalis şehîd e şik û şubhe ji bonê tunîne.*
*Wayê wayê ...ax û wax û wax ha hî ha ha.... a ay*
*Axawo şerekî li me çê bû*
*Li orta Kopê li Dêrikê hê ê hê ê....... . êw*
*Ê hû hê hê ê hê ê.......... . hê ê li bilind ciya*
*Şade şudê Bavê Dilşayê li dinyayê pir gelekin*
*Firqekî 'eskerê kafirê salîm osko*
*Îro ji êvar de rakirye ji Kopê hê û hê.... ji mewziya*
*Min dî ji gavê din de kokê ji wê de dihate li çokê xwe dixist*
*Gelo bi axe waxê hê û hê û hê.... . hê digiriya digo:*
*Cindî koranî bi herd û çavê min û te de hatî*
*Derbeke gawir li bavê dilşayê ketiye*
*Hînga min zanîbû*
*Ûrtu ocağê mala 'Elî Ağa ji dinê ê hê û hê...hê di qeliya*
*Bê Se'îd herê ê hê û hê û hê hê ku riya dîn e*
*Bi gotinê 'alim û kitêba dibên:*
*Herçî kesê gula wî ji pê re lêkeve*
*Hewî gidî xalis şehîd e şik û şubhe ji bonê tunîne.*
*Wayyê wayê ...ax û wax ha hî ha ha .... ay ay û wax*
*Eman eman eman....... . eman emaaa...n*
*Gidî bira li me nata sira sibê*
*Gelo vê sibengê bîna bakê Bilanixê*
*Reben ezim vê sibengê gêjo di bin bavê dilşê de*
*Ne dixawr e ne di meşe, tu sêr bike gelo kefê davê ser selixê*
*Gidî gava berê bavê dilşayê dane Erzeroma şewitî*
*Li Taşaxane Erzeroma şewitî*
*Ez ji te re sond bixwim çiqas qumandarê dewletê hene*
*Temam vê sibengê li qarişî bavê dilşayê sekinîn*
*Hewar ezim bi resmî sekinîn ji xwe re li selamlixê*
*Eman eman eman.... Eman ax eman eman... curnalî çetine*
*Gidî gelo curnalî çetine, ji xeyrî bavê dilşayê*
*Bira kevir û kuçik nebîne, kesek li ber neskine*
*Eman eman... curnalî çetine*
*Gidî sibeye vê sibengê*
*Bira li me nata sira sibê*
*Bîna bayê melûl li malê*
*Tu sêr bike bê xwedyê gêjo*
*Vê sibengê di bin bavê dilşayê de*
*Ne di meşe ne di xaware*
*Hewî gidî gelo vê sibengê rabûye ca dort nalê*
*Dema berê bavê dilşayê dane Erzeroma rengîn*
*Tu dêna xwe bidê ciqas qumandarê dewletê hene*
*Temama sikinîn li qarişî Bavê Dilşê ji xwe re li selamlixê*

*Ez ji te re sond bixwim*
*Gava berê paytuna Bavê Dilşê dîsa vê sibengê dane malê*
*Tu sêr bike cotê bûkê ser bi xêlî derketine pêşiyê*
*Hele bala xwe bidê gelo bi hev da reş girêdan*
*Bala xwe bidê li bejn û balê*
*Eman ema…. Eman ax eman eman… Curnalî çetine*
*Gidî gelo curnalî çetine, ji ğeyrî Bavê Dilşayê*
*Gidî gelo bira kevir û kuçik nebîne, kesek li ber nesekine*
*Eman eman… Curnalî çetine ha hî ha hû ha ha…. Wayê wayê wax*

**_Ağawo Şer Girane Li Kopê Li Dêrikê_**
*Ağawo şer girane*
*Li kopê li Dêrikê li deşta Xanoğliyê hey hê û hê lo li mila xetê*
*Girane 'eskerê vî kafirê salîm osko xwe berdaye li deşta Xanoğliyê*
*Qazaxê wî kişyan li dorê hê hê hû hê lo kevan ketê*
*Min dî Se'îdêNado Bavê Dilşayê siwarê lalo*
*Bi ser ordiya vî kafîrî de hê hû hê hê lo qîrîn dike tê*
*Bi sê denga dikir gazî*
*Li Xalit Begê Cîbirî*
*Li Hecî Mûsa Begê Xoytî*
*Li 'Ebdûlmecîd Begê Sîpikî*
*Digo: Lawo! Hûn beşera ber dilê bavê min in*
*Heyla lawo bi hevdû re lêxin*
*Rojê ewha meriv qezenc dike heftê Horiya tevî qesr u qonaxê cinnetê*
*Hê hû hê hê li min dîlê*
*Lê hetanî nîvro dem û dewran dewarana bavê dilşo bû*
*Ji nîvro bi şûnde kelek û gemiyê vî xweş mêrî li asîmana sekin ketê*
*Le Se'îdêNado tu sêr bike bi şeş gulê tometîka vî kafirî birîndar e*
*Cinazê wî li ser pişta lalo, lalo ber bi malê hê hê hê lo ber bi me tê*
*Hê hî hê hê  Li min dîlê wayê wayê waay*
*Perîşanê digo: Cindiyo tu sêr bike*
*Tu rabe em herin pêşîya Seîdê Nado Bavê Dilşayê*
*Emê bikin du rik'et limêja sunnetê*
*Le belkî Xaliqê 'alemê bide Se'îdê Nado Bavê Dilşayê qewet û nusretê*
*Evî gawirê salîm osko bişkêne*
*Dînê me weyne li ser şerî'etê*
*Heyla berxê bavê mino lêxin lo riya dîn e*
*Bi gotinê şêx û 'alima*
*Eger em wî bikujin em ğazîne*
*Eger ew me bikuje li cinnetê em şehîd in lo rutbelîne*
*Le Xudayê min zane 'ezabê qebrê sikrata mewtê lo ji bo me tunîne*
*Oy oy…. . oy hê hû hê hê hê hû hê hê…ay ay*
*Ağawo şer giran e*
*Li kopê li dêrikê li deşta Xanoğliyê heyla bira li mila xetê lo bi du ciya*
*Girane qazaxê vî kafirê salîm osko*
*Mewzî girêdane hê hû hê hê lo li serê çiya*
*Se'îdêNado siwarê lalo*
*Bi ser ordiya vî kafirî de hê hû hê hê. . lo diqîriya*
*Bi sê denga dikir gazî*
*Li Xalit Begê Cibirî*
*Li Hecî Mûsa Begê Xoytî*
*Li 'Ebdulmecîd Begê Sîpikî digo:*
*Bavê nino lê xin*
*Rojê ewha meriv qezenc dike qesr û qonaxê cinnetê tevî heftê horiya*
*Wele şopa Se'îdêNado*
*Ji nava şopa tim beyliye fana şopa ziya*
*Ezê çi bikim hetanî nîvro*
*Dem û dewran dewarana bavê dilşo bû*
*Ji nîvro bi şûn de kelek û gemîyê vî xweş mêrî li asîmanan ji hev geriyan*
*Wele Se'îdêNado bi şeş gulê tometîka vî gawirî birindar e*
*Wele min dî çardara Se'îdêNado*
*Li ser pişta lalo lalo ber bi malê hê hû hê hê… lo hûr meşiya*
*Perîşanê digo cindiyo*
*Tu rabe emê xwe berdin pêşya çardara Se'îdêNado siwarê lalo*
*Min dî xwîna xirav kiriye*
*Şapik û şalwarê Felemezî*
*Le kostaka si'eta zîvîn*
*Dilopê xwînê niqitî lo li ser zik û zengûya*
*Perîşanê digo:*
*Cindiyo hewar dikim lo hewar nayê*
*Berxê bavên min lawo lo gazî dikim lo gazî nayê*
*Hewar û îmdada me*
*Li jorê Xaliqê a'lemê Rebbê jorîn û Bavê Fatimayê*
*Li jêrê ji me re kîngê bê hewara Se'îdêNado siwarê lalo Bavê Dilşayê*
*Hê hû hê hê hê ay ay ax û ax û waaa …. . xe*

**_Gelî xwendevanên hêja!_**
*Li vir rêzenivîsa me a li ser sitranên nêzdîroka me a benda heşta jî bi dawî bû. Bi rastî me dixwest ku em li ser Se'îdê Nado bi dirêjî bisekinin. Lê di vî warî de hem cihê me kêm hem jî li ser Se'îd pir belgeyên qewî bi dest me neketin. Xweda Te'ala ji wan dengbêjên ku li ser Se'îd û şerê Ûris sitran çêkirine razî be. Em bi saya sitranên wan ji wî şehîdê nemîr, şêrê mala 'Elî Ağa agahdar dibin. Me di vê rêzenivîsê de ji dengbêj **Şakirê Qereyaziyê** û dengbêj **Kekê 'Îsa** îstifade kir. Dîsa me ji pirtûka **Ahmed Aras** a bi navê şerê seyidan û berazan û "Hatirayên Cîgerxwîn" îstifade kir. Daxwaze me ji xwendevanên me ew e ku vê pirtûka Ahmed Aras bixwînin. Lewra di wê pirtûkê de hinek agahî yên balkêş hene. Dîsa em ji ber agahiyên wî ji lawê Ğiyasedînê mihacir Apê 'Evdila Oğut re sipasdar in. Ku malbata wan bi xwe jî meğdûr û mihacirê herba Ûris e.*
*Heta jimara dî bimînin di xêr û xweşîyê de. Sipartî xweda bin. Em ji we re du'adarin. Ji du'ayên we hêvîdarin.*

# Dema cotkariyê

✍ **Dilevîn Botî**

Bihar e; amadehî êdî bona cotkariyê ye. Herkes gêsn û halet, nîr û misasên xwe saz dikin, li hêviya rehma Xweda li hêviya baranê dimînin. Çağê baran têr dibare tirbîs diçe êdî her kes dest bi karên cot dike. Şilî û serma û herî perçeyeke ji heyata gunde êdî. Bûna cotkarekî; ga weke ferdekî ji malê têtе hesibandin. Cotkar dikare birçî bimîne belê gayê cot lazime her daîm têr be. Roja yek here cot ji êvarê de ka û kizin û giya; bi şîv û paşîv û taştê, gayên cot têr dike. Piştî nimêja sibehê cotkar bertaştê toyê li ser mast dixwe, radibe kerê kurtan dike, li aliyekê nîr û halet, li aliyê din tûrê tov û xwarin û vexwarin û ava destnimêjê bar dike diçe zevîyê.

Hecî Hesen rîsipiyekî gund e. Zor û zehmetiyên bi sala di rû yê wî yê qemihayî û qermiçî de xwiya dike. Ğezal jina Hecî Hesene. ‘Elî û Ahmed herdû lawên Hecî Hesen in. ‘Eli zewiciye û çend zarokên wî jî hene. Belê Ahmed hê jî bê zewac e.

Gundî şevên xwe ên sar û dirêj bi şevbihêrkan derbas dikirin. Hecî Hesen piştî nimêja ‘işayê diçe şevbihêrkê. Belê îşev ji civatê zû radibe û tê mal. Gazî zaryên xwe dike û tev lê dicivin; dibên keremke bavo.

**Hecî Hesen:** Hûn dizanin eva mehek zêde ye gundê me û gundên der û dor tev bi pez û dewarên xwe derketibûn ji bona du’a baranê. Şikur ji Xweda re hûn dibînin lehî rabûn û rehmeta Xweda têr barî, tirbîs çû êdî dema cot e. Sibê rabin herin cotê xwe, tovê xwe bireşînin û tewekkula xwe bidin ser Xwedayê xwe.

Sibehê bi tavê re Ahmed dest bi karê xwe dike, taştê dixwe, kerê xwe kurtan dike, qûş û paldem û tenga lê dişidîne û li aliyekê nîr û halet li alê din tov û av û xwarina xwe lê bar dike û bi werîs baş dişidîne û berê xwe dide zeviyê ji mal birê dikeve. Hê çend gav neavêtibû paş wî de ‘Elî dibê Ahmed Ahmed; kekê min êvarê di vegerê de nîr û halet ê xwe li zeviyê bihêle û bûna şewatê barekê êzing li kerê ke bêne da em xwe li ber germ kin. Tu dizanî hê jî serma didome…

**‘Elî:** Hindik mabû min jibîr dikir ev tewsiya bavo; ***hûr*** *bajo,* ***kûr*** *bajo û* ***pir*** *bajo û gayên xwe jî newestîne*. Ahmed; dengê xwe nake belê ev gotin lê ne xweş tê. Bê xwestek serê xwe dihejîne û ji xwe re wiha mijûl dibe; hûr… kûr… newestîne… êzing.

Aaaxx ax *xwezîka ez* ***kûçikê*** *sa bûma ne* ***kiçikê*** *bira bûma*. Yan jî *ez têjikê* ***marê*** *bûma ne biçûkê* ***malê*** *bûma*. Heval û hemkûfên min tev zewicîne û zarokên wan jî çêbûne belê ji bona zewaca min kesek dengê xwe nake. Dayika min carna behs dike, lê kesek guhdarî nake. Belê ji bona xebatê Ahmed keko ye. Cotkarî Ahmed… Gêrevanî Ahmed… Şivanî Ahmed… Aşvanî Ahmed… Ahmed here wê derê… Ahmed were vê derê. Çi kar û xebatên giran hene li ser milê Ahmed e. Şeytan carna dibê van herdu ga an bifiroşe û serê xwe hilde û here




Kelhaamed

cihekî wisa kû kesek cihê te nizane. Lê belê ji kerba dayika xwe ez nikarim… Le'net li çavê şeytan.

Bi van ğem û xiyalan Ahmed gihîşte zeviyê û dest bi karê xwe dike. Barê li ser kerê datîne û kerê berdide çêrê. Gayên xwe binnîr dike û halet bi nîr ve girêdi de. Hoo ho… Hoo ho… Ez heyrana milên te (bûna gayê sor) hoo ho… hoo ho… Ez qurbana milên te. (bûna gayê reş) Li serê zeviyê xetekê dikişîne û deh gav wê de nava zeviyê xetek din jî dikişîne û li hafa zeviyê gayên xwe disekinîne. Tûrê tov davê milê xwe bîsmîllah; genimê xwe direşîne û wiha dibê; ya Rebbî bereketê têxê; ya Rebbî bereketê têxê.

Çend heb çivîk li dora wî datînin û ji tovê hatî reşandin dixwin. Ahmed radihêle kevirekî bona çivîka bifirîne paşê kevirê xwe datîne û wiha dibêje: hûn jî qismetê xwe dixwin. Ger hûn nexwin û Xweda jî nekiribe qismet ew şîn nabin. Dibe ku bereket bûna xatirê we be.

Heta danê nîvro cotê xwe dike û bûna bêhndanê gayên xwe ji nîr difilitîne û berdide çêrê. Li hafa zeviyê li ser kevirekê nimêja nivro dike û xwarina xwe dixwe. Piştê xwarinê li xwe dihese kû pir betiliye. Dixwaze tûrê xwe deyne bin serê xwe û hinekî raze, belê dizane xew ne karê cotkara ye. Radihêle bivirê xwe û li hafa zeviyê ji dara hişk çend şeqa jê dike, hûr dike û barê kerê amade dike. Rudine li ser kevir bêhna xwe dide û dikeve xeyalên kûr… bi dengê dayika xwe ji xeyalên xwe yên kûr şiyar dibe.

**Ğezal:** Ahmed Ahmed…

**Ahmed:** Te xêre dayê.

**Ğezal:** Lawê min kerê te hatibû mal, min kerê te anî û bûna te min çay jî anî… La…

**Ahmed:** Dayê te yê tiştek bi gota?

**Ğezal:** Belê qurbana lawê xwe bim. Deka tu çaya xwe vexwe, ezê ji te re bêjim.

Lawê min; tu dizanî bûna te min dixwest qîza xaltîka te bixwazim, belê bavê te ne dixwest. Min û kekê te 'Elî bi zorê me bavê te razî kiriye. Vêca bi vê hêcetê ez hatim mizgîniyê bidim te.

Ahmed: Tu bi xêr hatî dayê, mizgîniya te ya xêrê be. Di vê malêde ji ğeyn te ê min fêm dike nîne. Vê zor û zehmetiyê bûna te ez dikşînim. Ka rûne. Jixwe cotê min jî hindik maye ez biqedînim em tev de herin mal.

Ğezal: Na ez nikarim rûnim. Lazime ez herim, bûna xwazgîniyê amadehiyê bikim.

Ahmed: Dayê; wê çaxê ezê êzinga li kerê bar bikim ji kerema xwe bibe mal…

Ahmed cotê xwe diqedîne û vedigere mal. Bi vî hawayî karên gunda dewam dike…

# Te'ziya Dadê Rana

إِنَّا لله وَ إِنَّا اِلَيْهِ رَاجِعُونْ

*Wefata Te Bi Dil Şewat e… Lê Wefata Te Yê Bi Hesreta Kurê Xwe, Hê Dilşewattir e*

✍ **Selamiyê Bilêderî**

Bi sehkirina wefata te, dilê meyî zîz şewitî. Me sitêrkê çav û dila herikand. Wê rojê zîndan li me hê tarî bû.

**Dadê Rana!** Xwedayê meyî pir bi rehmet û şefqet, rehmê li te bike! Li Cennet-ul Fîrdewsê te bike cîranê Resûlê Ekrem 'Eleyhîsselam û Hezretî Xedîce û Hezretî Fatîme…

**Dadê Rana!** Bawer bike, te çawa di radyoyê de digot: *"Hûn (Yûsifî) tev weke Îhsanê min in."* Me jî weke Îhsanê te ji te re digot *"Dadê"*. Me weke diya xwe ji te hez dikir. Nexasim gava her heftî di radyoyê de te digo: *"Îslam zafer bo! Quran hakim bo!"* Nexasim piştî ku me te naskir… Tevlî 'emrê te heftê û heşt sal bû, belê ji ber teqwa û heya te yî weke yê sehabiya, te hê jî xwe çarşef hîcab dikir… Tevlî îxtiyariya xwe, te dersa Quranê dida zarok û pîreka… Tu digihîştî kîjan pîrekê, te wesyeta hîcab û tesetturê li wan dikir… Hewqas mûsîbetê giran hatibûne serê te… Zilamê te wefat kiribû… Şêrînê ber dilê te; Îhsanê te hijdeh sal bû di hepsê de bû û hijdeh sala te tevlî wê ixtiyariya xwe û nexweşiyên xwe, diçûyî ziyareta wî. Digel ewqas musîbeta jî, te xizmet û teblîğa Îslamê û xizmeta muderrîsiyê terk nekir… Ma çawa Yûsîfî ji te heznekin… Çawa li ser te negrîn û çawa ji te re xitma nexweynin.

**Dadê Rana!** Gava di televizyonê de xebera wefata te hat gotin û wechê te yê mubarek û xeberdana te yê bi dilşewat nîşandan… Ku te digot: *"Gava Îhsanê min surgunê Bayburtê kirin, tiştek ji nava qetiya. Ezê hew karibim wî bibînim."* Ha wê hingê bi xebera wefata te tiştek ji nava me jî qetiya.

Tenê teselliya me ew e ku; tu çûyî hizûra Rebbê meyî ku rehm û kerema wî, ji rehma teyî li ser Îhsan milyar cara zêdetir e û ew Rebbê me, nexweşî û bela dide 'ebdê xweyî ku zehf ji wan hez dike.

**Dadê Rana!** Dîsa jî… nizanim çima, çi çaxî tu werî bîra min, çavê min tijî dibin. Belkî, ez jî weke Îhsanê te bîst û du sal e ji diya xwe dûr im û min zehf bêriya wê kiriye, loma… Belkî jî di hepsê de zehf dilzîz bûme… Ez nizanim… Tiştê zanim, kezeba min û ê hevalê min zêde li ser te şewitî. Û ez bawerim muminê li ğurbeta û muhacir jî zehf bi wefata te yê bi mezlûmtî êşiyane.




# Hinek "Tirb" û "Qubên" Me Yên Meşhûr

✍ **Ferhad Bagasî**

Bi navê Xweda selat û silav li ser qenctirînê mexlûqên Xweda be. Hemd û şukur; tev de em gihîştin jimareke nû. Xweda me bighîne gelek jimar û mijarên nû. Belê me Çile derbaskir û em derbasî biharê bûn. Çile tu dibê qey pir rehet derbasbû û weke her çilehî me di pişt xwe re berda? Na xêr! Pir bi şewat derbas bû bi taybetî jî ji bo xelqê Wanê. Xweda alîkarê wan be. Dibin wê qeşem û seqem û cemedê de… Xweda me teva biparêze ji bela û mûsîbeta. Amîn.

**Gelî Birayan!**

Weke ku ji sernivîsa me jî tê fêmkirin emê di vê mijarê de behsa hinek tirb (mezel), qub û ziyaretên meşhûr bikin. Bi rastî em bi temamî xwe naxine nava mijarê. Emê bi kurtahî, sere sere herin. Heger em xwe têxine navê em ji nav dernakevin. Emê tê de ğewr bibin. Bê ferq û meyl emê hineka mîsal bidin. Tev li ba me qencê Xweda ne, şêx û meşayîx û rêzanê me ne. Bêguman sebebê ku însan, jiyan, dîrok û medeniyet ji vê axa ha dest pê kiriye, Bi rastî ji her alî de pir zêde dewlemend e. Di vê axê de pir edîb û 'alim, şa'ir, şêx û meşayix, mucahid û rêzan hatine. Weke Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran, Seyyid 'Eliye Findikî, Melayê Bateyî, Ustad, Şêx Se'îd û 'Atif, Şêx Fethullah û Şex Xelîlê 'Eynkafê…

Qedr û qîmetê wana li ba gelê me nayê hesabê ji wê awayî piştî wan jî millet wan jibîr nekir û tirb û qubê wan kirine ziyaretgeh. Her çiqas hinek însan wan bi niyet û ğayeke din dabine naskirin jî ji me re; ewana rêber û rêzanê me muslumana ne. Gelê me ji wan re dest daniye ser destekî û ji wan re hurmetkar e. Ji wî awayî her serê gund û bajarekî go tu heriyê tê rastî dîrokekê bibê an jî tirb (mezel) qub û zîyareta 'alimekî be. Gelê me bi van nîşana qedr daye wan û nayêne jibîrkirin. Emê bi kurtahî behsa hinek tirb, qub û ziyaretê der û dorê xwe bikin. Ka vêga di çi halî de ne? Millet bi çi awayî teweccuha wan dikin? Bi rastî di derheqqê wan de me'lûmat





Quba Şêxê Zîla

bi zimanê bav û kalên me hatine. Lê belê me'lûmat di derheqê hineka de hene; ew jî bi kêmasî ne.

Li der û dorê Batmanê li Kercosê, li ***"Bêcirman" "Tirba Seyîd Bilal"***, Li nav "Rema" ***"Tirba Şêx Atman"***, li çola "Hesarê" li nava ***"Hebizbiniya" "Şêx Siltan" "Ziyareta Paçik"*** û ya ***"Bawiya"***, li "Bagasê" ***"Keçka Bagasê"***, li Batmanê rojavayê Rema li rexê "Bêda" ***"Keçka Kedîşkê"***, li ***"Çiyayê Qîra" "Kanîrewa"***. Li "Heskîfê" ***"Quba Zeynel Beg"***, li Qozlix (Hezo) ***"Quba Şêxê Zîla"***, li nava Batmanê ***"Mezelê Şîn"***(Resul el Îluhî), li Mêrdînê ***"Tirba Siltan Şêxmus"***, li rexê me bi van nava nav danîne. Li hêla Çinara Diyarbekir ***"Tirba Şêx 'Ebdurrehmanê 'Aqtepî"***. Li "Sêrtê" ***"Tillo"***: ***"Quba Weys"***, quba ***"Şêx Mucahîd"***, ya ***"Îbrahîm Heqqî"***…

Li Amedê ***"Şêxên Altoxar"***, li Qulpê **"Şêxên Duderya"**, li nava Amedê ***"Camiya Hz. Suleyman"***. Ê wiha bi hezara hene bi nav û deng. Hin jî hene tirb û qubê wan nexuyane. Tirb û qubê wana di dilê me de ne.

Yên ku merqedên wan di dil de ne Şêx Se'îd, Ustad û 'Atifê Îskîlîbî. Weke ku şa'ir dibêjê: "*Merqeda we-j me veşartin, da ku em we jibîrbikin / Lê nizanbûn bûn me-j were dil kirye merqed Ey Şehîd"* Çiqas jî tirb û qubê wan ji me re nexuyabin jî li ber çav û dilê me ne her dem. Ku yek bigere li der û dorê xwe li serê çol û çiya, gund û bajarê xwe ciyek tine ku qencekî Xweda lê ne razayî be. Serê sirtekê, banikekî, guharekê, mesîlekê, zinarekî û fetlekê… Der û dorê wan dane hev û kevir kirine. Bi navê wan nav kirine.

Gelê me ji miriyên xwe re jî pir hurmetkar in. Ciyê miriyên xwe kirine ziyaretgeh, weke çavê xwe li wan dinêrin.

Her serê gundekî yek, dido, sisê, çar ziyaret hene. Ji bonî parastina wan der û dorê wan sênc kirine. 'Adetê baş jî her sal tevlî seydayê gund diçine ber piyê ziyaret û qubê xwe. Xwarinê çêdikin, li hev belavdikin, du'a dikin û belavdibin. Ev jî dibe wesîla têkiliyê. Di nav gelê me de ber piyê ziyaretê ağlep di nav sê mehê payîzê de lidardixin. Li ber piyê ziyaretê gelek du'a, şîret dihate gotin. Ev qub û tirbeyên ku me ji we re gotin jî: salewext diçine ber piyê wan. Xweda me bide xatirê wan.

**Xwendevanên Hêja!** Heta vê derê ez bawerim ku we ji me fêmkir. Tiştê ğerîp êdî wê nû dest pê bike. Ev 'adetê me çiqas ber bajara ve tên li gora gunda kêm dibin. Çiqas wext derbas dibe ku em xwedîtiyê li çanda xwe nekin, emê li gora çandê şaş jiyana xwe bidomînin. Li ber tirb û qubê wan: Yasîn û du'a dihatin xwendin. Ê vêga tiştê ğerîb dibêjin. Qub û mezel, mizgeftê dîrokî kirine ciyê kêf û reqsê û kemaçê. Hinek jê pera davêjine ser mezel.

Diçine ser tirbê wan bi def û zirne û kemaçe. Hinek bûne ciyê qîz û xorta ku hevdû birevînin. Bûye ciyê gezmağê nexweş û bawîya, ciyê medeta însana. Ev jî tabloyeke hezîn e. Ziyaretin jî tev terîş û paçik in, hinek jê kirine ciyê mifta û ciyê mirada. Her ziyaretek û tirbek û qubek bûye careserî ji bonî derd û kulên wan. De ka were vî şuğlî ji hev safîke! Tu çi dibêjî û millet çi direqise. Xweda me şaş neke.

**Xwendevanên Hêja!** Em hatine dawiya mijara xwe. Heta jimareke din di xêr û xweşiyê de bin.

# Ê Xelkê Sor û Zer e


✍ **Mamoste Farûqê Çiyayî**

Bîsmîllahîrrehmanîrrehîm

Em pêşî pesnê Xwedayê mezin û bê heval didin. Ê ku demsala li pey hev digerîne ew e. Ji wan a yek, dema xwe şaş nake. Mînak, di piştî buharê re, payîz an di piştî payîzê re havîn, an di piştî zivistanê re disa payîz nayê. Her yek ji wan, dema xwe diborîne û dorê dide ê di pey xwe re. Ev tişt jî nîşanek ji nîşanên hebûn, qewet û qûdreta zatê zulcelal e. Di heman demê de, vejîna xwezayê (tebî'etê) ê di bihara rengîn de, di piştî hişkbûn û mirina wê, ê di zivistanê de jî, nîşanek ji nîşanên hebûna axretê ye ku di piştî mirina xwe re her mirovek, dîsa ewê bête sağkirin û here hizûra Xweda Te'ala û hesabê kirinên xwe yê li ser rûyê erdê ewê bide. Bi rehma Xweda Te'ala, ewê li gor kirinên xwe, xelat an jî ceza bigre ku ew jî bihişt an jî dojeh e.

Di piştre re jî em selamên xwe yên taybet, ji Qasidê piroz, pîrê 'eşqê, rêber, rêzan û serekê ummetê, pêşîvanê rêka bihiştê, xwediyê Hewdê Kewserê, bavê Fatîmayê, Cenabê Hezretî Muhammed Mustefa re dişînin.

Emma di dûv re gelî xwendevanên qedirbilind, di demsalek nû, demsala biharê de, em bi hevdû re ne. Ev heye şeş meh buhirîne ku em ji hev bi dûr ketibîn. Lewra di jimara zivistanê de, nivîsa min negihîştibû ku ez rêkim û bête weşandin. Ji ber vê yekê ez, lêborînê dixwazim. Min hêvî heye ku hûn, malpera me ya Înternetê ku **www.bangaheq.net** e bişopînin, hûnê karibin bi hêsanî me di wir de bibînin.



Dilê min heye di vê jimarê de ez ji we xwendevanên ezîz re behsa Mihê û Apê Temo bikim. Wek ku hûn jî dizanin, di biharê de çawa ku sirûşt (tabiat, doğa) xwe nû dike, xwîn û laşên mirovan jî wiha rengê xwe nû dikin. Di piştî betlana (tatil) zivistanê re, dema kar û xebatê jî dest pê dike. Belê kar û xebat, giran bû û mirov zaf zêde diwestandin. Ji bo mirov bikaribin wê kar û xebatê pêk bînin, lazim bû ku mirov xwarinek baş bixwin. Îcar heke me gotibe xwarinek baş jî, lê ne wek ê Apê Temo. Ji xwe Qasidê pîroz 'Eleyhîsselam ferman kiriye ku *"Xewa zêde û xwarina zêde qelban dikujin"*. Hûn dikarin bibêjin *"Ma xew li wan rebenan çi dikir?"* Heqê we heye. Bi şev heta sibehê li nav pez bûn, bi roj heta êvarê li karê erd û rez û wekî din bûn.

Rezzaq Xweda ye lê meriv dibêje heke ne bi vî rengî xebata wan ba, ewê nikaribûn debara xwe bikirina. Belê lazime mirov heqê wan jî nexwe. Ji xebata dinyê re çiqasî jêhatî bûn, ji ta'et û 'îbadetên xwe re jî ewqasî jêhatî bûn. Dema nimêjê bihata, ew li ser çi karîbana ew karê xwe betal dikirin û berê xwe didan Xwedayê xwe. Remezan bihata, ne tu şert û merc, ne jî tu şuğl û xebat, ew ji girtina rojiyê bişûnde nedihiştin. Weke mirovên demî, ji bo 'îbadet nekin, hezar 'uzr û me'zeret rêz nedikirin. Jêhatî bûn, bikêrhatî bûn, wêrek bûn, mêr bûn, camêr bûn.

Em vegerin ser Apê Temo. Ew jî weke mirovên dema xwe bû. Him ji dinya xwe re û him ji axreta xwe re gelekî jêhatî bû. Îcar sibehek ji sibehên Adarê, ku ji êvarê heta destê sibehê, berf, şilope û baranê dor dabûn hev û barîna xwe betal nekiribûn, Apê Temo rabû destek kincê efendîtî û kumsoriyê li xwe kir, berê xwe da qezê, mala Mihê. Mihê, lawê birakê wî, Rehmetiyê Hecî Bedir bû. Bi xwe xortek gelek çavfire û camêr bû. Qedrê dostên bavê xwe jî gelekî digirt. Zêde zêde jî mêvan û gêdan di'ezimandin.

Sibê serê sibê, hê nû roj xweş bûye, dema nimêja Duha Apê Temo, li deriyê Mihê xist. Mihê şaş ma. Tu cara di vê se'atê de kesî li deriyê wî nexistibû. Rabû çû derî vekir. Dema nêrî ku Apê Temo li ber derî ye, şaşiya wî li hev du qat bû. Apê Temo, pir zûde ye ku nehatibû mala wî. Bêgûman pirsgirêkek wî yê pir mezin ewê hebe. Belê heta ku meriv mêvanê xwe bi taştê neke, 'eyb e ku meriv li derdê wî bipirse. Îcar Mihê, rabû Apê Temo derbasî hindur kir, ew da rûniştandin û derbasî hêla maslê bû ku taştiya wî bîne. Beroşa şorbê jî li ser agir bi dilê te keliya ye. Bêhna qeliya di nav de meriv ji hiş dibe. Mihê rabû leganek şorbe û kevçiyek dar anî danî ber Apê Temo û çu hêla malê ku nan bine. Dema çend nanên ku nû ji ser sêlê daketine anî, nihêrî ku şorbe nemaye. Xwe bi xwe go belkî rijiyaye, nihêrî ku her der ziwa ye. Ji xwe re got *"Qey mêvanê min zêde birçî ye."* Nan danî çû şorbê bîne, vê carê nan qediyaye. Şorbe anî nan tune, nan anî, şorbe nemaye. Çend caran bi vî hawayî çû û hat. Apê Temo got: **"Elhamdulîllah. Min têr xwar. Mihê lawo xêr û bereket ji mala te kêm nebe."**

Mihê jî di dilê xwe de got: Elhemdûlîllah. Dema rûniştin qehwa xwe divexwarin, Mihê got: **"Apê Temo! Ji zûde ye ku tu ber bi me de nedihat. Gur li ku miriye? Te xêr e te ev şeref daye me? Em gelekî bi hatina te kêfxweş bûn. Îcar 'îşê te, karê te, li gund çi heye çi tune ye? Hela ji me re qala xwe bike."**

Apê Temo got: "Mihê lawo! Bi Kilamê Qedîm her tişt baş e. Lê apê te hinekî nerehet e. Ez hatime ku ez herim ba tixtor."

Mihê ma heyirî. Got: **"Apê Temo Xweda bi xêr ke! Çiyê te heye? Ka ez ji apê xwe re çi bikim? Ka ezê jî bi te re werim."**

Vegeriya ser hêla malê got: **"Hela malîno! Ka çakêtê min û qondera min, ezê bi apê xwe re derkevim."**

Apê Temo got: **"Na na. Ne ew qasî giring e. Min got vê çendê mî'da min li xwarinê hatiye girtin, ezê herim ba tixtor bê ka dermanekî, tiştekî nade min."**

Mihê sar sekinî. Te gulle berdayê dilopa xwinê ji wî nediherikî. Got: **"Apê Temo! Ez di bextê te de me tu ji wê de vegeriya tuyê rêya xwe bi min nexî!"**

**Belê gelî xwendevanên hêja!** Her tiştek usûl û adabek wî heye. Mêvantî jî bi vî awayî ye. Lazim e meriv tiştan ji usûl û 'adetên wan dernexe û neke ku xelk ji meriv re bêjin: *"Ê xelkê sor û zer e, ê te ji adetê der e"*

# Birrê

✍ Îbrahîm Êlihî

Bi îzna Xweda Te'ala em ketin demsaleke nû... Demsala biharê... Di pey Payîz û Zivistanê de ev kaînat çawa wek însanê ku rih jê here û bimre, bi carekê dimre di biharê de bi rih bû. 'Erd û dar û giya, gul û sosin û nêrgiz şîndibin. Kaînat seranser zînde dibe. Însan ji vêya kêfxweş dibe.

Di nav gelê me de çawa ku li gorî demsala 'adet û kevneşopiyên me hene, her wiha li gorî demsal û wexta leyistik û kêf û şahiyên me jî hene.

Me jî go, vaye em dikevine demsala biharê, ka pêşiyên me gava ku diketin biharê bi çi leystikî dileyistin? Em wê bînin bîra xwe û nesla nû. Bira em zanibin ku di hemû tiştî de 'adet û kevneşopiyên me hene. Di leystika de jî, di xwarina de jî di kêf û şahî û şîna de jî bav û kalên me ji me re çand û mîraseke mezin hiştine. Lê belê, em lê xwedî dernakevin. Me bi leystikê ğerîba girtiye û ê xwe ji bîr kiriye.

**Belê Xwendevanên 'Ezîz!** Berê, gava ku bihar dihat, hê ku karê gunda ê giran destpê nedikir û der û dor jî şîndibûn bi navê **"Birrê"** leystikek dihat leyistin.

Ev leyistik di nav zilam û xortên gund de dihat leyistandin. Carna jê jî temamê zilam û xortê wî gundî diketin nav leystikê dileyistin. Ya herî xweş jî Birrê ya ku bi vî awayî dihate leyistandin bû. Gava ku dileyistin, extiyar û zarok û pîrek gund jî li wan temaşe dikirin. Pîr û kala, bi zarok û neviyên xwe dipesinîn. Pîreka bi zilamê xwe, qîzikê bi destgirtî bi destgirtiyê xwe dipesinîn. Nexasim jî xortên ku bi dil bûn, ji bo ku xwe têxin çavê dilgirtiya xwe, di vê leystikê de hê pirtir xwe nîşandidan û bi hirs û azwer dileyistin.

## Birrê Çi Ye?

**Birrê:** Leystikeke ku bi du berê/taximê jimarên wan weke hev tê leyistandin. Di vê leystikê de sê 'insûrên esasî hene.

1- Ê ku direvin yanî leşkerên derve ê êrîşker.

2- Ê ku pey diketin / diqewirînin yanî: Leşkerên hundirî parêzvan.

3- Di nîvê meydan û qada leystikê de kevir yan jî qala ku tê parastin. (Pirê cara ev kevirê ku tê parastin ji bo ku bê dîtin kevirekî sipî bû. Carna jê jî ji dêlva kevir ce xêzîkek jî dihate xêzîkkirin.)

4- Berê/taximê ku direve û êrîşker dixwazin tepê li wî kevir/xêzîkî xin û pêlêkin û berê/taximê parêzger jî nehêlin ku pêlêkin.

## Şeklê Leyistina Birrê

Berê/taximê ku direve û êrîşker e piştî tev amade dibin, ji berê/taximê pêzvan re dibêjin: **"Em amade ne. Hûn dikarin pey me kevin"** leystik destpê dike.

Parêzvanên kevir ji bo ku leystikê bistînin û bi serkevin lazime temamê êrîşkeran bigrin û zeftkin. Nexasim jî ê ku bi lez û beza ne di çav xwe rakin. Lewra gava ku bi vî awayî ê beza bigrin bi rihetî hevalên wan ê dinê jî wê bigrin. Ji ber vê jî ê êrîşker, ji bo ku nekevine destê wan lazime ku bi bez û haydar bin.

Berê/taximê ku diqewirîne; lazime ku pir dehîndar be/bi dîqqet be. Lewra di nava cê leystikê de qa'îdeyeka wisa balkêş heye ku gava berê êrîşker vê qa'îdê/ hereketê bike pirê zilamê berê parêzvan wê bişewitîne û wan ji leystikê derxe. Ew hereket jî eviya ye:

Ji berê ku êrîş dike yek jê gava ku di nava zilamê diqewirînin û kevir de bazde û here, zilamê berê diqewirînin ê dûrî kevir tev dişewitin. Lê ê nêzî kevir yanî ê ku ev zilamê hana di navbera wan û kevir de derbas nebûye leystika xwe dewam dikin û naşewitin. Ji ber vê ê ku diqewirînin û kevir diparêzin lazime ku;

Hem nehêlin hemberên/ raqîbê wan werin pêl wî kevirê diparêzin kin û hem jî, ji bo wan bişewitînin pey êrîşkera kevin û wan zeftkin û

bişewitînin. Ji ber vê, berê ku direvin û êrîş dikin, ji berê ku diqewirîne û kevir diparêzin bêtir li karê ne.

Zilamê berê êrîşker, di serê leystikê de, di wî sînorê ku hatiye nîşandan de ji bo ku nêne girtin û şewitandin çiva li xwe didin û xwe naxine dest. Bi van çiv û hereketê xwe me'd û moralê hemberên xwe xiradikin.

### Berê êrîşker çiva xweyî herî mezin jî bi vî awayî tîne cî:

Bi emr û te'lîmatê serekê xwe, temamê berê/taxim yek bi careké êrîşê wê keviri dikin ji bo ku pêlê kin. Di nava wan de ê ku pir bazan e jî di vê heytehola ku ketiyê nav reqîbê wan firset dibînin. Dizanin ew jî an diçe dest dide wî kevirî û leystikê diqedîne an jî hemleyeka/êrîşeke wisa dike ku, di nava wan de derbasdibe û pirê zilamê ji berê raqîbê xwe dişewitîne. Ha ji vê hereketê re tê gotin "Bir" yanî, birandin/qetandin.

Piştî hereketa Birê, berê ku diqewirîne pirê cara yek dudo dimînin. Ewana jî xwe didine dora wî kevirî û kevir diparêzin. Raqîbê xwe nêzî kevir nakin.

Belê di vê gavê de ê raqîb jî rihet nasekinin. Wan diqeliqînin/ tehrîk dikin. Bi dengê bilind:

**Ji paş ve hat ji paş ve!**

**Lehî tê lehî!**

**Hat! Hat! Hat!**

**Kêlekê bigre Kêlekê!** Û h.w.d wan ditirsînin û bala wan didine dereka dinê. Da ku firseteké bibînin û yek ji wan here pêl wî kevirî bike û leystikê biqedîne.

### Celebên Leystika Birrê

Birrê bi du celeban tê leyistandin.

1- Bi zorê
2- Bi dorê

**Ya bi zorê;** Berê/taximê ku direve û êrîşker e, ji alê berê ku diqewirîne û parêzvane ve heta tev nêne girtin û şewitandin tim direvin û ê dinê jî wan diqewirînin.

**Ya bi dorê**; Ger çiqas ê direvin û êrîşker leystikê qezenc bikin jî piştî ku leyistik diqede vê neqlê ew têne ber kevir û ê parêzvanê kevir jî direvin.

Belê! Bi qasî ku zimanê me geriya me behsa leyistika Birrê kir. Heta meqeleke din bimînin di xêr û xweşiyê de û emanetê Xweda Te'ala bin.

# Evîndarên Pêxember

Mus'ab Nisêbînî

*Ewan xorta bi hev ra*
*Dane tekbîr û selata*
*Li meydana Nisêbînê*
*Evîndarên Pêxember*

*Nisêbîn xweş xemilî*
*Bi tekbîr û selata*
*Li meydana li civata*
*Evîndarên Pêxember*

*Gotin Allahû ekber*
*Muhammed ji mer rehber*
*Emê bêjin li herder*
*Evîndarên Pêxember*

*Bi hezaran le-v civîn*
*Ey Nisêbîn me bibîn*
*Xort û kal û zaro û jin*
*Evîndarên Pêxember*

*Şehîd Îbrahîm Xoce*
*Tu dem jibîrê naçe*
*Li ser sera ew tac e*
*Evîndarên Pêxember*

*Mizgîn li te Nisêbîn*
*Vaye rabûn Muhammedî*
*Hildan ala tewhîdê*
*Evîndarên Pêxember*

*Ey ehlê Nisêbînê*
*Dev berdin ji vê kînê*
*Welleh Xweda we dibînê*
*Evîndarên Pêxember*



# Halê Me

Mela Sadullahê Fetlê

*Teng hat li şêrê me rojek dehl û devî*
*Qut bû li ser hemû rêçik bû rizqê wî*

*Şêr go: "Piling tu çi dibêjî ka bêje me"*
*Wî go: "ew e başî em herne ji ve"*

*Şêr û piling bi hev re meşîn gihîştin*
*Deviyekî tev de heywan dilîstin*

*"Şêr" û "Piling" dîtin ku "Meymûn"ek heval*
*Hukumdarî dikit li ser gelê delal*

*Qet tenezzul bi ziman nake bibêj*
*Emr û ferman ew bi çav û biryan dirêj*

*Xwe dinepixîn her wekî şêr lê belê*
*Meymûneke hikum di dest wî tenê*

*Danişmanek boy wî heye ew "Ker" e*
*Bona rohnaiya fikrê rêber e*

*Hozanê pêş di nav wan de "Qantir e"*
*Bi nîşan "Jîjo"yê kozê boy şer e*

*"Kund" e mizgînxêrik ji bo dewletê*
*"Pepxan" ji sirra re dikêş zehmetê*

*"Beqqe" di nav avê dibêj sitrana*
*Emniyyet ket destê "Gur"ê zozana*

*Wezîrê îskana dewletê "Xilt" e*
*"Pisîk" di şahiya aşçiyê goşt e*

*Zirneçi û defçî boy kêfê "Hirç" e*
*Boy lîstikan ser benê "Fîl"ê xurt e*

*'Edalet û heqqî di destê "Rêvî"*
*Ji dewletek wiha qet neke hêvî*


*Dema şêr qoriya boy tiştê ku dît*
*Gote: "Piling ma rast e ev tiştê min dît"*

*Piling go: "Ya Seyyîdî heqq e rast e*
*Tevvekê tiştê ku dike ev xelq e*

*Nîne hemû tiştê tu dibînî ğerîb*
*Çikû em in mêvan di dewletek 'ecîb*

*Hozanê helbestê Muhammed Esmer*
*Fetlewiyê jar e bo te kir werger*





# Milliyeta Musbet û Ya Menfî

**Bedîuzzeman Seîdê Kurdî**

**Meseleya Çara:** Milliyyeta musbet di heyeta îctîma'î de (civakî) ji îhtiyacê tê; sebebek (sedemek) ji sebebê alîkarî û mildanheviyê ye; quwweteke (hêzeke) bi feyde peyde dike, ji zêdekirin û zeximkirina biratiya Îslamî re dibe wasiteyek.

Ev milliyeta musbet divê ji Îslamiyetê re xizmetkar be, divê kelih be, divê zirx be. Divê derbasî ciyê wê nebe. Lewra di biratiya Îslamî de hezar biratî hene; di 'alema beqayê de (axîretê) û 'alema berzexê de (gorê de) didomîne. Ji ber vê yekê biratiya millî çiqas zexm jî be, dibe ku jê re bibe weke perdeyekî (cilekî) yana avakirina wê (biratiya millî) di ciyê wê de (biratiya Îslamî de); 'eynî weke kevirên kelehê, bêne danîn di cihê xezînên elmasên di kelihê de û elmas bi derve ve bêne avêtin. Ev kirin texlîtek ji texlîtê cînayetên ehmeqiyê ne.

Wezyet ev e ey ehlên Quranê ewladên vî welatî! Ne şessed sale, belkî ji zemanê 'Ebbasiyan ve we hezar salî beyreqdariya Qurana hekîm kiriye, we meydan ji tevê cîhanê re, xwendiyê, we Quran î'lan kiriye. We milliyeta xwe ji Îslamiyetê re kiriye keleh, we dengê tevê cîhanê birî, we gelek êrîşên wanî dijwar berepaş vegerandine. Bi awakî wilo mirov dibêje qey ayeta:

يَأْتِى اللّٰهُ بِقَوْمٍ يُحِبُّهُمْ وَيُحِبُّونَهُ اَذِلَّةٍ عَلَى الْمُؤْمِنِينَ
اَعِزَّةٍ عَلَى الْكَافِرِينَ يُجَاهِدُونَ فِى سَبِيلِ
اللّٰهِ وَلَا يَخَافُونَ لَوْمَةَ لَائِمٍ

*“Wê Xweda di pêş de qewmekî bîne, ku ew ji wan hezdike û ew jê hezdikin, di hendava mumîna de zelîl in (perşikestî ne) di hendava kafira de ‘ezîz in (serhildayî ne) diriya Xweda de cîhadê dikin, ji lomê lomekeran natirsin…”* (Maîde 54) derheqê wê de hatiye.

Vê gav ji bonî hun nekevine ber hukmê serê ayetê, divê hun dûr bisekinin û bitirsin ji çûna li pey xap û hîlên Awrûpa û munafiqên firengmeşreb (Firotî û Xwedî Fikrên Awrûpa)!

Halekî balkêş e! Di nav qewmên musulman de milletê Tirk tevî ku yê ji teva zêdetir ew in jî, li kîja aliyê dinyayê Tirk hebin musulman in. Weke wan qewmên din, li musulman û ne musulman nehatine parvekirin. Li ku derê taîfeyek Tirk hebin musulman in. Tirkên ku ji Îslamê derketine yan jî musulman nebûne (weke Macara) ji Tirkîtiyê jî derketine (xwe Tirk hesab nekirine). Hal û hal qewmên piçûk jî (ji qewmên musulman yên ne Tirk) musulman û ne musulman hene.

Ey birayê Tirk xisûsî tu dîqqet bike! Milliyeta te tevlî Îslamiyetê bûye. Tu nikarî jê veqetînî. Tu jê veqetînî (tê milliyeta xwe) mihû kî! Di derbasbûya te de (dîroka te de) îftîxarên te (pesindariyên te) derbasî deftera Îslamiyetê bûne. Ev pesindariyên te, di halê bi tu hêzê ser rûyê erdê nehatine mihûkirin, tu weswesên şeytana û dekên wan pesindariya ji qelbê xwe navê (nemehîne)!

**Mesela Pênca:** Li Asya qewmê ku şiyarbûne, xwe li fikra milliyetê dipêçin, ‘eynen ji her alî ve xwe teqlîdî Awrûpa dikin, hetta bi fedekariya gelek muqeddesata di wê rê de hereket dikin (dimeşin). Hal û hal bejna qîmeta her milletekî cilekî cuda dixwaze. Qumaş texlîtekbe jî; fesala wê divê ne weke hev be. Cilê (kincê) cendirmekî (leşkerekî) li jinekî nayê kirin. Cilê jineke tangolî li seydakî îxtiyar nayê kirin… “Gelek cara teqlîda bi korayî mirov dike pêkenk.” Lewra:

**Ya Pêşî:** Awrûpa dikanek be, qişleyek (leşkerxaneyek) be; Asya di hukmê zevî û camiyekê de ye. Yekî dikancî kare here dansê, yekî cotarî nikare here. (Ev hukum li gorî ‘adetê millet e, ne li gorî şer’ê ye) wezyeta qişle û ya camiyê nabe yek.

Hem xuyakirina pirên pêxemberan ji Asya de, gelekên feylesofa hatina wanî ji Awrûpa, remzek e, îşaretek e qedera ezeliye ku; ya ku wê qewmên Asya bîne ser hiş, wê wan bi pêşde bibe, wê wan îdare bike; dîn û qelbê felsefe û hîkmet ku hene, di vê alîkariya dîn û qelbbikin, nekevine ciyên wan de.

**Ya Diduya:** Qiyaskirina dînê Îslamê li Fillehiyê, weke Awrûpa xwedûrgirtina ji dîn, şaşiyeke gelekî mezin e. Em pêşî bêjin Awrûpa li dînê xwe xwedî ye. Di serî de yên weke Wîlson, Luid Corc û Nizalos mezinên Awrûpa, ku weke keşa ji dînê xwe re mute’ssibin (hişkpêgirtî ne) şahide ku; Awrûpa xwediyê dînê xwe ye, belkî jî mute’essibe (hişkpêgirtiye) ji aliyekî ve.

**Ya Sisêya:** Qiyaskirina Îslamiyetê li Fillehiyê qiyasa me’elfariq e (qiyasa di tiştên ji hev cuda ne), ew qiyas jî ğelet e (şaş e). Lewra dema Awrûpa bi dînê xwe ve hişk girêdayîbû ne medenî bû; dev ji te’essubê berda, medenî bû. Hem dîn, di nav wan de sêsed salî muhareba (herba) daxilî peydakiriye. Ji ber ku di destê zordestên dîktator de, bûye wasîte (alet) ‘ewam, feqîr û xwedîfikra perçiqandiye; di gelekê wan de demekî di hendava dîn de ğeydek çêkiribû. Belê di Îslamê de dîrok şahide ku, ji carekê pê ve (dîn) ne bûye sebebê muhareba daxilî. Hem çi demî ehlê Îslamê li dînê xwe ji dil xweyîtî kirine, di wê demê de nîsbî bilind bûne û pêşdeçûne. Şahîdê vê yekê, dewleta Endulusê ya Îslamî ye, ku mezîntirînê Ûstadê Awrûpa ye. (Awrûpa ‘ilm û teknolojiya xwe gelekî wê jê ‘elimiye.)

Hem çi wextî, cema’eta Îslamî di hendava dîn de wezyeta laqeyd girtibe (ji dîn sar sekinîbe), ketiye wezyeteke perîşan û nizim bûye.

Hem Îslamiyet, bi wacibiya zekatê, heramiya rîbayê û weke wan bi hezara meselên şefqetperwer feqîr û ‘ewam hîmayekirin e (parastine); bi kelîmên xweyî weke (اَفَلاَ يَعْقِلُونْ* افلاَ يَتَفَكَّرُونْ* اَفَلاَ يَتَدَبَّرُونْ ) “Qey ‘eqil nakin, qey tefekkur nakin, qey baş nafikirin” ‘eqil û ‘ilim dike şahid û şiyar dike û ji aliyekîve jî ehlê ‘ilmê hîmaye dike. Îslamiyet her dem bûye keleha feqîra û ehlê ‘ilmê û bûye penagaha wan. Ji ber vê yekê sebebekî ğeyda ji Îslamê bi tu awayî tune ye.

Hîkmeta veşarî ji aliyê cudabûna Îslamiyetê ji Fillehiyê û dînên din ev e ku: Esasê Îslamiyetê tewhîda zelal e; tesîra heqîqî nade sebeba û wasita, ji cîhet îcadkirin û meqam ve qîmet nade wan. Lê belê fillehî ji ber ku fikra “welediyetê” (ku dibêjin Hezretî ‘Îsa- Selamê Xweda lê û li pêxemberê me be- kurê Xweda ye haşa) qebûlkiriye, qîmetekî dide

sebeb û wasîta, enaniyetê (nefsê) naşkîne. 'Adeta cîlweyeke ribûbiyeta îlahî dide 'ezîz û mezinên xwe. Ayeta:( اِتَّخَذُوا اَحْبَارَهُمْ وَرُهْبَانَهُمْ اَرْبَابًا مِنْ دُونِ اللّٰهِ "Ewan ji Xweda pê ve 'alimên xwe û rahîbên xwe jî ji xwe re kirine Reb… Tewbe-31" ) derheqê wan de raste û li wan tê. Ji ber vê yekê ye ku, di filleha de ji aliyê dinya yê ve yên ku di bilindtirînê merteba de ne, weke Wîlson serekê 'Emerîkayê derbasbûyî tevî ku ğirûr û nefsa xwe nedaniye (paraztiya) jî, (li ba wan) dikare bibe dîndarekî hişk. Di dînê tewhîda zelal Îslamiyetê de, yên ku ji aliyê dinyayê ve di meqamên bilind- dane, ya wê nefs û ğirûra xwe berdin ya jî wê derecekî dîndariyê berdin. (herdû tam bi hev re nameşin) ji ber vê yekê hinek ji dîn dûr disekinin (sar dimînin) belkî hinek bi temamî ji dîn dertên.

**Mesela Şeşa:** Di fikra milliyeta menfî de û rehperestiyê de yên ku zêde diçin emê ji wan re bêjin ku:

**Ya Pêşî:** Ruwê vê dinyayê, xisûsî jî ev memleketê me, ji dema kevin ve bûye me'rûzê gelek hîcret û guherandina bi vê re jî; piştî ku merkeza hikumeta Îslamî li vî welatî hatiye avakirin, qewmên din weke pirpiroka (perwane) xwe avêtine navê, ji xwe re kirine wetan.

Wezyet ev e "Lewh-ul Mehfûz" vebe bi zor wê demê wê bi rastî tevên qewma ji hev veqetin. Madem wilo ye nexwe avakirina hereket û ğîretkişandinê li ser esasê fikra rehperestiya heqîqî me'nek jê re nîne û gelekî bi zerar e. Ji ber vê yekê ye serekekî milliyethebîn û rehperestên menfî ku ji dîn re gelek têkiliyê, mecbûr maye gotiye: "Ziman, dîn yek be; millet yeke." Madem wilo ye. Nexwe wê ne li reha heqîqî belkî wê li munasebetê ziman, dîn û welat bê nihêrtin. Heger her sê yek bin, ji xwe milliyeteke zexm e; heger yek kêm be dîsa di daîra milliyetê de ye.

**Ya Diduya:** Milliyeta Îslamî ya muqeddes (pak û paqij) , ji sed feydên ku bi jiyana civakiya zaruwên vî welatî daye karkirin emê du feyda bi mîsalî beyankin:

Ya Yekî: Ev dewleta Îslamî dema ku hê bîst-sîh milyon bû, li hember temamên duwelên Awrûpayî yên mezin jiyana xwe û hebûna xwe bi wê fikra di ordiya wê de ku nûra Quranê tê "Ez bimrim şehîdim, bikujim ğazî me" muhafeze dikir. Bi vê fikrê bi kêf û 'eşq li ruwê mirinê dinêrin, bi ken diçûne pêşberê mirinê. Her dem Awrûpa re'ilandine (lerizandine). 'Eceba neferên fikrên wan basît (hesan) û dilê wan safî hun karin çi nîşanbidin ku bibe sebebê fedakariyeke weha bilind? Kîja hemiyet mumkune di ciyê wê de were avakirin? Heyata xwe û temamê dinya xwe bi kêfxweşî karibe fedayî wê (fikrê) bike?

**Ya Diduya:** Ziya (ejdeharên) Awrûpa (dewelên wanî mezin) her çi demî şeqamek li vê dewleta Îslamê xistine; sêsed û pêncî mîlyon musulman giriyandine û nalandine û xwediyê wan mustemleketa (Xwediyê memleketên Îslamê yê ku di bindestiyê de ne) ji bonî wan (musulmanê bin destê xwe) nenalînin û dilê wan neêşînin destê xwe kişandine, bi destrakirina xwe re danîne. Kîja hîz dibe ku bê avakirin di ciyê vê piştgirtina me'newî ya ku bi tu awayî û tucarî nayê piçûkdîtin? Nîşanî min bidin! Herê ew piştgirtina me'newî ya mezin, divê bi milliyeta menfî û hemiyeta çavtêr em neğeyîdînin!

**Mesela Hefta:** Emê ji yên ku di milliyeta menfî de zêde ğîretkêşiyê nîşandidin re bêjin ku: Heke hunê hez ji vî milletî bikin, hunê şefqetê lê bikin hemiyeteke wilo hilgirin ku, ji pirên wan re şefqet bê hesabê. Yana şefqetkirina li qismekî hindikên ku ne muhtacê şefqetê ne di demeke hindik de bi awakî ku wan di heyata wanî îctîma'î de bêxe ğefletê bi awakî ku ji pirên wan re bibe bêmerhemetî hemiyet nîne. Lewra hemiyetkariya ku bi fikra rehperestiya menfî were kirin, di demeke hindik de feyda wê dibe ku ji heşta bigêje diduya. (Ew herdû) wê bibin mezherê şefqeteke ku ne layîqin. Ji heşta şeşên din, ya îxtiyar in, ya nexweşin, ya xwey mûsîbet in, ya zarok in, ya zehf ze'îf in, ya teqwadar in zêde axîretê difikirin; evana ji heyata dunyewî zêdetir li pêşber heyata berzexê û axîretê nûrekî, teselliyekî şefqetekî dixwazin û muhtacê hinek destên mubarekên hemiyetkar in (ğîretkêşin). Kîja hemiyet musa'eda tefandina ronahî û şikandina teselliya vana dike? Heyhat! Şefqeta li millet li kû ye, fedakariya di riya millet de li kû ye?

Ji rehmeta Îlahî umîd nayê birîn. Lewra Cenabê Heq ordiya muhteşem û cema'eta mezin a van hemwelatiya ku ji hezar sal berê ve di xizmeta Quranê de daye xebitandin û jê re bayraqdar tayîn kiriye, bi hinek 'arizên muweqqet înşaAllah perîşan nake, wê careke din wê nûrê bide ronahî kirin û wê wezîfa wê bide domandin…

(Wergêr: Mela Muhammed Bêcirmanî)



# Exlaq Dînî Îslam

Mamedî Farûq

Exlaq; o çî înson yi ser virazyo, xelq bîyo.

Kelîmê xelq; qay bedên înson, xulq'izî qay zerê înson yanî m'enewîyat înson yena vatiş.

Nezer İSLAMîyetî di exlaq di tewir estî: Exlaqo hol, exlaqo xirab.

Allah u Te'ala Qur'on'î di wextê ki behs Peyxember ma keno, von: "Bê şek,şuphe ti wayêr exlaqê pîlî." **(Qelem: 4)**

Yew wext Hz. 'Eyşe'ra exlaqê Peyxember (as) ame perskerdiş, va: "qay ti Quro'n nê wonênî?" O mêrdim va: "Ez Quro'n wonena." ey (ra) va: "Exlaq Peyxembêr (as) Quro'n bi." **(Muslîm)**

Hedîson di Qasid Homay von:

"Ez qay temomkerdişê exlaq hewlî têna omîya şirawitiş." **(Ehmed bîn Henbel)**

"Ya Rebbî! Tu senê şekl û şemalê mi rind/hol viraşt, exlaq mizî o tewir rind biki."

"Ebu Hureyre ra, va: "Hêt İMAN kamil ra / temom mu'mînon yin ra o merdum exlaq yi hol. Hol şimazî o merdum cînyê xwir' hol. **(Tîrmîzî)**

Cabîr (ra) va: Peyxember (as) va: "Hêt mira en zaf heskerdê/hol şima wo rweja qiyametî di mi ra en nizm şima o merdum exlaq yi hol… **(Tîrmîzî)**

## 'Eleqê Exlaq O Îman

'Emr laj 'Enbese va: ez Peyxemberî ra (saw) persayo: "İslam çito?"

(Saw) va: " Sweza hol o non/wer dayiş însonon." Mi va: "İMAN çinayo?"

(Saw) va: "Sebr o zer herayî." Mi va:" İSLAMîyetî di çina fazîletên û xêr yey hina zafo?"

(Saw) va: "Mêrdîm bisilmone yo ki bisilmoney bînî zon yey û dêston yeyra zirar nê veynenî." Mi va: "İMANid çîyo fazîletên çito?"

(Saw) va: " Exlaq weş." Mi va: "Komcî nimaj xer yey zafo?"

(Saw) va: "O nîmaj qunutêyi/payvindertiş, wendiş, secdê.. yi zaf." Mi va: "Komcî hîcret xer yey zafo?"

(Saw) va: "O çîyo ki Rebbê tu hesnêkeno ti o çî terk bikêrî:" **(Ehmed bîn Henbel)**

# Dersa Quranê Kerîm

Îbrahîm Çebakçûrî

**Ma inay zonî:** Ina dunya cey îmtîxonya! În îmtîxonî di ay rarê ko Homay ma, qayîlo ma tira şîrî, ay mektêbê ko ma tedebî bellîyo: Mektebê Îslamî

**Îslam, yew mektebo ko:** În mekteb di wext ma rarê 'emir xo di şînî dustur o, heq û raştî ma museno. Kom Kelîme-î Şehadet bêyaro, Homay Rab, Hz. Muhammed zî Peyxember bizono; pey in zonayiş û qabulkerdiş beno talebey mektêbê îslamî.

**Byen!** Rab xorî hamd bikên, semedê nasîpkerdiş ma Muslumontî. Be'd uja ra ma Mektêbê Îslamî bidî şinasnayiş: Qursê mektêbê Îslamî, Wehîya,

Me'lumê inê mektebê, Peyxember ma Hz. Muhammed(s. a. v)'o. O seyyîdê ma, con û cîgerê mayo.

Mektebê Îslamî di ay ders seyê yena ma musnayiş dersê Quran'yo.

**Ey Talebey inê dersî!** Ay dersê ko şîyayîşê ma keno rind, rarêma sey nur keno raşn, tengasî ma bena, raştî mêjnena ma, ay alametê ko ma bena cennet êna mejnena ma… Ganî pey zêrweşî, pey aşq û şevqê ma inayra ders bîgêrî.

Wextê ma destpekên dersa Kur'an ma biewnî! Ma ina ders ra çi musyenî:

1- În mahluqat û kaînat, hayat û mêrg Allah viraşt. wayirê her çî Allah o. Her çî ser hukumdar Allah o.

2- Dunya cey îmtîxonya, alemo ebed axîreto. weşî û şayî Dunya û Axîret pey çita pêydakenî madersey, inay Qur'an ra gênî.

3- İbadet û 'abdey bitena Allah'îr bena. İbadet û abdey senê bêna, ma ina'y cara musyen; nimaj, roje, zika, hac. . . ma hêmi Quranî di veynenî.

Rarê Allahî di cîhat ma Quran ra musyenî.

4- Çîyo ko Allah ma rî e'mr û nehy kerd ma zerey Quranî di veynenî. Kom çî helal, kom çî xaramo ma sureyan Quranî di veynenî.

5- Hz. Muhammed(s. a. v), Cey Allahî di en 'abdo başo û peyxembero peyen o. İman û heskerdiş, îtaat û ca erdiş sunnetê Hz. Muhammed senê beno; ma inay zî Quran ra veynenî.

6- Şeytan, Nefs, Hewa û Hewes, xapeynayişê ina dunyayo. . . Înon ra dima rarê xaq û c'eddey Îslamî'di, ganî pey nimaj, zîkîr, roje, du'a û sadqa ma în dima ra xo bixelesnî. Ma inay zî Kîtab xo yo Azîz ra musenî.

7- Exlaq başey, hewley, desterdiş yewbînan, haqê dayê û bayî, beynatey ma û cîranon, heqê kom/mêrdiman, paştdayîşê kombîyayîş, adabêkerdiş… sey ina mesala dersê Quranî di yena vendiş. Quran sewt dono her wext, veyndono însano hemin, raştnayî don amir ma.

## Hârîs laj A'wer ra omya vatiş:

"Rojê ki Hz. 'Alî va: 'Biewnî mi Resullullah ra eşnawit ey va: "Nîzdira fîtne qerifyêno!" În vatiş ser mi yeyra pers kerd: "Ya Peyxemberê Allahî! Xêlasî û çarey inê fîtneyon çinayo?" ey (s. a. v) pey vatiş xo bimibarek va: "Kîtabê Allahî, Quran. " (B'edê ina ra Hz. Peyxember, bahsê vasfê Quran ser qale xwu ona kerd temom):

- Quranî di tarîx verênon, xaberê însanan b'ed peyxemberî, hukmê meslon sey beynatî şimad viraştey estî.

- Quran huqmê ko, heq û batil yewbînan ra cêra kêno. Her kam, bê Quran ra sewna ber bi geyro hîdayet, Allah yi şaşkeno.

- Quran lay Allahî yo, çew nê eşkono biqerefno, , fikir ser yo kîtabê ko zixmo û rarê xaq mejnon ra.

- Quran, niverdon aqil xo verabidî şaşbibî û zonayiş zî têmyanbo.

- Quran, ona yew kîtabê ko warê 'îlmî tera mird nêbenî, pey timatim vendiş nê beno kîyin, tedê ona başî û berz hayretdayî estî ko çiray nê qedyenî.

- Rayna yew eserê ko bê mîsalo, waxtê ko senê Cinan goşdarî yî kerd, yîn xo in vatişra nê eşge bigêrî: " Ma, goşdarî Quran kerd; rarê raştî û aqilmendî mejnon ra. "

Kom Quran'ra paşt bîgero qiseydayiş bikêro raşt von, kom (Quran) tetbiq bikêro sevap geno, Kom pey yê hukum bikêro adalet keno, kom însano daw'et bikêro (Quran), yin hewelnon rarê raşt sêr. "



# Pîr û Hem Hemoleko Boşqolek

Yinis Pîronî

Hemolek vejîyeno daray sayer ser

Pîr zî hemolek veynena yena bin dari

Pîr: Hem hemoleko boşqoleko ti dar serdi sekenî?

Hemolek: ez xorî sayo çîneno

Pîr: Hemolekê mi boşqolekê mi dapîray xorî yew say bi erzi

Hemolek: Ha torî, say erzeno

Pîr: Hem hemolekê mi boşqolekê mi ina kewti silu

Pir: Hemoleko boşqoleko dapîray xorî yewna say bi erzi

Hemolek: Ha torî yewna say, bi gêri

Pîr: Ehe ina zî kewti hîro miyon

Pîr: Hemolekê mi biyari bidi destê mi

Hemolek xo derg keno 'eyn say dono pîr dest

Pîr xo erzena dest ra tewşena û erzena tewre

Pîr rar kwena şona. Şona rar ra raştê şonî yena

Şone: Pîrey ti sekena bê ronşi ma mast biwurî. Şone mast donu pîr, pîr hewna keno û hemolekî tewre ra vejeno. Hemolek pirr vejêno û perreno şono.

Şone hemolekî vejeno û vewr dekeno tewrey pîri. Pîr xo aqilêna tewrey xo erzena xo qor rar kwena şona. Vewr rar ra helêna.

Pîr: Hemolekê mi boşqolekêmi mizay xo mirî meki mi guneyo. Pîr şona keye ki hemolek ha keyedo. Pîr cadi dewq adir ser nona nonê xo pewjena.

Pîr: Hem hemolekê mi boşqolekê mi bê torî non, hemolek vono pirr fireno şono mağora diseno. Pîr vona wîî hemolekê mi boşqolekêmi ti senê hawa şîyî bin mağo. Hemolek: Vono dapîr dewq sur ki xo bin lingon ra ki ti zî yena mi het. Pîr şona dewq ser kijjik bena, hemolk zî xorî xelesên o.

Yaqup Me'denij

Çînîjî yew dar miqat kenî. Daray bambuy, toxim erzenî,aw doni slond (gubre)kenî.sera verên nê asena ferq nê bena;rayna aw danî slond kenî. daray bambuy Seray diyindi serdê e'rdî ew vil nê erzena heta Seray hîrin çerin aw danî, slond kenî daray bambuy hewna nê vejêna.sek e'nad kerdo nê vejêna e'rd ser û vil nê dana. Çînîj panc ser pawenî be'd hewna awk danî slond kenî.seray pancindizî aw danî slond kenî; dar hama Seray pancinra pey newe vil dana.ineyra pey daray bambuy vistohewt metrey bena derg.No deresyayişîdi tay persî yenî kê aqil, na dara vistuhewt metra panc şeş heftedi bîya pil? neki panc serdi? Cewab na dar panc serêdi bîya pîl. Peybi sebrê awdayîş û slond kerdiş panc seran bîya pîl.

Sey wextî kar biki
Sey wextî sebir biki
Tim bawer biki
Û qe rameceyre





# قَلْبِی مَه شُبْهِ زِیرِ

قَلْبِ مَه شُبْهِ زِیرِ ژِ فَیْضَا تَه جَلاَ کِرْتْ
مَارُ و سِیَهُ و صِفْرِ صِفَتْ رَنْگِ صَفَا کِرْتْ
تَشْبِیهِ بِه جَدْوَلْ مَه دِ نِیڤْ آتَشِی عِشْقِی
دِلْ قَلْبِ حَقِیقَتْ بِتُ و اِکْسِیرِ هَمَا کِرْتْ
سَالِكْ کِیَه هَاتِی ژِ مَجَازِی بِه حَقِیقَتْ
صُورَتْ نَه شُنَاسِیُّ و بِمَعْنَی نَه فَنَا کِرْتْ
تَنْهَا نَه لِمِنْ لاَمِعِ حُسْنَا تَه شَفَقْ دَا
عَالَمْ بِه خوَه وِی حُسْنُ و جَمَالِی دِخوَه دَا کِرْتْ
تَیْغُونِ دِ دَسْتِی تَه زَهِی دَوْلَةُ و اِقْبَالْ
هَرْ چِی تَه بِرِی دَامِ دِ تُورَا خوَه هُمَا کِرْتْ
جَانِی خوَه مَه کِرْ دَانَهءِ دَاڤَا کُو ڤَدَایِی
آهُو صِفَتْ اَوْ پِی حِسِیَا رَاهِی خَطَا کِرْتْ
عَنْقَا نَه شِگَارَا کَسَه دَاڤَانْ تُو بِه چِینْ ڤَرْ
دَاڤَا کُو لِه عَنْقَا تُو ڤَدِی بَادِ هَوَا کِرْتْ
هَرْ کَسْ سَحَرِی طَالِبِ تِشْتَكْ بِه چَمَنْ هَاتْ
هِنْ سُوسُنُ و هِنْ سُنْبُلُ و هِنْ زُلْفِی دُو تَا کِرْتْ
دَسْتِی مَه سَحَرْ کِرْتُ و بِرِینْ سَیْرِ حَبِیبِی
فِی الْحَالِ رَقِیبِی ژِ حَسَدْ لَرْزَهءُ و تَا کِرْتْ
اَوْ کَبْكِ خَرَامَانْ کُو دِ کُوزِی لِقَبُو هَاتْ
شَاهِینْ قَضَایِی بِه تَغَافُلْ ژِ خوَه رَا کِرْتْ
زِنْهَارْ کَسِی دَسْتْ بِه بِتْ اَرْقَمِ سَرْوِی
بِی عِشْوَهءِ لَعْلاَنْ تَه بِتَسْلِیمِ ژِهَا کِرْتْ
صَبْرِی بَرِی شِیرِینَه وَه اُسْتَادِ خَبَرْ دَا
لَوْ دِلْ مَه بِه تَحْلِیُ و غَمَانْ خُرَّمُ شَا کِرْتْ
هَرْ نَشْتَرُ و شَوْکِینْ کُو حَبِیبِی مَه لِه دِلْ دَا
مِنْ یَكْ بِه یَكُ و تِیكِ لِه دَرْدِی خوَه شِفَا کِرْتْ
عَاشِقْ ژِ غَمِی سَایَهءِ وِی جَامِ طَلَبْ کِرْ
پُرْ عَقْلِ دِ دِیرِتْ مَه ژِ قِسْمِ حُکَمَا کِرْتْ
صَفْ صَفْ نَه تِنِی گَزْمَه دِبَارِنْ ژِ کَڤَانَانْ
دِلْ کَاکُلُ و زُلْفَانْ دَا کَمَنْدِی بِه تَبَا کِرْتْ
دِیوَانَهءِ هَرْ تِیتَه دِڤِی سِلْسِلُ و بَنْدِی
کُو مُسْتَحَقِه خُسْرَوِی خُوبَانْ بِه جَزَا کِرْتْ
پَیْوَسْتَه دُو فِیرِسْ ژِ مَرَا دَا بَرِزِینْ دِلْ
زُلْفَانْ بِه چَبُ و رَاسْتِی لأُو غِلْمَه جَمَا کِرْتْ
قَوْسِ دُو هِلاَلاَنْ کُو لِسَرْ بُرْجِ اَسَدْ بِتْ
بُو شُهْرَه دِ عَامِی عَمَلْ اَنْگُشْتِ نُمَا کِرْتْ
شِعَرَا تَه {مَلاَ} سِحْرِ شَکَرْ رِیزَه بِه مُعْجِزْ
زَانِمْ ژِ لَبِ لَعْلِ تَه اَڤْ لَفْظُ و اَدَا کِرْتْ

Evan çêlikên heywanan, bighînin diya wan

# BEXÇE ZAROKA



# Van navan li cîhê wan deynin

**Newal, Guher, Çiya, Beroj, Nezar, Deşt, Best, Çem, Zinar, Serê Çiya,**



## Mamulên ji şîr çêdibin çine?

1-Mast

2-penêr

3-toraq

5-dew

6-rûnê nivîşk

7-çortan

8-firo

**Gava pez dizê, şîrê wanî**

**'ewil yê qusyayî çiye?**

Firo

**Bi rêz navên mekteba bêjin**

1-Mekteba pêşîn

2-mekteba navîn

3-lîse

5-zanîngeh (Dubustan)

**Hinek navên Pêxemberê me bêjin**

1-Muhammed

2-Ahmed

3-Mahmûd

3-Mustefa Mustefa (Selat û Silavên Xweda Lê Be)

## Pirs

**Ji vana kîjan pir ji pêxemberê me hezdike?**

a) Kesê pir selewatan li ser pêxember dide

b) Kesê heyata pêxember dixwîne

c) Kesê li gor şîretên pêxember 'emel dike

d) Hemû

(Cewab: Hemû ye)

# Di Kurdî De Dem (Zeman)

1- Dema Niha (Şimdiki Zaman)

2- Dema Borî (Geçmiş Zaman)

3- Dema Bê (Gelecek Zaman)

## Dema Niha

**1- Awayê erênî(musbet)**

Ez **dikim** / Tu **dikî** / Ew **dike** / Em **dikin** / Hun **dikin** / Ew **dikin** /

**2- Awayên neyînî**(menfî)

Ez **nakim** / Tu **nakî**/ Ew **nake** / Em **nakin** / Hun **nakin** / Ew **nakin**

3-Ez **çêdikim** / Ez **çênakim**

**4-Raweya fermanî(erênî) - Raweya fermanî(neyînî)**

Çêke/Çêbike! Çêmeke/Çêneke! - Çêkin/Çêbikin! Çêmekin/Çênekin!

## Dema Borî

1- **Dema Boriya Têdeyî**

2- Awayê erênî

**Ez çûm / Tu çûyî / Ew çû / Em çûn / Hun çûn / Ew çûn**

3- Awayê neyînî

**Ez neçûm / Tu neçûyî / Ew neçû / Em neçûn / Hun neçûn / Ew neçûn**

**2- Dema Boriya Dûdar**

1- Awayê erênî

**Ez meşîme / Tu meşiyî / Ew meşiye / Em meşîne / Hun meşîne / Ew meşîne**

2- Awayê neyînî

**Ez nemeşîme / Tu nemeşiyî / Ew nemeşiye / Em nemeşîne / Hun nemeşîne / Ew nemeşîne**

3- **Dema Boriya Berdest**

1- Awayê Erênî

**Ez diketim / Tu diketî / Ew diket / Em diketin / Hun diketin / Ew diketin**

2- Awayê Neyînî

**Ez nediketim / Tu nediketî / Ew nediket / Em nediketin / Hun nediketin / Ew nediketin**

4- **Dema Boriya Çîrokî**

1- Awayê Erênî

**Ez çûbûm / Tu çûbûyî / Ew çûbû / Em çûbûn / Hun çûbûn / Ew çûbûn**

2- Awayê Neyînî

**Ez neçûbûm / Tu neçûbûyî / Ew neçûbû / Em neçûbûn / Hun neçûbûn / Ew neçûbûn**

## Dema Bê

1- Awayê erênî

**Ez ê bibezim Ez dê bibezim / Tu yê bibezî Tu dê bibezî / Ew ê bibeze Ew dê bibeze / Em ê bibezin Em dê bibezin / Hun ê bibezin Hun dê bibezin / Ew ê bibezin Ew dê bibezin**

2- Awayê neyînî

**Ez ê nebezim Ez dê nebezim / Em ê nebezin Em dê nebezin**

**Dema Bê Ya Hevedudanî**

1- Awayê erênî

**Ez ê çûbim/Tu yê çûbî/Ew ê çûbe / Em ê çûbin / Hun ê çûbin / Ew ê çûbin**

2- Awayê neyînî

**Ez ê neçûbim/Tu yê neçûbî / Ew ê neçûbe / Em ê neçûbin / Hun ê neçûbin / Ew ê neçûbin**

Amadekar: Zînnûr Zivingî

# Esmerê Min Dîlberê Min



*Şêx Ahmedê Xanî*

---

*Min dî şeva cum'eyê esmerek, ez bûm ğulam*
*Çûm tewafa rê û laman, dîlbera şîrînhudam*
*Şewq û nûra xet û xalan, dil muferreẖ bû temam*
*Esmerê min, dîlberê min li te bin yuz bîn selam*

*Sed selam û selewatê Padîşahê Qudretê*
*Ew bibarin her mudamet bejn û bala qametê*
*Bê ẖebîba xwe me nevê qet dixûla cennetê*
*Esmerê min, dîlberê min li te bin yuz bîn selam*

*Ez feqîrek bê nesîb im, nûrê Zatê Zulcelal*
*Her dû ebrûyê hîlal in li cebînê bûne xal*
*Ez merîzek bê dewa me, hatime nîk erzêẖal*
*Esmerê min, dîlberê min li te bin yuz bîn selam*

*Leb 'eqîq û durr û mercan, ew ji 'eslê madenê*
*Qemer û şemsed di burcan, rohniya wan da tenê*
*Sen'et û karê Xweda ne, xal û nîşan ketinê*
*Esmerê min, dîlberê min li te bin yuz bîn selam*

*Ey dilo rabe xwe pêk bîne, mecala bêt buhar*
*Bağ û bostanê me xweş bû nergîza mestî xumar*
*Gulgul û çîçek û alal bi xwe bûne çar bi çar*
*Esmerê min, dîlberê min li te bin yuz bîn selam*

*Gulgul û çîçek û alal, ew jî rengê te geş in*
*Sinbil û riẖan û sorgul, ew ji bêhna te xweş in*
*Misk û 'enber û bixûr e, em ji bêhnan serxweş in*
*Esmerê min, dîlberê min li te bin yuz bîn selam*

*Sed selam û selewatê Padîşahê 'abidan*
*Ew bibarin her mudamet li Medîna Aẖmedan*
*Rewzaya sîma mubarek hem li ser wan meqedan*
*Esmerê min, dîlberê min li te bin yuz bîn selam*

# Muhammed Seyyîdê 'Alem

Melayê Bateyî

*Muhammed seyyîdê 'alem*
*Şefî'ê roja mîzanê*
*Çirağê dîdeyê Adem*
*Xwedanê wehy û Furqanê*

*Xudanê wehy û tenzîlê*
*Bi eqlam û bi tebcîlê*
*Qelem da nexşê Încîlê*
*Nema Tewrat di xeclanê*

*Çi Încîl û çi Tewrat in*
*Di mensûx û di mubat in*
*Bi wî navî musemmat in*
*Hukum çû kenzê Rehmanê*

*Bi Hukmê seyyîdê mursel*
*Nebiyyê axir û ewwel*
*Betal kir dîneha mucmel*
*Bi ayat û bi Quranê*

*Bi ayat û bi tewhîdê*
*Ji teşrîfê û temcîdê*
*Şeva surrem di tewlîdê*
*Senem hûr bûn di pûtxanê*

*Nigûnser bûn senem 'aciz*
*Ji tewlîda gula Qurmiz*
*Bi Kesrayî geha mu'ciz*
*Tezelzul kefte eywanê*

*Bûye mizgîn di dinyayê*
*Şikufte werd û re'nayê*
*Ji bağê isteteyna yê*
*Qureyşî eslî însanê*

*Qureyşî bû penahê dîn*
*Xudanê Sûretê Yasîn*
*Şivanê ludekê mîrîn*
*Melek hatin di fermanê*

*Melek hatin bi te'cîlî*
*Du şeq kir sîne Cibrîlî*
*Elem neşreh tê tenzîlî*
*Dikit tewzîh û tibyanê*

*Xudanê textê lewlake*
*Suwarê heft-i eflak e*
*Li 'erşî merkeza xak e*
*Ji bo wî hate kêşanê*

*Ji bo wî çêbû ev 'alem*
*Nebî bû hêj herî Adem*
*Di exbara wekû Xatem*
*Çirağê ehlê îmanê*

*Çirağê ruhniya ummet*
*Ji bo wî çêbû ev xelqet*
*Fetahê dergehê cennet*
*Emîrê sedrê dîwanê*

*Emîrê textê 'uqbayê*
*Siha wî Dara Tûbayê*
*Xwezî carek di dinyayê*
*Bidîta min tu wî anê*

*Di wê anê û hînê bû*
*Dilim muştaqî dînê bû*
*Li dergahê Medînê bû*
*Resûlê Haşimî kanê*

*Resûlê Haşimî sabir*
*Ew e Taha ew e Haşir*
*Dil û canê me bû agir*
*Ji nar û pêt û hîcranê?*

*Ji nar û pêtê da ser me*
*Evîna te qewî germ e*
*Du çavan pê bikim surme*
*Ji toza rewza astanê*

*Ji toza wê derazînê*
*Dikim feryad û nalînê*
*Xudê çêkit di wê hînê*
*Wisala lutf û ihsanê*

*Wisala seyyîdê ehbab*
*Xudanê minber û mihrab*
*Muyesser bin li min esbab*
*Mi can avête meydanê*

*Me can bada fidayê te*
*Tenem xaka serayê te*
*Zeban weqfa senayê te*
*Dilê min 'ebdî fermanê*

*Dilim qendîka rewzê bit*
*Lebim nêzîkî hewzê bit*
*Ji ehlê sidq û feyzê bit*
*Ez im muhtacê ğufranê*

*Du 'alem pêkve muhtacê*
*Ji bo wan hatî îxracê*
*Şeva ew çûye Mi'racê*
*Çi xubarî kete eywanê*

*Çi xubarî hate ez xebra*
*Sedayê Gunbeda Xedra*
*Ke subhanellezî esra*
*Ji Qudsê çûye dîwanê*

*Ela ey seyyîdê sefwet*
*Tu roja heşr û pir fitnet*
*Bibêjit ummetî ummet*
*Fekende ser çûganê*

*Fekende ser biya derbey*
*Dikim hîvî ji mîrê Heyy*
*Şefa'et kî ji bo Batey*
*Bide ber zillê seywanê*

